Seyda nasih Heyderî, Pîremêrek birtîj û şareza bû, çend car bo min digot: Mela Efendî, ji zanatîrîn melayên Kurdistanê bû." Nesax bû ez çûm sera, lê ji ber ku berê xwe dane nexş û nîgaran, min ageh ji Mela Efendî nema, paşê got: "Ez carek di ji çûme cem, dinya payîz bû, ewir bû, hûrik hûrik baran dibarî, dîmenê baranê û dîmenê qesrê hevokek entîke jê peyda bû, Mela Efendî ev hozane bo min xwend:

*Nim nimî baran bimîxwuran xwoş est*

*Rehmetî heq bi gunehkaran xwoş est*

Her çende xelkî bi egera nezanîne ziyaneke mezin bi keleporê nexşdarê me da ye, lê di ser hindê re hinekê baş bi saxlemî maye, bi taybetî xaniyên nexşdar tu bihayê wan hew nabit. Wek xaniyê Hacî Se'dî yê tutincî û xaniyên Hacî Ferecê Qasim û Muhemmed Seîd Axayî û Hacî Hesen û Hacî Fettahê Guştnexwar li Suleymaniyê, xaniyê Kake Caf, Resul Axa û xaniyê Hacî Taha û xaniyê Ebdullah begê li Koysinceq, xaniyê Şêx Eliyê Telebanî, Elî Etreçqî ku herdu di sedê nozdê de avakirine. Herwesa xaniyê Mela Qadirê Îmam, Mela Ebdî, Hacî Werdan û hinek xaniyên di; li Kerkûkê Xaniyê Elaulлах Axa, Ridên Sorê Cihû, Hosta Hesenê Sorekî

li Hewlêrê, li rex rûyên kelayê xaniyê Hacı Mustefayê Kitanî ku ji mêrên Behdînan bû li Amêdiyê û dergehêk bi berên neqarê nexşkiriyê gelek girîng heye. Ji yê wî 300-400 salan kevintir nîn e. Di sala 1983 de min ev xanî dît û istimarek pê çekir û di *el-Muessese el-amme li'l-Asar* çinkî xaniyek eserîn e.

Min zanyarî der û bara van tev xaniyan û digel xaniyên dî jî û hinek xan û germav û qeyseriyan dan "M.A.A." bo hindê da bi kirit û ji dest xelkê rizgar bikit. Da ew renga mîmarene û hûnerê wî nexşî bimînit ku zamanek mezin e. Di paşerojê de wê mijarê bas û pirtûkan derbara wan binivîsin û hûnermend jî gelek mifayî jê wergerin.

Bo vê niyazê di zivistana 1980ê min li nek ji hîmdara şunwaran îna Suleymaniyê û Helebçe û Koysinceq û Hewlêrê bo dîtin û wênekirina wan avahiyan nexş li ser. Li du vê pêkola me hîmdara şunawaran biryara kirina du qeyserî û sê germav û xana Mehmûd Axa û çar xanên nexşdar li Koysinceq û Îhsara kevin kirîn herwesa xaniyê Osman Çawîş li Suleymaniyê kirî. Me hêviya heyî van xanên ha bikirin û ger kawdan başbûn her wekî çewa xanên nexşadar ên Kela Hewlêrê û Kerkûkê kirîn ji tevçûnê rizgar kirin, eve jî cihê rêzgirtinê ye bo vê hîmdar, zanistî -ilmî- her wesa Hîmdara Giştî ya Şûnwar û Keleporî Xanên Mehmûd Paşayê Caf li Qiz Er-Rabat (es-S'ediye)

kirîn li ser pêşniyaza min di van çend salan de pitir ji deh gotaran derbara van xaniyên kelaporî digel nexşên wan, di rojnama *el-Îraq* de belav kirin.

#### PARASTINA TIŞTÊN ENTÎKE

Tiştên entîke wek tiştên nêvmalî wek Tasî şekaze, binbirok, sênî, mencelok, teşt, mesîn, gumgum, destşo, semawer, mencelên mezin ên kelandin a savarê yan çekirina sabûnê û hinek tiştên kanzayî jî mîna kêrik û xenceran taybetî yê nexş li ser heyîn, yan nivisandin çî li bajarên Kurdistanê hatin çekirin mîna bajarê Diyarbekir, Sêrtê, Suleymaniyê, Kerkûkê, Koysinceq û Sine taybetî jî li bajarê Diyarbekirê meşhûr bûye bi sine'etên xwe yê kanzayî, her weza çekirina şûran jî.

Herwesa ew tiştên ji darî hatine çekirin mîna sindoqan, kursiyan, kevçan, kodik, qap û qaçên dî jî yan her yê hatin çekirin bo av vexwarinê, bo lênan û nanopatinê yan şerbik û denkên heziyên ku caran duşav têxistine navê. Herwesa xişlê jinan wek heyase, serpuş, guhar, toqîk (gerden) xirxal bazin û ristik dîsan berik û mehîr û cacim û hwd.

Ev tiştên ha ji kelepor û samanê milletê Kurd in, çî li Kurdistanê hatibin çekirin yan bi rêka bazirganî ve hatibin welatê me. Pêdiviyê ev tiştên entîke biparêzin û nefiroşin, nehêlin ji nav welatê me derkevin, lê mixabin ji ber nezanîn û nebûna bîrokên nû di bara kelepora bajarvaniya kurdî de, xelkê dest avêtin firotina tiştên entîke. Ticarên entîkan ji xelkê musilê, Bexdayê, Besrayê dihatin û lê digeriyan, xelkê sade jî digot: "Ev tiştine wê di kevin bûyin, her şerm e di nev malên me

de bin” da bi bihayek erzan firoşinê û xasime delalên wan bazirganan hebûn û niha jî hene her bo dikirin. Lê eger ev wez’e berdewam bibit, ev samanê mezin di nêv welatê me da namînit.

Di rojavayê de vekolana “dirûse” nexş û rengê çêkirina wan dikin û dibite zanist, ew jî bi navê welatê me li qelem naden. Çinkî be pênas digehit destê Ewrûpiyan bi rêka bazirgan û bazirganiyê.

Ev kurdên tiştên kevin difiroşin, dewrekê xirab dikin berawberî vî samanê me. Ji ber tax bo taxî di bajaran de digerin. Jinkan dixilxilnîn û dibêjinê ev tiştine wê dikevin bûyin û dibê wec in, parek kê m jê werdigirin û ji nêv welatê me derdixin. Lê dewrê me dîroknivîs, nivîser û rewşenbîrên dî çi bûye? Erê me pêkolek kiriye, hişyarekî di nav xelkê peyda bikin..? Heta bihayê tiştên entîke bizanîn û nefiroşin. Erê bi dehan kurên şîr û çîrokê di van bajaran de digêrin bo çi carekê di karêkî de behsê vê meselê û meselên dî ên keleporî nekiriye. Bo çi kurekî derbara vê meselê de nakin. Kombûna bêhtir ji rewşenbîrên kurd bi taybetî ên nû pê digihin li hawîr şîr û çîrok û nivîsarên xelkê biyanî, ku dibite egera ji nêvçûna keleporê bajarvaniya me. Me bivê û nevê berpirsiyariya dîrokê di beramber ji navçûna keleporî dikevit ser milên me. Eger me pêkolek kirbave weşkek di nêv xelkê de belav kirbave derbara keleporê bi seng û bajarvaniya me, xwoşeviya keleporê bav û bapîrên me di dilê xelkê de çandî baye.

Şagirtên navincî û amadeyî kêlên nexişkiriyan goristana Gorê Seywan di çaxê seikirnê de dane berberan şikandin. Her wesa nanpêjan ferî hindê nedibûn van kêlan li goran derêxin û bikin di nêv firnan de. Xasime ruyê nexş û nivîsan li ser bêxine rexê erdê nanî li ser piştê wan biqelînin. Çinkî dizanin ev kêlên kevin ji berê wajeye, li pişt çiyayê Gûje ku bergiriya germê diket û napeqit. Roja 1.6.1983ê ez û Kak Mihemed Şêx Taha Kerkûkî çûyin bo wênegirtina wan kêlan lê ji kêlî û nivêk bêhtir me nedîtîn. Ji wan hind kêlên bêhtir bi destên hostayên Kurd li Suleymaniyê hatin çêkirin. Wek: Hosta Hesênî, Hosta Reşîdî, Hosta Hesênê Fatîma Xezalî, Hosta Hebîb û Hosta Merdaw û bi taybetî di zivistanê de ku karê hostayî kê m dibe.

Eger seydayan dewrekê rewşenbîrane dabaye şagirdan ev karê narewa belkî yê dirindanê bêtore nekiribane di beramber gorên bav û bapîrên xwe, beramber Gorê Seywan ku bûye dîrokek mezin bo bajarê Suleymaniyê, bo milletê me. Ewê gorê dilsozên mîna dîroknivîs Emîn Zekî di nêv de ew goristana navên wê di hozanên çend şairên kurd de hatiye mîna Şêx Nûriyê Şêx Salih Hozan pê heldayîne.

Hosa.. Mixabin kêlên nexişkiriyan goristana minasibê Koysinceq jî bi derdê nezanîn û paşkevîniyê de çû û niha jî dibêjin goristanek gelek rind me hebû piçe wêne di nêv de bûn wênên suwar û xencerî û tiştên dî, xasime nexş û nivîsan li ser kola bûn.

Di sala 1958ê yan ew du salên pey hingê de, hinek kes ketine şikandina wan

kêlên nexîşkîrî. Seyda hebûn şagirdên xwe fêrî şikandina kêlyaya kirin. Go waye gorên burcuwazan, heta gorê Ehmed Axayê Zulal jî di nêv van goristanan de bû. Lê nêzîk gorê Dildar ê Şairê ku tev kes dinasîn wek; Seyda Tahir Ehmed Hozi xwidanê dîroka koye, Seyda Ewnî Kerîm Şareza û Seyda Tahîrê nivîsana kêlê şikandî, gor berze bû û niha jî kes nanasit, eve jî şûna kombetê li ser gorê wî ava bikin. Çînkî di nêv Koysinceq de bi taybetî li cem pîremêran wesa meşhûr bû ku Ehmed Axa ji duwazde suwarên Merwan û ji binemala Zulal Axa ye.

Dibêjin Babaniyan suwarên wî xelat kirin û heryek kire mezinê deverekê û ew jî kire hakimê Koysinceq. (Herwesa muelimekî kelyeka xeznedarekî Babanî ji goristanê îna û êxiste ser devê desxana malê.) Seyda Mesûd Mihemed jî behsê vê kiriyê di nameya xwe de bo min hinartî.

Ev dewletên cihanî çî sermayedar û çî hevpişkî bit, rêzê şûnwar keleporê xwedigirin bihayê wê dizanin. Bo nimûne Sovyêti gorê Teymûr Lengî li bajarê Semerqendê kiriyê cihek siyahî (gerîdeyî. x. y.) Salê bi dehan wêneyên kumbetê wî belav dikin di kovarên xwe de. Erê bo çî gorê vî direndeyê gunehbar ku bi milyonan mirov kuştîye... Bo çî gorê wî têk nedaye û berze nekiriyê? Bo çî hikûmeta Çînî, Sûrha Çînê ewa bi milên hejaran hatî avakirin naherifit, niha şanaziyê pê dibê? Çewan kêlên nivîsaya ku bi serkanên dîrokê dihên hejmartin, herwesa kêlên nexîşkîrî û wênedar ku serkaniyek girîng a hûnerê têkolanê ye. (Fen en-Neht)

Di Kurdistanê de kêlên gelek bi biha hene resmê mirov, teyr, hesp û çekê şerî wek şûr û xenceran û rîman, debance û tivingan yan resmê giyaî û gulên genimî her wekî li bitûn kêlî û hakun heyin. Çînkî deverekî şîst û kalê girîng bû. Mîna çewa di nêv goristana Cezîra Botan de birek kêlên gelek girîng hene, li ser kêlekê çend resmên helkoloî û resmên lendik û zelamek û herwesa sê zelamên di ku destên hevûdu girtine wê dawetê (çakîyê) dikin, xasime bi cilên kurdî ku şal û şapik li ber in. Di jêr wan de resmê marekî û du tawusan e. Di jêr wan de nexşên di hene. Her wesa di ser serê kêliyê resmê tawusekî yan teyreki di heye, lê li ser kêliya di beramber de çend rengên xişlên jinên kurdan e, ku distûrê wî çaxî ê jina kurd diyar dikin.

Kêliyêk di heye layê jêrî resmê sûwarekî rim girîyê bi destekî tiving, di ser wan de resmê tivingekê digel kulindekê barûtê û şûşka tivingê xirçê bijûnkirina tivingê û yan mehsa hespî. Herwesa resmê şaxê heywanek kovî digel tiştên ku nizanîn çî ne. Di hêlek di de resmê du teyrên "saqar" in, ku teyrê revê ye. Di hêlek di de hinek nexş digel du teyrên di, li ser serê kêlyê wêneyê dupîşkî ye. Hosa resmên kêliyê pêk hatine ji jîna miriyan yanî guherîna jiyana wan bikurtî li ser kêlyan diyar kiriyê bi wêne. Tê zanîn ku ev mirove zilamek bi desalet bûye yan bêjin di nêv xelkê de diyar bûye. Suwar çak û zîrek û şoreşker bûye, herdu rengên çekî -kevn û nû- dihilgirit, mîna rim û tivingan. Bi vî belgeyî dê şeyîn bêjin ev mirov di sedê hejdê de jiyaye. Her wesa jî resmên edewatên rava û ji resmên tayrên revê tê za-

nîn, ku wî zilamî gel hez ji ravê (nêçîrê) kiriye û çî heywanê kovî ê çîyan ku bi ti-vingê nêçîrvan diçûyê, resmê çîyan jî kêşaye heryekê ji van kêlyan kevalekê girîngê hûnerê nehtê kurdî li ser e, bi kêmî berî dused salan berî niha hatine çekirin, bi destê hûnermend Feqî Mihemedê Çave Sipliyê Botanî. Her wesa ev kêlye ne cil û berg û rewşê hinek ji jiyana wî çaxî nîşa me dide.

Van kêlyan bi keleporê pir biha dizanîn û pêdivî ye biparêzin û resmên van bigirîn û vekolana li ser bikî da bibit binaxê hûnerê wêneyî û nehtê kurdî.

Digel vekolana her wênêkî ku kiriye di pirtûka destnivîsan de wek wêne Mih-ran kurê Mensûr kurê Mihranî û an Îbnî Errizaz Cezîrî ku du hûnermendên xelkê Kurdistanê ne. Di sedê diwazdê zayînê de yanî berî heşt sed slan berî niha. Xasim Îbnî Errizaz bi mezintirîn endazê mîkanîkî bû di cîhana îslamê de. Di bajarê Suleymaniyê li nêzik serkarêzê muzexanek Etnografya folklorî heye, çaxê xwe Zankoya Suleymaniyê çekiribû.

Hinek biraderên rewşenbîr du kêlên nexşkirî Ranya înane (anîne) wê muzexanê. Her wesa Kak Farûk Hefîd ku mezintirîn dewr hebû di çekirina wê muzexanê de. kêlyek gelek girîng ji Amêdiyê inabû û kêllyek gelek girîng li Amêdiyê heye, nexşên spehî li ser wan hatine kolan digel nivîsan, lê mixabin xelk bihayê wan nizanin û gelek ji wan hatin şikandin û havêtin. Pêdivî ye xirvekeyn di cihek baş de biparêzînin wek Camiya Mezin belkî pêdivî ye muzexanek folklorî li Amêdiyê û Dihok bête çekirin. Min hinek ji wan kêlyan dîtin li îlonê li Camiya Mezin, a Medresa Zubeyr Paşayî bû. Lê mixabin ev xwendegeha girîng ku bi navê Emîrê Behdînî bû, di salên heftîyan de herifand. Bi rastî ziyaneke mezin bû, tim mîna seraya mîrên Behdînan ew jî herifand, dê ew pêdivî wê rova erdî bibin. Bi tenê dergeh maye resmê du ejderha û teyrê Nisir li ser e. Ev dergehe pêk hatiye ji du berên mezin. Bi rastî tiştek entîke ye qumbeta sultan Husênî ku di sedê şazdê de avakiriye. Herwesa qumbetên Rewşena kiça Simayil Paşayî gelek di girîng in. Herdu di heşt kujîne, hinek qumbetên girîngên di hene, belê mixabin mirovên nezan herifandin. (Heta ez karime bê arîkariya kesekê 7500-8000 parçên wênan ji vî keleporî bigrim. Bigire ji bajarê Mendelî heta Ewîle heta bajarê Zaxo.)

### BÎREWERÊN PÎRAN

Ji ber hinê ji dîroka me ya nenivîsaye, ewa bi cih maye. Pêdivî ye pûte bi birewerên pîran bidin, ji ber heta niha zanyariyek êkcar gelek li ser singê wan sax maye. Bûyerên salên pêş bîstan de wek salên şerê yekemîn ê cîhanê û salên bîstan û piştî hingê jî baş li bîra me maye. Mişe ji wan pîran pişkdarî di van bûyeran de kiriye. Wek Mela Tahayê Nanevan li Koysinceq ku du salan dilê Urisî bû di şerê yekî cîhanê de. Her wesa Ezîz Axayê Koyî, Namiq Husên Axayê Hemewendî ku çekhilgirê Kerîm Begê Hunermendî bû. Kerîm Fetah Beg, Hacî Elî Rebatî ku jiyê wî hawîr sed û deh (110) salan bû, di bihara 1920ê pişkdarî kiriye di komîna "Jale"

da li senga ku serokên Hemewend û ceparê Zengene û Rebatî û Mîkayilî û Ruxrayî û Şêxên Qeredax tê da pişkdar bûbûn û şerkirina wan digel Îngîlîzî her bo vê armancê bû, ne bo armancek di. Her wekî hinek dîroknivîsan mîna Dr. Kemal Mezher. Terîfa armancê vê şoreşê û tev şoreşên di kiriye. Wek şoreşa Îbrahîm Can Deloyî li Kufri ku her bo vê armancê bû. Herçend di çaxê şoreşa bîstê de bû, armancên van şoreşan kurdîni bûn û cudane ji armanca şoreşa bîstê û pertûka “*Dewr eş-Şe’b el-Kurdîyye fi Sewvetîl Esîrîn*” ya Dr. Kemal Mazhar pertûkek tehrîfî ye. Çi kesan behsê komîna “Jale” nekiriye ku tiştê giring lê mixabin kurd bihayê bîrewerên pîremêran nezaniye, wek rewşenbîrên Ereban dizanin. Wana hin zûtir dest bi vî karî kiriye û niha jî di pîremêran digerin ku zanyariyên derbara şoreşa bîstê jê werdigirin tomarkirina bîr û bawerên wan herçende jî zimanê Kurdî nedizanîn, lê ew hişyarî û çelengiya rewşenbîrên Ereba û tembelî paşkevîna rewşenbîrên Kurd e.

Ez şiyayî me heta niha 117 demhijmêran bi kasêt ji bîrewerên pîremêran tomar bikim, nexasime bi dengê wan li gundan û bajaran ji ber samaneke mezin e, niha jî dê bêxine ser kaxezê û dê belav kin bi rengê pirtûkî

## ÇEND AWIREK

### 1. Ya dest Nivîsan:

Mişe kes hene bîrewerên baş hene û rewşenbîr in, lê mixabin hizra hindê nekirine ya dastên xwe binivîsin da wek pirtûkekî mifayî jê werbigirin û mîna şûnawerkê bi cih bihêlit, pêdiviyê hizra yadest nivîsanê di nêv xwe de belav bikin.

### 2. Hêş (îhtîsas) nehati:

Ji ber hindê pitir ji keleşorê reng reng wê perîş û belave û nekomkiriye tim roj hinekê ji nav diçit. Me bi dirêjî behs kiriye. Ji ber hindê erke li ser milên tev daner û nivîsan û şair û çiroknivîs û tev rewşenbîran bikevin di komkirina vî keleşorî û pişkdar bibin di rizgarkirina wî de. Hene dibêjin ev e: Îhtîsasê min nîn e, belkî ez dîroknivîs im, şair im ya çiroknivîs im û xwe berpirsiyar neditin ger tev keleşorê kurdî bi deh hezaran wesaiqên kurdî bisojin û ji nêv biçin. Lê gelek di xelet in, çinkî em tev berpirsiyar in di beramber dîrokê de. Belkî eve nişana tembeliyê ye û ne wê xwe zehmet bidin dîroka komkirina keleşorî de.

Erê ger ez û tu vî karî nekin û tev mil bidin çîrokê û şîrê erê kî dê bimînit bo komkirina keleşorê me yê berfireh mîna deryayê. Navên giya yên kurdî, zanyariyan derbara saatên kurdî û mişe babatên di ji ku bi çend kesên çeleng, dilsoz hene, çira kom nakin, xasime çî daîre nîn in bo komkirina wî mîna “Mudîreyel et-teras”. Mesela komkirin û rizgarkirina keleşorî karek ferî ye nabit pas bêxîn. Çinkî yê di nav çûne de ye mîna nesaxekê di ber mirinê de bit. Bêguman divê nojdar pûte bi vî nesaxî bidit ne bo mirinê bihêlit û biçit bo nesaxekê wezê wî baş bit, êşa wî sivik bit. Ca ji ber ziravê keleşorê kurdî di hawîr komkirinê de ye ne di hawîr

“vekolanê” de. em negehiştine qonaxa ihtîsasê (pisporiyê). Divê keleşorê xwe kom bikin. Erê di pey me dihên bo vekolana li ser bikin. Nabit em mijûlên şol û karên xwe yê taybetî bin, çinkî mişê ji wî karê zanistiyê me hindê “forî” nîn e. Dikarin paş bêxin yan jî digel nivîsanên xwe yê taybetî keleşorî kom bikin.

Ji ber vê rastiyê min te’lifâtên xwe wê di rawestandin, “tecmîd” kirin û diwaz-de pirtûkên di nêv temam mayîne. Çinkî ev pirtûkine li ber serûkaniyan te’lif dikim. Yan ku binaxê van zanyariyan di ser û kaniyan de dinivîsayîne û berze nabin. Xetara ji nêv çûne li ser nîn e mîna li ser keleşorê belav heyî. Her demê bit ev zanyariyane di nêv jêderan de li ber destan. Ger niha nebin pirtûk ya piştî deh slên û ya ger ez van mewzuyan bi dumahî neînim, her rojekê hinek kes di wî barî de dê nivîsanê kin, dûr nîn e ji min baştir te’lif bikin. Her tiştêkî belav di nêv pertûk û kovara û rojnaman de û ya di komkirî bin. Di pertûkxana de ji derveyî welatî... eve hatin parastin û bûne milkê me, lê erê nekomkirî jî divê heyamekê demê xwe lê bi mezêxîn û nehêlin ji dest me biçit, çinkî ger ji navçû careka dî sax nabitin wek wesaiqên resimkirina xanî û tevregên tiştên nexiçkirî û tomarkirî. Nojdarî di nêv kurdewarîyê de û dabûnerêt û stêrnas û navê giyayên kurdî û zanyariyan derbara sin’etên kurdî û mişê babetên dî jî.

Divê em kar bikin li pey pêdvîyatî û feratîyê, li pey qonaxan komkirin û rizgar kirina keleşorî, ne li pey bi sanahiya mewzuyan. Ne bo niyazeka bazirganî û “di-oye” yanî bo peydakirina nav û deng, hinek kesan niyaza wan ewe navê wan di rojnamê û ya li radyoyê û ya televîzyonê de diyar bibit êdî berhemî wî çewabit li wî xem nîne. Ez jî dibêjim nav û deng di her demekî de yan bi nisbet hemî kesan û nişana girîngiya kar û xizmeta wî nîn e. Eger ho ba, divê xizmeta Mihemed Elî Kilayî ji xizmeta tev zanayên cîhanê mezintir bit, çinkî nav û dengên wî ji yê hemyan pitir in.

Hinek kesan çend pertûkek danayine û existine bazaran. Her çende karê wan cihê rêzgirtinê ye, belê van kesan pişkdarî ne kiriye di komkirin û rizgarkirina keleşorî de. Ku di dewrek girîng di vî barî de bînin û mişê tiştan rizgar bikin. Belkî karên wan pêkhatine ji veguhaztina zanyariyan ji vê pertûkê û ji wa hebo pertûka xwe û tiştêk nû peyda nekirine. Niha jî ev tovene di berhev nîn in, pêlava wan bi tozê û ya bi kurê bikevit di kolanên gund û bajarên Kurdistanê de bo komkirina keleşorî. We dizanin eger bo bikin wê kesatî ya wan û piçûk dibin xasime di berhev nîn in pere û rencê di van rêkan de bi mezê xin. Belkî van tovê kesan divê her karekê wan di mifa hebin: pare û nan.

Niha hinek ji çîrok nivîsan hest bi girîngiya keleşorî daye û hest dikin ku dîrok dê berpirsyar kit beramber li navçûna keleşorê netewayetî. Hest kirye ku ew rêbaza berê ya leng e ku xwo “ticmîd” û bend kirbû bi tenê di “kela” çîrokê de. Dîsan dibêjin pêdvîyê ji vê tengiyatîyê derkevin bo meydaneka berfireha keleşorê bajarvaniya xwe, bo nimune. Kak Şêrzad Hesenî ku çîroknivîsek baş e, niha mişê rayên xwe guhurîne û di nameka xwe da nivîsabû bo min: “Rast e, em her mijû-

lên şîir û çîrokên e, eve nişana tembelî û kê m mesrefe ye û bi sanahîtir e ji geryan li bajar û gundan bo komkirina kelepôrî.“

Hewesa Kak Salam Memî ku çîroknivîsek dîyar e, niha mil daye komkirina çîrok û efsanên kurdî li ser zarê pîrên gundan û di vî sal û nivê de dibêjit nêzikî 52 çîrok û efsane min komkirine. Lewra ez di wê bawerî da me ku vîyana kelepôrê bajarvanî ya me di dilê mişe kesên di de bêtin çandin. Kelepôr dozek netewayî û bajarvanî ye. Pute dan bi kelepôrê bab û bapîran nişana pêşkevtina bajarvaniya milletî ye. Dozeka girêdaye bi pêla pêşkevtina hizrî û bajaraniya milletî ve. Nimune di pêş sih-çil salan milletên Erebb, Faris û Tirkan pûte bi kelepôrî ne dida niha diroknivîsên mîna Xwedê jê razî Ebbas El Xerayî diçû Îstebolê û bi cumle destnivîsên “Mextutat” bi bihayekê kê m dikirîn, belê niha bi çetin yek mîna wan bikarî, bi tenê yek destnivîs ji namexana Suleymaniyê ku mezintirîn namexana Îstebolê ye “îstînsax” bikirî û yan her bi mikrofilmê namexanê wê ne bikirî.

Pêdvîyê niha bi hinek bîr û hizrên nû û berfireh hêkên mesela kelepôrî û hinek tayên di bînin pêş ku ji berî niha ronakbîrên kurd bîr lê nekîr ye. Wek divê gotarê de dihêt dîtin, da bibit seretayek “xandegha nû ya kelepôrê” kurdî.

3- Karkirin li dû pêdvîyatê:

4- Guherina nivîsanên biyaniyan:

Niha mişe kesan mil dayine wergêrana nivîsanên welatên biyanî bo ser zimanê kurdî, çî gotar çî pertuk ku pitir jê di berî niha de xwendevanê kurd van nivîsanên bi Erebbî (Farisî, Tirkî û zimanên din. w.) dixwînin. Ji ber hindê pêdvî nakit ew nivîser demê xwe yê zêrîn bi mezêxin, bi wergêranê ve xasime em di qonaxa komkirina kelepôrî dayine. Ev guherîna wa bûye nesaxiyek bo bizava rewşenbiriya kurdî. Ev kare jî %80ê bo niyazeka bazarganî ye. Çînkî her zu kovar, rojname û dam û dazgehên rewşenbiriya me wan wergêra bo çap dikin pere jî dikevin dest û tiştên resenên kurdî li cihê xwe dimînin. Mişe ji wan kesan jî mirovên tembel in hez ji saxkirina kelepôrî nake. Ev tovê kesêna şarezayî di dirok û kelepôrê kurdî de nîn e.

Pute dan bi vî rengê wergêranê xwe mijûl kirin bi nivîsanên biyanî bave zîyanê digehînit giyanê behs û vekolan û mereqa saxkirina kelepôrî di nêv hinek rewşenbîran de, hineka fêrî tembeliyê dikin.

Min ev ziyane (wek belavkirina ruha ticarî şûna giyanê zanistî) bi dirêjahî “Dar es-Seqafe ve-n-Nesr el Kurdîyye”, nivîsa dirok 16. 6. 1981 ê. Her wesa bo kurdê şîir û çîrokê jî min nivîsa ku li havîna 1983 ê li Hewlêrê gêra.

Li dumahiyê hîvîdar im, gencên me yê ronakbîrî dest bavêjin xirvekirina kelepôrê kurdî bi şewek Şoreşgerane. ■

# Kalê Rind

LOKMAN POLAT

**M**in romana Mehmed Uzun a bi navê “Mirina Kalekî Rind” 10 sal berê, wextaku nûh derketibû xwend. Niha li ser wê xwendina min de 10 sal bûrî û ez vê romanê carekî din dixwînim. Wexta ku min wê demê vê romanê xwend, ez bi edebiyatê û karê kulturî re pir mijul nedibûm. Di wê demê de ez bi siyasetê ve heşir - neşir bûm. Min di kovara “Hêviya Gel” de her tim nivîsên siyasî dinivîsand. Min bi du - sê îmzeyên cuda dinivîsand. 44 hejmarên kovara “Hêviya Gel” derketin û ji 50’yî zêdetir nivîs û meqaleyên min tê de hatin weşandinê. Ji wan nivîsan tenê 1 nivîsek kulturî, literaturî bû. Ew nivîs jî li ser romanek klasîk ya nivîskarekî Rusî bû.

Ez wek 10 sal berê nînim. Niha ez bi edebiyatê re heşir û neşir im. Bi kar û xebata çandî, edebî re mijul dibin. Xwendina min ya cara duyem jî bo min gelek baş bû. Wexta 10 sal berê min vê romanê xwend li ser min tu tesîrek nekir. Wê demê min li romanê û nivîskare romanê bi çavekî din dinêriyan. Ew dem ez sosyalistekî doxmatîk bûm û li gorî min jî nivîskare romanê rewşenbîrekî burjuvaziya biçûk bû. Romana wî û dîtînen di romanê de jî li gorî min xewn û xeyalên burjuvaziya biçûk bû. Wê demê em “Bilîmsel Sosyalîst” bûn û me dîtînen derî xwe xelît didîtin, biçûk didîtin. Yanî bi kurtahî min wê demê romanê neecibandibû û min utopya, fentezî û romantîzma di romanê de wek hezeyana felsefîk ya rewşenbîrekî burjuvaziya biçûk didîtin.

Helbet mirov her digehure. Tu kes wek xwe namîne. Ji xwe li gor zagonên dîyalektîkê jî mirov û hemû tiştên heyî di nav pêvajoyê de têne guhartin. Di vê pêvajoya 10 salan de ez jî gelek hatim guhertin. Li gor doh, îro ez hîn pêştatir im. Nirxandina min ya li ser bûyeran, analîzên min yê li ser berhemana îro hîn objektîftir e. Têgihîştina min ya li ser berhemên edebî jî wê demê baştir e. Nirxandinên ku îro ez li ser berhemên edebî dikim bi naveroka xwe analîzên dewlemend in. Ji alî xwendevanan têne ecibandin. Doh, di wê dema berê de ez nikaribûm van analîzan binivîsim. Guhartin, xwe nûhkirin her tim mirov pêşve dibe.

Niha em bèn ser romanê. “*Mirina Kalekî Rind*” romana *Mehmed Uzun* ya du-  
yem e. Roman di nav weşanên “*Orfeus*” de hatiye weşandin. Roman 135 rûpel e.  
Bergê romanê rengîn e û gelek spehî ye. Di wêneya li ser bergê romanê de, wêneya  
ya Kalê rind ê filozof û wêneya xortê ciwan Serdar Azad heye. Roman ne tenê ji  
Kalekî rind re, ji gelek Kalên rind yên Kurd re; her wekî Osman Sebri, Cîgerxwîn,  
Hesen Hişyar, Feqî Husên, Şêx Îzeddîn Huseynî re hatiye îthaf kirin.

“*Mirina Kalekî Rind*” romanek felsefî ye. Di vê romanê de tîrêjên herikandi-  
nên edebiyata cihanê heye. Di vê romanê de Futurîzm û surrealîzm heye. Di ro-  
manê de utopya, fentezî û romantîzmek xurt heye. Kalo Filozofekî zanîst, Serdar  
Azad jî şoreşgerekî romantîk e. Di Filozofîya Kalo de rûpelên dîroka Kurdistanê  
hene, nîrxandinên rastî yên civakî hene, gotin û hevokên balkêş hene, Filozofîye-  
kî rengdîrokî heye, hîs û ramanên edebî yên dewlemend hene, di şoreşgeriya Ser-  
dar Azad de hîs û ramênên baş, daxwazên pîroz hene. Di vê romanê de sirgûnî û  
hesret heye.

Lehengê romanê serdar Azad tixûp - sînor- li pey xwe dihêle û diçe bin xetê.  
Wek ku di gotinên pêşyan de dibêjin; ew berê xwe dide oxirê û piştî xwe dide fe-  
lekê. Di jiyana Serdar Azad de rûpeleke nû vedibe. Lewra ew welatê xwe terk dike  
û paşê diçe cihê ku derya û aso bi hev re dibin yek, diçe Swêdê.

Di binê xetê de, di gundek de Serdar Azad û kalê rind hevûdu dinasin. Bi hev-  
re li ser gelek tiştan diaxifin, munaqêşe dikin. Kalê rind, li ser şerê cihanê a duyem  
nîrxandinên gelek balkêş dîke. Ew bi xwe wê demê jiyaye. Di wê demê de jan û êş  
heye. Evîn, dilovanî, ziman û însaniyet hatiye qetilkirin.

Serdar Azad, ku romannivîser *Mehmed Uzun* bi xwe ye, wexta derbasê bin xe-  
tê dibe ew û hevalê ku pê re ye diçin gundekî piçûk. Dibin mêvanê şivên. Roman-  
nivîser *Mehmed Uzun* gelek baş, bi şêweya tîr û tije edebî taswîra gund û mala Şi-  
vên dîke. Ew şev li wir radizin, wexta ku serê sibê radibin, dengê bilura kalê rind  
tê dikeve gohê wan. Nivîskar *Mehmed Uzun* li ser dengê bilurê taswîrek wisan di-  
ke ku ruh û giyanê mirovan dişad dîke. Xwe digihîne kûrahiya ruhê mirov û mi-  
rov sermest dîke.

Nivîskar di romanê de cihê ku behsa Hehecikan dîke, gelek bala min kişand.  
Min bire dema min a piçûkahiye. Jiyana me Kurdan, xaniyên me, malên me Kur-  
dan wekhev in. Hehecikên me jî hebûn. Di mala me da jî Hehecikan hêlîn çê-  
kiribûn. Di xwendina min ya yekem de van rûpelên ku behsa Hehecikan têt ki-  
rin qet bala min nekişandibû. Niha di xwendina min a cara duyem de pir bala  
min kişand, min bir piçûkahiya min. Û min di xwe de gelek hîs kir, ku min çiqas  
bêriya mala xwe ya li welêt, mala xwe ya ku ez tê de mezin bûbûm kiriye. Hesre-  
ta welêt, hesreta dilê min pêl da.

Kalê rind mirovek gelek bi tecrube û zana bû. Bi peyvên filozofî dipeyiviya.  
Dema ku Serdar azad û kalo bi hev re dipeyivin, kalo jê pirs dîke ku ew çawan ji

sînor derbas bûbûn. Serdar azad bersîv dida pê û dibêje; “ez pir tirsîyam.” Li ser van gotinên Serdar Azad, kalo weha dibêje: “Na, na... Hûn divê neheqî li xwe nekin. Eger hûn xurt û jîr nebûna û we ev xurtiya xwe nîşan neda, hingê hûn dê ev çend netirsîyana jî. Ma tirs çî ye? Ma tirs dikare bê xurtiyê hebe? Tirs xwişka xurtiyê ye. Herweha hûn divê ji bîr nekin, jiyana me, der û dorên me bi tirs û xurtiyeke nedîtî hatiye girtin û pêçandin. Em, însanên vî welatê di navbera tirs û xurtiyê de diçin û tîn.”

Ev gotinên kalê rind di dil û mejiyê mirov de pêl didin, gelek bala mirov dikşînin. Gotinên weha, wek ku nivîskarê romanê jî dibêje; gotinên bi heyecan in, bi sihêr in.

Serdar Azad ji kalê rind re behsa stanbolê û bajarên mezin dike. Nirxandina kalo ya li ser Stanbolê ji bo hemû bajarên metropol yê Tirkîyê rastiyê tîne zimên. Kalê rind weha dibêje: “Ez bawer dikim ku ew der jî gelek xirab bûne. Ew der jî niha bûne wekî koxa mirîşkan; însan hevûdu dixwin û diperçiqînin û tê de nefes nayê girtin. Ez bawer dikim, niha li wan deran bîhn li însanan diçike.”

Serdar Azad wexta ku bi kalê rind re diaxife, di peyivandina wî de derdixe ku kalo ji wê derê -Kurdê ji Kurdistana başûrê piçûk- nîn e. Ji kalo pirs dike ku ew ji ko ye? Kalo jê re dibêje ez ji vir im. Ez însanê vê axê me. Dema ku Serdar Azad ji kalo xatir dixwaze ku hendî birêkeve biçê -ji gund biçê bajêr-, kalo jê re dibêje : “Ji reh û riç, ax û zimanê xwe vemeqete. Ew, di nav vê jiyana nexweş û neçar de kaniyên kêfxweşiya me ne.”

Gotinên kalo gotinên gelek girîng û bi mane ne. Ez dixwazim bi van gotinên wî yê feylezofî, filozofîya kalo derxim pêş.

Serdar azad ji kalo xatir dixwaze, ji gund derdikeve û bi hevalê xwe re diçe bajêr. Ji wir jî diçe Stockholmê. Di Stockholmê de jiyana wî ya sirgûnîyê dest pê dike.

Ev roman; “*Mirina Kalekî rind*” di alîkî de jî romana sirgûnîyê, xerîbîyê û hesretê ye. Serdar Azad diçe Stockholmê û li wir, di warê xwe yê sirgûnîyê de wek her kesên sirgûnkirî di serî de tenêti û xerîbî dikşîne. Bêriya axa bav û kalên xwe dike. Îlham tê pê û dest bi nivîsîna helbestan dike. Li Stockholmê Serdar Azad dibe Ferzende Baran û bi vê nasnavê helbestên Hêvî, Hesret û azadiyê dinivîse.

Serdar Azad di warê xwe yê sirgûnîyê de, di pêvajoya jiyana demê de gelek mirov nas dike, bi gelek re dibe heval. Bi jinên spehî yê gelek rind re dibe dost û ji wan re behsa kalê rind dike. Serdar Azad ji wan jinên bedew yê rind û yê porzer re dibêje: “Min li ser riya xwe kalekî rîspî û ecêp dît. Ez gelek meraq dikim ka ew çî kes bû.”

Serdar Azad li Stockholmê çend car kalê rind di xewna xwe de dibîne. Ew vê romana xwe û kalê rind jî di Stockholmê de dinivîse. Di destpêka romanê de behsa xewnên xwe dike ku çawan kalê rind de xewna xwe de ditiye.

Serdar Azad di jiyana xwe ya nûh ya sirgûnîyê de hem gelek zehmetî dibîne û hem jî gelek tiştên nû fêr dibe. Di vê demê kalê rind her tim di bîra Serdar azad de ye. Ew wî qet ji bîr nake. Tim di heşê wî de ye. Di navberê de du sal derbas di- be. Piştî du salan Serdar azad diçe serlêdana kalo û wî dibîne.

Serdar Azad diçe gundê kalo. Kalo, ku çavên wî kor e, bi dengê Serdar Azad wî nas dike. Serdar Azad di serî de ji wan re behsa Swêdê dike. Behsa nakokîyên jiya- nê dike. Kaloyê rind jî van gotinên pir bi mane dibêje: “Ax û welatên xerîb çiqas baş û xweş dibin bila bibin, însan nikare her li wan deran bimîne û bihewe. Însan nikare rehên xwe berde bin axên xerîb.” Dibînin, çiqas gotinên xweş û rast in ku ji devê kalo derdikevin.

Min got ez dixwazim di vê analîza xwe de filozofîya kalo derxim pêş. Nirxan- dinên kalo yên di gelek waran de nirxandinên filozofîk in. Nirxandina kalo ya li ser gundiyan jî nirxandinek gelek girîng e. Mirovê ku gundiyan ji nêz ve baş nas neke, nikare vê nirxandinê bike. Binêrin kalo ji bo gundiyan çi dibêje: “Gundi... yanê em... em însanên rehet in. Em di nav tebîetê de ne, têkiliya me bi tebîetê re pir xurt e. Heye ku ji ber vê yekê be, em li gor daxwaziya dilê xwe radibin û rûdi- nin. Em her tiştî; rindî, xirabî, dostî, dijminî, evîn û evindariyê... her tiştî li gor ku em hîn bûne, li gor ku em pê dizanin, dibêjin, dijîn û li ser dipeyivin. Pîvanên me jî li gor me ne. Ez nabêjim ku yên me ji yên komik û civatên din çêtir yan jî xi- rabtir in. Lê pîvanên me li gor me û civata me ne û em li gor wan radibin û rûdi- nin. Mêvanbûn, mêvanezimandin, xwedanmêvanî ji bo me tiştên pir û pir mu- hîm in. Em gelek ehmiyet didin vê tiştê. Tu dizanî... li ser vê yekê gelek stran û dastanên me jî hene. Ew stran û dastanên ku behsa mîr û serekeşîrên mêvanper- wer dikin. Mîr û serekeşîr -ji bo ku mêvanên xwe nedin destê dijmin- xwe didin kuştin...”

Serdar Azad dixwaze stran, dastan û çîrokên kevn berhev bike. Ew vê daxwa- ziya xwe ji kalo re dibêje. Kalo pêşî dibêje: “Ew tiştên ku tu behs dikî, ewçend pir in ku xebateke weha dikare çend umir kuta bike...” Paşê jî kalo soz dide pê ku ew dê alîkariya wî bike. Û kalo di vê hêlê de gelek alîkariya Serdar Azad dike. Serdar Azad dilê xwe bi peyvên kalo yên kevn û efsanewî diniqîşîne. Kalo jî her diaxife, qal dike û di nav cîhana peyvên rengîn de dimeşe.

Serdar Azad ew şev di gund de, di mala Şivên de dimîne. Roja din dîsa diçe cem kalo. Ew û kalo dest bi sohbetê dikin. Kalo jê re behsa xewna xwe ya ku şeva çûyî dîtiye, dike. Xewna kalo xewnek bi mane ye. Li ser xewn û xeyalan kalo nir- xandinên zanistî dike. Ew weha dibêje: “Ez, ji mêj ve ye, her bawer dikim ku xewn û xeyal tahmeke xweş didin jiyane. Bi baweriya min jiyaneke bêxewn weke kahni- ya avmîçîqî ye...” Kalo bi van gotinên xwe xewn û rastiya jiyane tîne zimên.

Serdar Azad û kalê rind, rojê 4 - 5 saet li ser çîrok û dastanan dixebitin. Kalo çîrok û dastanên ku zane dibêje û Serdar Azad jî hem dinivîse û hem jî dengê ka-

lo dikşine kasetan. Kalo ji Serdar Azad re behsa jiyân û helbestên Mellayê Cizîrî dike. Serdar Azad di wê demê de baş ji Mellayê Cizîrî hayidar nîne.

Serdar Azad hefteyek di gund de dimîne. Roja dawî ku dê hendî biçe, ji kalo re dibêje: “Êdî min çûyîn divê. Ev bûn çend roj ku em bi hev re ne. Lê te di derheqê xwe de tu tişt negot. Eger min bikaribûya te -hinek bûya ji- binasiya, ez dê kêfxweş bûbûma.” Li ser van gotinên Serdar Azad, kalo weha bersîva wî dide: “Belê, eşkere ye ku tu dil dikî bizanibî ka ez kî me û ji kû hatime. Ev meraq, meraqêqî bêmane û bêkêr e. Tu bê sebeb tiştên weha meraq dikî. Qet, bi rastî jî qet ne muhîm e ka ez kî me û ji kû hatime. Herweha qet ne muhîm e ka tu kî yî û ji kû hatiyî,.. Şivan jî û yên din jî... Em însan in, tu têdigihêyî, em însan in. Em bîr nabin ku em ji bo jîn û jiyînê hatine dinê. Meraq, ev meraqê ku em qet nikarin jê bifilitin, aha vê yekê bi me dide jibîrkirin. Meraq, guman, şik, nerehetî, weswese, endîşe, jîna bi lez û bez û bi hezaran, bi sedhezaran qise û kelîme... Aha ev tişt in ku em dîl xistine. Lê mixabin, hezar mixabin ku em, însan jî dîlitiyê qebûl dikin. De baş e, havilê vê yekê çi dibe? Tirs, qahr, berberî, keser û westîn... Însan, însaniyetî ji ber van tiştan diweste... Îsanetî diweste...”

Li ser van gotinên kalo, hendî Serdar azad tiştekan jê re nabêje û xatir jê dixwaze ku biçe. Serdar Azad wexta jê xatir dixwaze, jê re dibêje ku; ew dê dîsan were serlêdana kalo. Dema ku Serdar Azad li ser birêketinê ye, kalo jê dipirse, dibêje : “Tu dizanî Rindî kî ne û edet û toreyên wan çi ne?”. Serdar Azad nizane Rindî kî ne. Ev cara pêşîne ku navê Rindîyan dibihîse.

Serdar Azad lê dixe diçe Stockholmê. Li Stockholmê dest pê dike li ser Melayê Cizîrî û Rindîyan agahî berhev dike. Ew li ser Melayê Cizîrî bi hêsanî agahî peyda dike. Lê li ser Rindîyan agahî peydakirin ne hêsan e. Erê Rindî kî bûn? Serdar Azad li ser Rindîyan lêdikole. Lêgerîn dike, ji gelek nas û dostan pirs dike ku Rindî kî ne. Lê di vê lêgerîna xwe de - di demek dûr û dirêj de- tu encamek nagire. Rojek ji Serdar Azad re nameyek ji Tahrânê tê. Hozanekî Kurd jê re ev name şiyandiye. Hozanê Kurd pê hesiyaye ku Serdar Azad li ser Rindîyan lêgerîn dike. Loma wî vê nameyê şiyandiye û di nameya xwe de behsa Rindîyan dike. Bi vê nameyê ve Rindî û mesela wan derdikeve ronahiyê. Serdar Azad ji nameyê edet, tore û şexsiyeta Rindîyan fêr dibe û digihîşe wê encamê ku kalo jî Rindî ye, felsefeya Rindîyan diparêze.

Piştî salekî, Serdar Azad dîsa diçe cem kalo. Ji bo hatina Serdar Azad gelek keyfa kalo tê. Bi hev re diaxifin. Kalo li ser tebîetê-xwezayê, natûrê- û xweşiyên wê gotinên filozofane dibêje. Kalo pîrozîya axê weha dinirxîne: “Çavên min nabînin, lê ez pir baş pê dihesim ka tebîet çawan ji nû ve vedije. Ez vê yekê dijîm. Tu dizanî, ji axê xweştir, rindtir û miqedestir tu tişt tune. Ez pir jê hez dikim... Ez ji axa mader û tiştên ku jê dizên, pir hez dikim. Belê, dîsan wext, wexta hişinbûna xweşiyana e. Wext dîsan avis e. Wext, dîsan wexta li bin darê rûniştinê ye...”

Serdar Azad ji kalê rind re nameya ku ji Tahrânê jê re hatibû dixwîne. Kalo bi dil û can gohdariya nameyê dike. Di nameyê de li ser Rindîyan gelek agahdarî hene. Felsefeya Rindîyan, Nêrîn û ramanên wan, gelek balkêş in. Di nêrînên wan de ramanên filozofîtiyê hene. Ew bi ramanên xwe wek bîrewer û filozofan in. Bi firehî û kûrî li ser jiyane diramin.

Serdar Azad di gund çend roj dimîne. Ew û kalo bi hev re sohbetên xweş dikin. Rojek Serdar azad ji kalo re dibêje : “Ez niha dizanim ka hûn Rindî kî ne. Serdar Azad ji kalo re dîsa bi kurta hî behsa nameyê û behsa edet, tore û felsefeya wan dike. Kalo dikene, dilşad dibe. Kalo diyar dike ku ew xwediyê nameyê, helbestvanê Kurd ji berê de nas dike. Serdar Azad di çûyîna xwe ya vê carê de li gund, li cem kalo sê hefte dimîne. Di wan sê hefteyan de Serdar Azad fêr dibe ku kalo ji Diyarbekirê -Amedê- ye. Kalo li Diyarbekirê tê dinê. Li Stanbol û Kahîrê dibistana edebiyat û ziman dixwîne. Ew bi tirkî, farisî û erebî dizane, û edebiyata wan ji nêzîk ve dinase. Kalo çûye gelek welatan, li wan deran maye. Kalo çûye Ewropayê jî. Li Yunanîstanê, li Venedîkê maye. Û piştî ger û mayîna li gelek welatan kalo dizivire Kurdistana başûrê biçûk û di vî gundî de bi çih û war dibe. Umrê -temenê- xwe di gund de derbas dike. Di vî gundî de kor dibe.

Serdar Azad gelek meraq dike ku kalo çawan bûbû Rindî û çima bûbû? Ew vê پرسê ji kalo dike. Kalo “ev mesele durr û dirêje” dibêje û paşê vê meselê ji Serdar Azad re behs dike.

Serdar Azad piştî sê hefteyan ji wir tê Swêdê. Lê ew dil dike ku carek din jî biçe serlêdana kalo. Serdar Azad li ser dastaneke kevn dixebite û ji bo vê jî alikariya kalo pêwîst e.

Piştî saleke Serdar Azad diçe gund. Lê, kalo sax-zindî- nebû, miribû. Du hefte berî ku Serdar Azad biçe gund, kalo vefat dike. Gundîyan ew li gor daxwaziya wî, li bin darê veşartine. Gora kalo dibe ziyaretgeh û kalê rind jî dibe ezîz.

Romana “*Mirina Kalekî Rind*” romanek xweş e. Romannivîser Mehmed Uzun bi vê romana xwe ya felsefî zimanê Kurdî gelek dewlemend kiriye. ■

# Însan û Dîn

ABDURRAHMAN UÇAMAN

**E**m vî dibînin ku însan ji bo dîn zemîn e. Gelo însan dîn ji bo xwe çi dibîne? Gelo jibo wî çandek (kultur) e? Xemlekî ye? Sûxrekî ye? Dezgehekî ye? Sîperekî ye? Dilgiretinekî (teselî) ye? Yan jî îhtiyaciyeke tabîî (xwezayî) ye? Eger em vî tiştî ji tevî însanên serwext bipirsîn, ew jî di bersiva me de ji tu tişteki venekişin û netirsîn, gelo ji van heft nûqtan, her yek di sedî de dê para we çend tene bikeve?

Eger em vê pirskirina xwe di nava dîroka (tarîxa) beşer da raxin, yanî em vê pirsê ji însanê çar hezar sal berê bipirsîn û pêda werin ji van însanê îroyîn (1994) jî bipirsîn, dawiyê jî em xwe berdîna nawisa (tûnela) zemanê hatî û bi tenê em çar sed sal pêş da herin, yanî em vê pirsê ji wan însanên ku ew di sala (2394) da, di cîyê me yê îroyîn da ne, bikin.... Piştî ku em wan bersivan (welam-cewab) bînin ber hev, gelo wê gavê dê belî nebe ku dîn ji bo însan çi ye?... Hela piştî ku em piçûkiya xwe bi bîr bînin û bi îro ra bipîvin, yanî gelek ji wan tiştên ku ji îro ra sî sal berê bi bîr hanîn û di bîr da derbaskirina wan, (bi dîtina van însanên derûdor e), sûc û gunehekî pîrr giran dihatin dîtin, evro em ewan tiştan bi serbestî bi wan merivan ra mijûl dibin.

Ez dibêjim ku ev tevlihevî û hevnegirtin ji hevnegirtinê dîtinên însanan in, yanî her însan, dîn bi qabiliyet û dîtina xwe dipêve. Materyalist û diyalektîkçi jî wekî dîndaran, bi dîtin û qabiliyeta xwe, madde û têkoşîna (cedel) wê digevîzînin. Ji ber neyekîti û hevnegirtina dîtin û qabiliyeta wan herdu nîfşê însanan, ew ne di nava xwe da lihev in û ne jî bi nîfşê dî ra. Ez dikarim bêjim ku danasî (tarîf) yê dîn bi qandî dîtinê wan însanên ku ew xwediyê dîtinan in, di dîn da...

Ez dibêjim, piştî ku zemîna dîn însan e, ev zemîniya wî ji bo dîn, ji îhtiyaciya wî ya bi dîn çê bûye. Lewra ji wan tiştên ku însan bi wan vediqete ji birayên xwe yê heywan, yek jî terciha bi hîsab e, yanî însan di rahiştin û nerahiştina îşan û ajotin û terkkirina wan da, bi hîsabê kara xwe biryar dide, ku ji vê biryarê ra têtete gotin "îrade". Di însanan da sê tene quwet hene ku hîsabê kar û xesara însan, têtete der ji şer û têkoşînê wan her sêyan, ku ew zewq û wîcdan û aqilê selîm in. Ev hersê jî tu car di tu tişteki da bê kêmanî, "Yanî bê tirs û xeyd û şerm û şubhekî ji wan yekî" bi hev nakin... Hate zanîn ku însan; heywanekî şubhekar e. Ev şubhe-

kariya wî hem wî pêşda dibe, hem jî di çavê wî da piçûk dixîne. Jibo ku ew xwe jî binê giraniya wê piçûkatiyê derxîne, divê ku ew xwediyê îradekî (hêza berxwedanê) bêdawî be. Em vî dibînin ku; însan bi her hawayê xwe (girani, dirêjî, bihîstin, zanîn, zewq... yanî jî daxwazê pêve) di nava du nuqtan da pîvandiyê, bi dawî ye. (daxwaz jî jibo ku însan bi wî însan e, ew bêdawî ye)... Însan; hêza berxwedana wî li ku biqede jibo ku bêhêvî nebe, karibe hebûna xwe bajo, ew li kanekî û serkaniyekî digere ku hem kêmaniya xwe jê bigere hem jî wan daxwazên xwe yên bêdawî bi destê xwe bixe. Yanî ev umud û ev hîviya ku însan bi jiyanê ve girê didin, naxo, însan jibo ku xwediyê destê kin û daxwazên bêdawî ye, ew dê jî jiyan û hebûn, xebatê biçixe (nefret bike). Belkî jî bi wan ra dijminatî jî bike, însan; bi rast pîvana nava daxwaz û bi destxistinê xwe tête pîvan, ev pîvan jî jibo herkesî bi dîtina wî ye... Însan piştî ku dûrbûna nava daxwaz û bi destxistiyên xwe dibîne.

Dîsa jî em dibînin ku di Qur'anê azadkirina kole, bûye cezayê hinkî sûcan, hinkî gunehan. Yanî hinkî sûc û hinkî guneh hene ku bi azadkirina koleyekî gunehê wan jî ser meriv têt helanîn. Wekî; jî vî jî tête zanîn ku dîne Hz. Muhemmed dîne azadiyê ye, ne dîne koletiyê ye. Piştî wefata Hz. Muhemmed Araban jî nû ve koletiyê sazîkirin herwekî ku ev ayet di Qur'anê da tûne bûye.

Dîsa jî ez dibêjim tu kesek nikare tu tiştî îsbat bike ku Hz. Muhammed yek însanekî hûrr dîne wî, milliyeta wî çi dibe bila bibe) gerandiye kole.

Nûha ez dê ayeteke Qur'anê terceme bikim, hem jî ez dê fikra xwe jî binivîsim û bisipêrim dîtina we. Gelo hûn çi dibêjin? Ayet ev e: "Eger hûn bitirsin ku hûn dê di nava sêwîyan (yetîman) da yekîtiyê (adalet) ê daneynin, wê gavê hûn jî jinan, -ewanê ku jî bo we ra bi kêr tîn- yek, dido, sisê û çar mar bikin, eger hûn bitirsin ku hûn dê di nava wan da jî yekîtiyê (adaletê) daneynin, yekî tenê..." Ez dibêjim ku ev ayeta hanê, jibo pêşgirtina li toli, tolazî, çavliderî û parsekiyê nazil bûye. Lewra sêwî jinên şehîd û miriyên mislimanan bêkes diman, eger wan jinan nehatana markirin û xwedîkirin û haydariya li wan nebûna barê malê, kêman însan dikaribûn li wan xwedîti bikin. Piştî ku wan jinan bihatan markirin êdî xwedîkirina wan û zarokên wan dibû barê mêrê malê.

Bi devê mantiqê jî îfadeyên weha ra tête gotin: (Qediyya şertiya muttesîle) yanî, hebûn yan jî tunbûna tişteki, bi hebûn yan jî tunbûna tişteki dî ve tête girêdan. Her kelîma ku di nivê pêşin cih girtibe, ew li xwe ser jî şertekî ye, jibo pêkhanîna nivê pašin... Em bala xwe didin şopa tarîxê û ta ku digihîje vê roja me. Em dibînin gelek jî şêxan û melayan, pirrê zengîn û axayan, hemen hemen bi tevayî xwediyê eywan û serayan; du jin, sê jin, çar jin hanîne, herwekî ku di ayetê da "yetîm" derbas nebûne. Hela mela û şêxan negotine ku gelo ev yetîm li vê navê çi digerin? ... Kî wera bûye û karibûye bi qandî ku jî destên wî hatiye çend jin mar kiriye. Gelo çira ev ayeta hanê ku bi şeklê qediyya şertiye nazil bûye. "Di qediyyê weha da, hûkûm yanî nivê pašin girêdayê nivê pêşin e" di fiqhê da li ser nivê pašinê qediyy-

yê hûkûm hatiye danîn.

Qey nabe ku em bibêjin: “Di hukmê weha da, para giraniya darê zordestiya se-ray û saltanatê heye? Paşê bûye gelenek (kevneşop).

Gelî birayên musliman, ez vî ji we dipirsim; fiqha me dibêje ku; (ew heywana ku Areb bibêje goştê wê têt xwarin, ew heywan goştê wê helal e û herçi ew heywana ku Areb bibêjin goştê wê nayêt xwarin, ew heywan goştê wê heram e) gelo hûn ji vî ra çi dibêjin?

Dîsa ez dibêjim; ewan îsanên ku nema xirabî ku bi Hz. Muhemmed û hevalên wî kirin, heta ku ew û hevalên xwe ji ber wan derbeder bûn çûn Yesribê (Medîne)... Piştî ku Muhemmed Mekkeyê vegirt (fetih kir) ket nava bajar, ewan îsanên ku hewçend xirabî bi wî û hevalên wî kiribûn û a nebûyî anîbûn serê wan, ne wî ne jî tu hevalekî wî tu yekî ji wan îsanan nekuşt, nekirin kole, ne jî fidye ji wan sendin. Ez nabêjim hûn herin ji alimê fiqhê bipirsin, bibêjin; gelo di piştî wefata Hz. Muhemmed da ewan qumutanên muslimanan dema ku bajarekî vegirtina, di təkiliya alê wî bajarî da salahiyeta wî çi derce bû? kanibû wan îsanan bike kole yan na?

Dîsa Mela dibêje:

*Di qidem da ezel û aynê ebed herdu yek in,*

*Sermediyyet we dixwazit :ne ezel bit ne ebed...*

Sermediyyet sifir zeman e. Sifir zeman, ji sifir fizikê dizê, sifir fizik jî ji sifir mekanê dizê. Eger îsan bikaribe her tiştî tune bibîne û xwe jî bigerîne fikreke sade yanî bê mêji û bê madde, ew dê bibîne ku ne zeman heye ne mekan, ew e ku îsan ji wî ra dibêje Xudan heye, hew Xudan heye.... Mela jî dibêje:

*Ev burhan ku tu bê burhan î.*

*Ew e hebûna bê delîl û bê burhan.*

Hela em zeman û mekan bihêlin li cihê wan, em bala xwe bidin îsan. Min ji qelemê pirsî, gelo îsan çi ye? Wê got ku bi tevayî;

*Îsan çîye toyê wî ye*

*Xûn û hestî, rûn û mû ye*

*Hêj nîzane kî ji kû hat*

*Bo çi hat û kûda çûye*

Piştî ku îsan vê pejala sê çeçel ne pişkastiye, yanî hêjî nîzane kî ji kû hatiye, gelo ew ji bo çi hatibû, kanî ew kûda çû...? Em dikanin bibêjin:

*Îsan tiştekek wek karuk e,*

*Nav mezin e nav piçûk e,*

*Ew di şopa nan û av da*

*Lê bê bûk e, lê ne pûk e.*

Însan tiştêkî pirr tarî ye. Em însan sîmayê hev dibînin, em navê hev dixwînin, lêbelê em nava hev nabînin û naxwînin. Ewan “me”ê ku bi hev ra xeber didin, navê hev dixwînin û bi hev ra dan û standin dikin, evana ne “em”ê tarî ne, belkî evana şertê me û zora derûdora me û kara me ne.

Ew însanê tarî, wek kevirê ne dirize ne jî diguhere, bi tenê wek siyê di bin îmkân û şertê xwe da dibûhûre. Kî wê siyê di kî da çiqas sade dibîne, ew wî merivî ewqas nas dike. Ji ber vê yekê, kî dibêje ku ez filan kesê bi her hawayî nas dikim ew meriv xwe dixapîne. Lewra her însan daxwazê wî bêdawî ne, davikên wî çikan-dî ne, li bendê ye. Gelo dê çwan keysê li kîjan daxwaz bîne. Însan nagûhere, bi tenê şert û îmkânên wî ku bigûherin, riyê xwe yê tarî li gora wan rava dide.

Ji nav însanan gelek pêxember û filozof û alim derketine. Pêxemberan bi rûhê însana ra xeber dane, kar û zirara wî bi şîret û gefxwarinê ravay wî dane. Filozofan bi aqilê însan ra xeber dane, kar û zirara wî li ber wî raxistine. Aliman jî bi dîtinên xwe, gotinên pêxemberan û dîtinên filozofan ji wî ra pişkafîne û fire kirine. Evan hersê barkêşan jî tu havil bi însan nekirine, bar bi ser darê zorê da dargeryaye. Yê karibûye xebitandiyê, yê ku nekaribûye ya hatiye kuştin ya jî reviyaye. Em însan di tariya wî da bihêlin. Lewra; *her însanekî li xweser kîtabeka mezin e/ Kîjan rûpel tu vekî tijî gilî û gazin e.*

Ji ber ku însan heywanekî komejîn (îctîmaî) e, bivê nevē ew bi hev ra girêdayî ne. Piştî ku em însan ev in, ne em dikarin hev bavêjin ne jî em dikarin li ber hev derkevin. Di destê me da ev tenê maye ku em li hev werin.

Sebebê destdirêjkirina min alî wergerandina Qur’ana Kerîm bi zimanê Kurdî (zaravayê kurmançî): Min dît ku ev kitaba muqeddes bi zêdetir ji sed zimanî hatiye wergerandin. Hem jî min dît ku xelkê Kurd hemen hemen ji tevekî misûlmana li pêştirîn di girêdana bi vê kitêbê va. Êdî min li ba xwe biryar da ku divê ev kitab bête wergerandin bi zimanê Kurdî jî û ji min pêve jî bûhûra min li tu kesekî ne bûhûrî.

Di sala 1978 da min dest pê kir, min nêzikê 17 cûzê wê wergerandibû ku 12 Eylûlê bi serda hat. Ji ber vê gotina Tirkî ku dibêjin: “Kambersîz düğün olmaz.” bivê nevē jibo vê cihekî veşartinê diviya. Min girt bir danî ba hinekî hevalên ku belkî li wan nede bayê wê govendê...

Di sala 1984 da hewrê 12 Eylûlê hinkî vekîşiya, rojê qiçê (hinek) xwe beş kir di nava pelekên sayiyê da, min xwest... Ji ber ku xebat û zorkêşiya wan têda tûnebû, ewan wî emanetî wenda kiribûn.... Û gelek nivîsiyên dî jî...

Ji ber ku salên min li pêş bûn, êdî çavên min ji umrê min nebirî ku ew dê têra wergerandina Qur’anê bi tevayî bike. Ji ber vî hawayî ez di rêça zanyariyê da li ser hinkî tiştên dî xebitîm. Lêbelê jibo ku navê wergerandina Qur’anê li pey min ketibû, êdî ji heval û nas û dostan kî min didît ji min dipirsîn, “Gelo ew tercema te çawa bû?”... Min bala xwe dayê ku ev îş li ser min hatiye barkirin, divê ez ji nû

ve dest bi vî îşî bikim, ez fikirîm min got: “Gelo ez ji kîja alî dest pê bikim?” Min biryar da ku ez di cuza dawî dest pê bikim, ji bo ku sûreyên wê hem pirtir têtin xwendin hem jî gelek sûreyên wê di jibera gelek însanên nexwendî da ne.

Eger mirin û nexweşiyeka bêkeys riya min nebirin, bi hinkî ez dê Sûreya Yasî-nê bi dawîya vê nivîsanê ve ek bikim, ez vî şertî datînim, lewra:

*Umrê me çend sal û meh û roj in*

*Ev xûn dimijîn hestî dikojin*

*Bêbext in ev te hew dî ku bêwext*

*Min avêtin çalekê bêrojin*

Ji ber ku tu bend û çare berê mirinê nagirin, divê em jî herwekî ku mirin di xew da ye, destên xwe li van rojên xwe yên hindik ragirin. Em dibînin ku însan, birayên xwe yên haywan hêştîye li çol û şîkêran, ew bûye mezinê vê dinyayê. Qî-ma wî bi vê mezinatiyê jî tenê nayê. Bi tenê ez dixwazim vî bibêjim: “Gelo ev însan çira li ser xwediyê vê hebûna bi aheng lihev nayê?

Dîsa em dibînin ku; însan gelek tişt pişkaftîye, bingeha wan dîtiye. Pîrr tişt jî hene ku gelek însanan bi qandî dîtina xwe nav li wan daniye. Lêbelê bingeha wan nedîtiye. Ji wan tiştan yek zeman e, yek mekan e, yek jî însan e. Herduyê pêşîn nakevin reqemê, jiber ku sifra wan nehatiye dîton û herdem hebûna wan nayê înkarkirin, lewra her yek ji wan pîvana wî madde ye, madde jî heye. Merhûm Melayê Cizîrî di Dîwana xwe da jibo zeman weha dibêje:

*Hal û musteqbel û madî di xwe da têkî yek in*

*Sûbhî mewcûd e bi aynê xwe di êvarê hudûs.*

Dînê asîmanî, ew dînê ku pêxemberekî wî heye, di destê wî da, ya çend rûpel yan jî kitabekî heye. Herwekî Zerduşt û Hanîf û Musawîtî û Îsawîtî û Îslamiyetê.

Serkaniya wî çî dibe bira bibe, em bala xwe didinê ku di her dînî da sê tene emir hene: Huqûq, axlaq û îbadet. Di dînê beşerî da îbadet temel e, huqûq û axlaq dawiyê hatine danîn. Di dînê asîmanî da, huqûq temel e, axlaq cilay e, deqor e, xeml e. Îbadet sened e, şahid e, tapu ye, belege ye. Em li vir mîsalekê bidin:

Em dibêjin ku Însanekî xwe girêdayî huqûq û axlaqê dînekî rava bide, dema ku îbadetê wî dînî dike, ew bi kirina wî îbadetî, ji xelqê û Xwedê ra dibêje ku: “Ez ji huqûq û exlaqê vî dînî ra hustûxwar im. Bila xwediyê dîn û hevalên min ji vê belgeyê şahidî bibînin...” Gelo em çend merivê bi vî hawayî nava pêgirtiyê kîja dînî da bibînin? Tê zanîn ku herçî ew kesê ku bibêje ez îbadetê vî dînî bi bawerî pêk tînim, divê ew kes tu carekî ji şopa huqûq û axlaqê wî dînî dernekeve, naxwe îbadetê wî dibe şahidê derewîn.

Dîn ji bo însan ihtiyacekî ye yan na?

Jibo ku însan di çêbûna xwe da xwediyê daxwazên bêdawî ye. Îrade û berxwe-dana wî jî pîrr hindik e, ew tim çavbirçiyê pêkhatina wan daxwazên xwe yên bê-dawî ye. Ji ber vî hawayî, dîn jibo her însanê normal ra ihtiyacekî mezin e. Lewra

dîn; bi însan cihê pêkhatina wan daxwazên wî yên bêdawî rava dide, însan bi wê hêviyê jî pirr ji hindik amoş dibe. Ev, bi mêzekirina li însan bi yekani ye.

Bi çavê komejîni jî dema ku em li dîn dinihêrin, em dibînin ku di şûna dê û bavikê da bi milyonan dê û bav, di şûna xweng û birayekî da bi milyonan xweng û birayan, di şûna çend keç û kuran da dîsa bi milyonan keç û kur ravay me dide. Kin û kurt ev e, ku yekîtiya xûnê pirr teng dimîne li ber yekîtiya dîni.

Em bala xwe didin dînan, em dibînin ku evan dîne asîmanî di piştî çûyina pêxemberê wan da, bi destê saltanat û zorbayan ji xêza xwe hatine derxistin, ku ji vî ra di literatûra dîn da dibêjin reform.

Dîne me îslamê jî di piştî wefata Hz. Muhammed bi zemanekî pirr hindik bi Areban hinkî meselyê wî yê mezin, di şûna reformê da deform hatine kirin. Wekî koletiyê, ku tu kes nikane îspat bike ku Hz. Muhammed yek însanekî hûr (dîne wî çî dibe bira bibe) gerandiye kole. Ji xwe têkoşin û cedela wî ya mezin û pêşin, bi helanîna koletiyê ra bûye. Wekî mesela Bilalê Habeşî. Jibo ku şerê navbera xwe kêr bikin, li Hz. Muhammed îftîrayekî jî kirine; Xwedê giravî Hz. Muhammed gotiye ku: “La rîqqe ala Arabiyyîn” yanî Arab nabe kole. Gelo bi serê kî dikeve ku ew Hz. Muhammedê ku di zemanê xwe yê bêkeys da koleyekî habeşî ji destê neyarê serdest derxîne û azad bike, ew rabe bibêje Arab nabin kole. ■

## Jibo balkêşiya xwedevanan

Piştî vê hejmarê (4), ji pozê qelesa  
**Mele Evidrehman**, emê  
“**Etîmolojiya Zimanê Kurdî**” biweşînin.

**WAR**

# Seydayê hêja Mela Ebdirehmanê Liceyî Beydabayê Kurdan bû

KALECIWAN

Herwekî xwendevanên birêz jî genc dizanin *Beydaba* filozofek kevin û kevnareyê Hindî ye. Belkî ji Hindê jî kevnartir e. Kitêba xwe ya ku tê da li ser çîrokên heywanan nivîsiye, bi zimanê Sansaqrîtî nivisandiyê. Di wê kûraniya dîrokê da medeniyetek, pêşveçûnek di Hindistanê da hebûye ku filozofên wek *Beydaba* derketine holê.

Seydayê rehmetî, Mela Ebdirehmanê Licê'yî, di salên 1960'an da vê kitêba filozofê hindî, ku navê vê kitêbê *Kelîle û Dîmne*'ye dizivîrîne zimanê Kurdî. Seyda vê kitêbê ji Erebi werdigerîne zimanê me. Xebata aboriya mamoste wê demê tamîrkirina radyoyan bû; ji ber vê yekê li Amedê ji Seydayê hêja ra digotin, "Mela Ebdirehmanê Radyocî". Seydayê dilovan ji alîkî ve bi keda destê xwe kom û kifletê xwe xwedî dikira, xwe ji kesî ra nizim nedikira; ji aliyek dî bi wî zimanê xwe yê zelal û delal, bi wî hûnerê xwe yê xurt û pak û bi wî dilê xwe yê şewat û paqij *Kelîle û Dîmne* dadigerande zimanê Kurdî. Xwe tû caran reqlam nedikira û sîrrên xwe nedida der. Ji ber vê heya ku 19'ê heyva yekemîn (Ocak) sala 1968'an, kêma kes dizanîn ku xebateke wî yê weha heye.

Di vê tarîxê da dewletê operasyonê anî ser TKDP (PDKT) ê; birek endam û berpirsyarên Partiya Demokrata Kurdistana Tirkîyê beredest kirin. Her wekî ku hûn dizanin sekreterê Partî Seîd Elçî û hevalên wî yê ku azayên Qoma Merkezî (Koma Navkom) bûn, 3 kes ji wan jî girtibûn. Mela Ebdirehman jî bi vê sebebê bi me ra hatibû girtin. Seyda endamê partiyê bû. Berpirsiyarê "Koma cî" ya bajarê Diyarbekir'ê bû. Di 1967'a da kete partiyê. Hêj li partî û partizantiyê germ nebûbû. Piştî girtina me, ne gazin û gilî ji me kir û ne hizbîtiyê kir. Ev girtin di riya netewî da bû, riya şerefê bû û serbilindî tê da didîta. Belê bayê wî yê hepsê ne bi ser rêka rêxistinê da bû. Ew li benda tiştên din bû. Di serê wî da tiştên din hebûn. Piştî ku ji hespê derket demek kete DDKO ya Amedê. Paşê vê derê jî terk kir. Bi guman min piştî hinga nekete tu partî û di TKDP'da wezîf nestand.



Hepixsana Diyarbekir ya Eskerî - 1972

Em 8 heyv bi hev ra girtî man. 70'ê roj li hepsa Amedê, yên din jî li girtîgeha Antalya. Wextê me bi xwendin, niqaşên siyasî, komelî, netewî û dînî derbaz dibû. Me pir feyde ji Seyda dît. Di warê felsefê, mentiqê û diro-

kê da pir zana bû. Bi urf û adetê va girêdayî bû. Ûrf û adet û folklor û ziman li balê pîroz bûn. Pêşvarû bû. Bîr û baweriya wî pir xurt bû. Moralê wî tucar xira nebû. Devken, xweşxêber û henekzan bû. Espirî û zixtên wî kes nedîşandin. Me tevan ji hev û jê hez dikirin. Kaniya moralê bû Ebdirehmanê gorbehişt.

Li serpêka girtinê da, em 5 roj û şev li MÎT'a Diyarbekirê man. Pirs û pirsiyariya me qediya, me anîne Emnîyetê, em şevê li Emnîyetê li cem hev man û dora rojê derketin mehkemê, hatin girtin û li Hepsa Amedê, qawîşên mehkûman belavbûn. Şens eserî, ez û rehmetî, ew şev ketin cem hev. Axa û axalerê vê qawîşê pir qedrê me girtin. Şiv û çay û qehwe dane me. Bi ber me ketin. Xweziya xwe bi me anîn. Girtina me di riya namûsê da, di riya şerefê da bû. Di gotin: "Xweziya me bi canê we ku hûn ne di riya qetil û qitûl û tiştên neqenc da hatine girtin. Em mehkûm in û hem jî ji kirinên xwe fihêt dikin."

Lê em girtî kî bûn? Ev pirs wê ji xwendevanan bê. Girtî evan kesan bûn: "Seîd Elçî, Emer Turhan, Şakir Epözdemir, Derwêş Akgul, Ebdirehman Uçaman, Şefîk Issi, Zibeyr Yıldırım, Nezîr Aydın, Şikrî Alpergin, M. Sîddîk Gül û Şemsi Usta; Şemsi Aridiciyê rehmetî. Seîd, Emer, Şefîq, Zibeyr, Şemsi û Ebdirehman çûne dilovaniya heq. Ciyê wana cinet e înaallah.

Ev 5 şev û rojên ku li MÎT'ê borîn; her hevaleyê behsa pirs û bersiwên ku di pirsariyê da (soruşturma) boribûn, qise dikirin. Çewa ku tê hişê min, ji seyda van pirsan kiribûn: Pirsê yekemîn Partî bû. Seyda vê qebûl nekiribû. Pirsêka dî ew bû ku ka bo çi seyda di mala xwe da bi Tirkî şexlandinê qedexeyê kiriye. Seyda vê qebûl kiribû û weha gotibû ji wan ra: "Milet bi zimanê xwe yê zikmakî dijîn. Jiyana miletan heq e. Heqê herkesî ye ku ziman û nixxên xwe yên netewî biparêzin. Ez qet tiştê nekîm, divê ku mala xwe, malbata xwe ji pişaftinê (asîmîle) biparêzim. Ma xisara vê kirina min heye?"

Karmendê MÎT'ê yek navsere û pisor bû. Di îfada de me hemiyan lê dîtîbû. Ew camêr ji Seyda dipirsê ka kî we asîmîle dike, Seyda bersiva wî dide û dibêje: "Ma hewceye ku hûn dipirsin, wekî ku ne hûn me dipişêfin, bo çi niha vê pirsê dikin? Bo çi vaye 40-50 sal e ku hûn me û zimanê me înkâr dikin?" Pisorê MÎT'ê mêze dike ku bi Seyda nikare; dipirse ka Kurdan di kûraniya dîrokê da kesî pişaftine an na. Mamoste weha dibêje: "Em miletek qedîm û kevnareyên Mezopotamî ne. Li vê deverê pir medeniyet û pêşveçûn çêbûne û pir gel û dewlet winda bûne. Kurd bi tenê li ser lingên xwe mane û jiyana xwe ajotîne anîne îro roj. Mîmkun e ku kurd dor û çiranên xwe pişaftîbin." Kêfa vî pisorê navsere xweş dibe û weha dibê: "Te rast go. Ezê pîrsek di ji te bikim, ku te vê pirsê zanî, ezê ilimdariya te qebûlîm. Gelo we kurdan, Tirk pişaftine an na? Seyda dibê: "Mîmkun e. Ji serê sedsala 10'an û pêva Tirk û Kurd di nav hev da mane. Tirka dewletên sedsale damezrandine û hiştine û çûne. Tirk bi piranî koçer in û çiya û zozanên me çêrandine. Em û Tirk heya îro jî hê bi hev ra nin. Me hinek malbat, belkî eşîrên Tirkan, dibe ku pişaftîbin. Lê ne qasê ku we kurd pişaftine. Me pişaftîbin jî ne bi zorê, belê pişaftina we bi hikmê kotekî ye.

Kitêba Filozofê Hindî û bi wan miswedeyên Seyda ku wergerandiye Kurdî bi Seyda re hatiye girtin; pisorê MÎT'ê jê dipirse, ka bo çi te ji nav hemî kitêban vê kitêba ku çîrokên heywanan dinivîsîne tercîh kir? Seyda dibê, "Ev çîrokên ku di vê kitêbê da hatine nivîsandin, pir li xweşê min hatin. Meriv ji van çîrokan dersê distîne, ev çîrok ders û hikmet in; ji alîkê va jî kitêbek pir kevnare ye, tu minasebeta vê bi siyasetê va nin e. Seyda bi vî awayî xwe ji pirs û pirsîyaran xelaskiribû.

Li ser vê kitêbê û wan bersivên wî yên di cî da, rehmetiyê Seîd Elçî pir kêfa xwe jêra anî û navê wî danî BEYDABA. "Seydayê Beydaba û Seyda Beydaba" dest pê kir û vî 8 heyvî ajot. Seyda ji vê yekê mehcûb dibû, ji Seîd ra digo heneka neke, ez li kû feylezofî li kû. Belê Seîd Elçî bi bawerî û îsrar weha digo: "Bi şeref tu ji feylezofê Hindî, Beydaba zanatir î. Ma di wê demê da dinya ev dinya îro bû. Di vî esrî da, ilimdarek mîna te ku difikirê, ji wan feylezofan çêtir dikarin kûr û dûr bibînin. Tu feylezof î. Tu Seyda Beydaba yî." Seyda li me mêze dikir; li Seîdê rehmetî dinêriya, serê xwe dihejand û digo: "Ma ezê ji te ra çi bêjim; serê te kulav e." Rehmetiyê Seîd dikeniya û dîsa dubare dikira: "Erê, Beydabayê Kurd, Seyda Beydaba." Me digo: "Seyda, ev êdî bû cil û kete mil. Ma emê bê feylezof bin? Kek Seîd vê yekê layiqê te nedîta; vî navî li te nedikira. Divê tu qebûl bikî." Dikenî û mêze dikira nava çavên me: "Kuro hûn jî dîn in. Ma we aqilê xwe xwariye? Ma hûn dizanin feylezof yanî çi?" Rehmetiyê Seîd, tiliya xwe hildida û digo: "Seyda, zanîn, zanyarî û ilimdariya Kurdan, hemî ji Medresê tê. Belku kêmasî têda hebin, li gor îroyîn nebin, cihanşimûl û esrî nebin; Lê mêze ke; ji sedsala 10'an û şûnda em ilimdar, nivîskar, şair, edîb, dîrokan mutesewif hûnermend û merivên bi nav û nîşan dibînin. Tû dikarî navê edîb û şairek ji min ra bêjî ku ne ehlê medresê bû? Hûn bo çi xwe biçûk dibînin." Ev gotebêj û şîrovekirin dom dikir û diçû.

Li hebsa Entelyê, caran em li ser pirsra Kurdan disekiniyan. Çare çi ye? Derman çi ye? Wê çawa be? Me çend fersend revandine? Hê fersend henin an na? Me van pirsan pir diêj dikirin, me serad û bêjîng dikir û hûr û kûr û dûr merheze dikirin, me tu rêkek ji rêka rêxistinek millî, cihanşimûl, bi rêkek aşî û demoqrat, bi sebir û sebat û bêhna fire pêva tişteki nedida ber xwe.

Seydayê Mela Ebdirehman xwe rast dikira, tiliya xwe ya şehdê dida eniya xwe û dişidanda, ji kûraniya dilê xwe weha digo: “Çi bibe bila be, bi çi kûl û halî be, bivê nevé, divê ku Kurd ji bona Şerê Korfezê hazir bin. Wê şerekî mezin li vê herêmê bi-qewime. Dewletên cînar, wek Îraq û Îran û ên din, an jî dewletên mezin wek Rûsya, Emerîqa û yên din; wê xwe li Korfezê bidin. Lewra ev herêm tev jî petrol e, dewlemend e; Inglîzan vê derê terkirin. Wê vê valeyiyê hinek dewletên dî tijî bikin û ev mudaxele wê bibi sebebê şerekî giran.” Erê, sal 1968 e. Ev gotin, gotinên Mela Ebdirehmanê Radyocî ne.

Sal di ser da derbas bûn. Bi tertîb û finazan rêxistina me PDKT'ê hat sabotekirin. Li ser navên me hinek ronakbîrên Kurdên mêrxas çûn Başûr, bûn xwedan çek û meqer, Seîd Elçî qetilkirin û li ser vê bûyera çepel hatin kuştin, rêxistin û xebatê li ber çavên me reş kirin. Kurd di salên 1971 û 1975'an sews bûn, di salên 75-76'an û vir da dengên texrîş xerîb derxistin. Em hin bûn hevalên Çînê, hin yê Enwer Xoce. Hin hevalbendê Brijejev û yên din bûn hevalên Stalîn, Troçkê, Lenîne mezin, Markîs û Perînçek û yên weha. Heytahotêk ket Kurdistanê; de babo werin vê dilanê. Vê çirokên nivîşên 58'an û 68'an; belkî yên 78'an jî baş dizanin. Ewên ku hêja jî di govendê da ne tu gotina min ji wan ra nîne, lewma ku hê germ in, govend giran e û mecal nedîtine li dorûberê xwe mêze kin. Belê evên ku govend berdane, ez bawer im ku giş bi xwe va hatine, dormedarê xwe dîtine, şaşıyên xwe nas kirine û dizanin ku poşmanî feyde nake.


Her wiha Şerê Korfezê, Şerê bi nav û deng û meşhûr hat di ser pehlewana, siyastzan û pêşkêşên me yên mêrxas da borî. Şerê Îran û Îraqê qediya, Îraq dest avête Kuweytê, Emerîqa li wê xist, şerê Îraqê kir; Îraq teslîm stand, serekeşîr û misteşarên Kurdistanê başûr bi îşaretek biçûk êrîş birin ser bajarên vê heremê û Kurdistan xistin bin destên xwe û Seddam li wan hate xezebê, Kurd reviyên. Kurd wek lehî ketin deşt û çiya û geliyan, bi piyên xwas ketin medya û televîzyonên alemê. Alema dinê kurdan dît, wan nas kirin, gunehê wan bi halê me hat, emerîqa rexnekirin û ev dewleta hakimê dinyayê ji şerma xwe hat telbê Kurdan. Kurdan bi ser hev va anî. Satatuyek ji wana ra da çekirin. Helbijartinek çêbû, Kurd bûn wek dewletek azad.

Di vê hengavê da riya min kete Diyarbekir. Ez çûm min Seyda li dikana wî ya ku radyo tamîr dikir, li dora Mizgefta Mezin bû, ziyaret kir. Min wî teqdîr kir. Min gelek wî qedirbilind kir. Min pesnê wî ji wî ra da. Min go: “Seyda ma ne heyf e ku tû heyata xwe di nava toza van radyoyên kerpixî derbaz bikî! Tê bîra te, te li hepsa Entelyê van tiştên dîgo?”

Wexta ku min gotinên wî yên hepsê xiste bîra wî, pir kêfxweş bû, kursiyê xwe anî nêzikê min. Qutiya xwe deranî cixarek pêça, pêxist, du-sê mij lê da û dîsa weka ku di hepsê da tiliya xwe bire eniya xwe, recifî û ji dil weha gote min: “Niha mêzeke, min li hepsê van tiştên ne ji kerametên digo. Ji xwe min sebebên ku wê şer derkeve vediki-ra. Ev sebeb ana jî hene û neqediyanê. Şerê Korfezê neqediyanê, netefiyayê. Hê pizo-tên agir di bin xweliya germ de tijî ne. Ew dewlemendî li ciyê xwe da disekinîn. Îran û Îraq heya westiyân, ji halê xwe ketin li hev xistin. Îraq wisa zanî ku meydan ma jê-ra, lê kengê dewletên mezin meydanê xalî dihêlin? Ez dibêm, dîsa jî divê Kurd ji bo-na şerê korfezê hazir bin.”

Min got: “Seyda, şerek an pêlek ji vê lehiya şer hat û derbaz bû. Me ji paş va lê mê-ze kir. Me xwe hazir nekîr û em niha jî ne hazir in. Gelo bi dîtina te, ji xwe va, jiber xwe va, ficwetên, an hezbelqeder, tiştêk ji me ra bi ser ketiya an na?” Seyda kenîya. Belkî Beydaba’yîya wî hate bîra wî. Go: “Erê Mela, mela, mêzeke... Pir tişt ji me ra bi ser ketine. Weka te go, ev tişt di dervê îrade û haziriya me da tecelî kir. Li Başûr, bi qî-ma te feyde nîşan da. Ew êdî dewlet in. Kes nikare wana ji vê niqte bîne jêr. Wê qe-deme qedeme azad bibin. Herçî em in, em Kurdên Bakur in, ji me ra hê pir divê. Be-lê divê em jî ji fersendan ra tim hazir bin.”

Ev xeberdan di neqeba min û Seydayê Ebdirehman da di sala 1991-92’yan da bo-rî. Seydayê hêja çû dilovaniya xwe ya heq, lê şîretên wî divê tim di guhên me da bin. Divê em ji dîrokê dersan bigirin. Nexwe wê tim fersend bîn wek pêlên avê biborin û emê piştî van fîrsetan li çokên xwe bidin. Weka ku *Cegerxwîn* dibê:



*Hate ber derî, min lê nenêrî  
Lê gava ew çû, min dil daye dû  
Min dil daye dû, me dil daye dû.*

Hebisxaneya Antalya- 1968  
Seydayê Ebdirehman yê dawî ye

## Ji pozê qelema Mele Evdirehman jiyana wî

**E**z Evdirrahman UÇAMAN. Li gora nifûsa rasmî, ez di sala 1934'an da, li wîlayeta Diyarbekir, li qeza Licê, taxa Qer Hesen hatime dinyayê. Malbata me jê ra tête gotin "Elî Romî". Li gora ku me ji pêşiyên xwe bihistiye, dibêjin yek ji bapîrên me yê kevin, dema ku ji eskeriyê hatiye, bi haway eskerê Romayê xwe wergirtiye û girêdaye, jibo wî hawayî jê ra hatiye gotin "Eliyê Romî". Elî bûye Romî, ji ber ku cîranê Kurdistanê ewê Roava, Împaratoriya Romayê bûye, gelekî caran jî leşkerê Romayê bi nava Kurdistanê da hatine, bi cî bûne, talanan birin, şer kirine... Êdî di Kurdistanê da navê insanê Roava bûye, Rom û ev nav di literatûra Kurdî da bi cî bûye. Hêjî di kelimê şeran da ji Tirkên ra Romî tête gotin.

Mala me "Malmela" ye, yanî çend bavê ku em navê wan ji mezinên xwe hîn bûne, tev jî melayên mezin û hêja bûne. Ji wan kitêbên ku li pey wan ji me ra mane jî, tête zanîn ew di zemanê xwe da melayê hêja bûne. Ji gedeyê bavê kalê me, Mela Evdiletîf filitiye, ewanê din tev di şerê dewletan da şehîd ketine.

**DÊ Û BAVÊ MIN,**

**ZAROKIYA MIN Û XWIŞK Û BIRAYÊN MIN**

Diya min keça Mela Rasûlê Xanikî ye (gundekî Hezroyê). Diya diya min (Rabîe), xwişkava bavê bavê min e. Diya min navê wê Zelîxe bû. Jineka pir zekî bû, bi aqil bû. ruhekî wê yê filozofî hebû. Tev li van meziyetên xwe yên hêja jî di xuyê wê da sertitî hebû. Belkî jî ew sertiya wê, ji durustiya wê dihat. Yek birakî wê hebû (xalê min), ew ji diya min çend qat serttir bû, durûst bû û hew...

Ez gelek piçûk bûm. Mala me ji Licê anîn Diyarbekirê. Ji zarokê lawîn, ez mezin bûm. Birayê min A. Melik ku ji min 21 meh piçûktir bû; A. Selam jî hêj du salî bû. Xwişkava min Nazîme du sal ji min mezintir bû. Me bi tirkî nizanîbûn. Diya min bi tirkî dizanibû. Ewê ji me ra digot: "Eger yekî bi we ra xeber da, hûn bibêjin, 'Ben Türkçe bilmiyorum.'" Em li Çixûr Mehelyê, di xaniyekî da bi cî bûn. Du diranê min ê şîr, ê jêrnê pêşîn ku ketibûn lê ewane ku di ciyê wan da derketibûn, hêj baş şûna xwe tijî nekiribûn. Hêj roja sisêyê hatina mala me ye, ez bi zarokên cîranan ra derketim kûçê, min xwest ez bi serê xwe herim çarşiyê... Mala bi alî çar-

şiyê da xaniyekî mezin hebû, eskerakî bi tifing li ber derê wî dima. Min wî eskerî û ciyê wî baş di çavê xwe da bûhart, da ku ez wenda nebim. Ez di wê kûçeyê da hatim, pir, hindik, ez derketim çarşiyê (nava derê Mêrdînê û Derê Çiya). Jibo ku min serê kûça ku ez têde ketime çarşiyê nîşan nekiribû, piştî ku ez di çarşiyê da hinkî çûm û hatim, min wê kûça ku diçe ber mala me şaş kir. ez di wê cahdê da diçim wî serî û tême vî serî; newêrame ji wê cahdê jî dûr bikevim ez... Dereng bû, êvar hindik ma, qey ji dikançyan yek, ez bala wî dikişînim, hat ber min, bi Tirkî xeber da, min got: "Ben Türkçe bilmiyorum". Kurmancî xebere dan jibo ku sûc bû, herkes newêra bû xeberde... Mêrik yekî peyda kir, bi Kurmancî ji min pirsî, min got; mala me di kûçekî da bû, lê nêzikî mala me eskerakî bi tifing hebû... Mêrik min anî serê kûçekî û got, "Di vê kûçê da rast hera, netirse". Ez hatim malê. Çend roj paşê bavê min mala me ji Çixûr Meheleyê bire Tirba Sipî, heta mehekî em li wê man. Bavê min mala me anî ber Qurşun Camiyê (xaniyê Evdirazaqê Macir). Oda pir mezin bû, germ nedibû. Bavê min di nava navderê û odê da oberiyekî di şûna dîwar da vegirtibû... Ew zivistan gelek sar bû. Bû bihar û bavê min çêleka me ji gund anî... Êdî şîrê me hebû. Xela rabû (Nanê Qert). Sala pêşîn jibo ku qûtê me hebû, em zarûk nizanibûn, bi tenê ev têtê bîra min ku diya min bi tasan bûl-xur, simêdî (teftî), ard dida hinkî cîranan, digot, "qûtê wan nemaye".

Sala dû wî -bavê min li Licê dima- zivistanê diya min ji me ra got: "Lawo, qûtê me jî nema!" Jibo ku firin bi pera nan bide, divê qertê nan hebe. Jibo ku qertê nan jî ji ciyê wî bête standin, divê cûzdanê nifûsê hebe. Em jî di nifûsa Licê da qeyd kirine, wê gavê cûzdanê gedan jî divê rasmê wan lê bihata xistin. Ez di tayê da bûm. Diya min me bir çarşiyê, rasmê me da kişandin. Nifûs memûriyê Diyarbekirê -Ez navê wî nabêjim- serê her cûzdanekî pênc quruş distand. Em pênc kes bûn di malê da, qey wê rojê şîrê çêleka me rijiyabû, yan jî nehatibû firotin, bîst quruşê me hebû, pênc quruş kêmbû; cûzdana me neda, ez û diya xwe em ji dayrê zivirîn hatin malê, diya min pênc quruş ji jinkeka cîran deyn kir. Roja dî em çûn dayrê me cûzdana xwe anî. Qert dane me. Herba Cîhanê a Duwem bû, ew ne bes bû baran jî nedibariya. Li Ewropayê Yahûdî di firinan da dihatin şewitandin. Bi propaxandê Elman û Eraban dihat gotin ku, "Yahûdiyan hewrê asîman girê daye, ji ber wî baran nabara." Taxa Yahûdiyan nêzikî taxa me bû. Em zarok bûbûn neyarê Yahûdiyan. Me digot, "Çira hewr girêdane? Em birçî man." Ê ku dizaniyan jî qey newêribûn bibêjin, "Evan gotinan dirawê Elman û Eraban in." Jibo ku Yahûdiyan ji dinyayê hilînin, van nebûyan bi ser wan da diraşînin ku dijminatîya Yahûdiyan bi serê xelkê bixînin... Ev propoxande di ruhê me zarokan da kar kiribû hem jî ji me ra dihatin gotin ku "yahûdî zarokên musulmanan dibin, di dergûşa şûjînan da dihejînin, teştê di binê dergûşê da datînin. Jibo ku xwîna zarokan tê da bicive, lewra ew mayanê xwe bi wê xwînê hevîr dikin." Em zarok bûn, me jî bawer dikir. Jibo vî hawayî me gelek li wan rebenan zilm dikir. Eger diya min bi-

bîhsta, bi me ra dixeyidî û digot, “Evan gotinên weha, dirawên Erab û Elmanan in, Yahûdî esîr in, guneh in, têkilê wan nebin...” Di wî nêzikî da diya min xişrê xwe firot, xirbekî kirî. Jibo ku em ji kirêciyê bifilitin, me di wê xirbê da du ode ava kir. Payîz zû hat. Baranê bi ser me da girt. Du malê cîranê me yê yahûdî bûn. Ez bêkeys nexweş ketim. Cîranê me yê yahûdî yek ji wan navê wî Rindo bû. Du pêçî riyê wî yê spî hebû. Jina wî her roj dihat mala me, ji diya min dipirsî, digot: “Cîran gelo gede çawa ye? Parî ber bi xêr bûye yan na?” Ew mala di ji navê mêrik Mîro bû, navê jina wî jî Azê bû. Çêleka wan hebû, şîr difirot! Ew jinik rojê çend car dihat û ji diya min pîrsa halê min dikir. Ez gedekî neh yan jî deh salî bûm. Ez gelek bi ber xwe diketim. Lewra di berya ku ez nexweş bikevim, min jî gelek kevir di Yahûdiyan werkiribûn. Min camê mala Rindo şikandibû. Piştî ku ez ji nexweşiyê rabûm, min birayê xwe digirt ez diçûm mala Mîro û em bi zarokên wan ra dileyztin. Lê dîsa jî serê min ji ber wan kevirên min xwar bû. Ez îro di van bîranînanê xwe da, ji wan cîranên me yê Yahûdî uzir dixwazim. Lewra ji zarokiyê pê ve tu tiştekî ku ez pê xudan haq derkevim tûneye, di kevir werkirina li wan.

Karên ku min di zarokiya xwe da kiriye:

1. Heywanê malê çêrandin.
2. Qûm kişandin (Bi keran ji ber Dîclê).
3. Şîrê xaw firotin.
4. Şagirtiya terzî (13 meh).
5. Şagirtiya xerat (Çend roj)...

Jibo ku pêşiyên me “bav û bapîr, ji alî dê û bavê da, hem ji pismam û xalan da”, malmela bûn. Melatî hem bi rûmet bû hem jî dezgehê xwedibûna bê zorkeşî bû, tiştê ku di mekteban da dihatin dersdan, bi piranî ji medrasê ra ters dihat, piştî ku min *Qur'an* û *Nûbihara Seydayê Xanî* xwend min ji *Xayetê* dest pê kir (Zivistan 1943-44, Apê min, pismamê bavê min Licê) bihara 44'an ez hatim Diyarbekirê... Çûm deştê li ciyekî ku lê bixwînim geriyam, min li gundê Îsaqan, li ba Seydayê Mela Evdîlqadir ciyekî dît. Ez zivirîm hatim, Diyarbekir, jibo ku ez kincê xwe û nivînê xwe bibim. Di vê zivartinê da tiştekî bê hawa di serê min da derbaz bû. Ez ji Îsaqan hatim Derwêş Hesenan jibo ku ez bême serê rêya karwanê Liciyan. Bi wan ra werim Diyarbekirê. Ez hatim ser cehda karwanan, ez rastê karwanekî nehatim. Ez geham ber çemê ambarê av rabûbû. Ez newêrabûm li avê dim. Min digot ewê av min bibê, ji wî bûhûrî berjêrtir (2 km) pirak hebû, jibo ku li ber wê pirê gundek hebû, têda macirê Bulxar rûdiniştin, ji mera hatibû gotin ku “macirê Bulxar yekî Kurd bi tenê biqefilin îşê nebûyî tînin serê wî”, ji ber vî ez newêrabûm herim wê pirê. Ez li kenarê çem li ser tûmpûkekî rûniştim. Belkî karwanekî wera... Min hew dît ku xortekî ji aliyê rêya Licê da hat (30 salî bû) “Xwarzê, xêr e!” Min got, “av rabûye hem jî sar e, ez newêrame lêdim...” Got: “Na xwarzê, av hindik e, em derbaz bibin li wî ceberî emê agir vêxin xem neke. Em derbasbûn,

me cilê xwe wergirt.” Wê gavê jî got, “Xwarzê rê dûr e, wext teng e. Em bi agir dandanê ve bilî bibin, emê derang bimînin. Em hinkî bimeşin emê germ bibin.” Min got: “Tu zanî”. Li wê rasta piştâ gundê Yabacıyê. Min heta qeytanê sola xwe girê da, min li pêşiya xwe nihêrt, kes tûne, ez zîvirîm, min çavê xwe li çarmendorê xwe gerand, min wî nedît. Ez hê jî nizanim bipişkêfim. Hatim ber çemê Dîcleyê, min deh quruş da ez ketim qeyikê derbasê alî bajêr bûm, êdî êvar nêzik bû.

Roja dî ez hatim xanê ku karwanê deştiyan li wan dimînin, min pîrsa wanê ku bi alî Îsaqan da herin dîkir, sofikî got: “Rêya min di nava gundê Îsaqan da diçe.” Min got: “Xalo, tu lihêfa min bavêjî ser piştâ bergirê xwe heta Îsaqan?” Got, “Tu feqî yî?” Min got, “Belê.” Got, “Ser çavê min û bavê min!” Paşê ez hîn bûm ku ew Hozan, navê wî “Hiseynê Silêman e”. Ew siwar bû, min jî li pey xwe siwar kir. Ber bi êvarê em gehan Îsaqan. Ew derbas bû û çû Qazuxan. Qaşu Qazuxan. Paşê min wî merivî nas kir, ew hozanekî hêja bûye, hem jî qomedyenekî bûye, bexçewan û cenanekî gelek mahir bûye.

Min bêqanûniyê û durûtiyê jî di medraseyê da dît. Berya ku ez hêj neçûbûm medrasê min vî bawer dîkir ku însanê xwenda bi her hawayî xwe bi qanûnê dîn dinyayê ve girêdayî ye, na însan ne ew bûn ku min wan nav dîkir, însan tiştêkî durû bûn. Seydayê min du jinê wî hebûn, yek ji wan bi girêdan û wergitin û xwedîkirina xwe, ne kêmi wan jinên delaliyên ku di serayê malemezinan da, ne ewa dî (jina mezin) tevli ku gedeyê wê hebû, ji a piçûk jî gede tune bû, ew bi gedeyê xwe ve, di mala Seyda da xizmetçiyê nanoziko bûn.

Baweriya zarokiyê ji sade diliyê û dil paqijiyê gelek car di însan da bêhêvîti û bêbawerî çêdike. Min ji dîrsa kîtabê û seydayan zêdetir, ji dîtin û tevgerên wan ders digirt. Gelo ev seydayê min, mezinatî û piçûkatiyê bi çi dipêve? Rûmeta zengîn û ciwêlekan bi çi ji hev diqetîne? Ez wê biharê li wî gundî mam, min ji kîtaba Enwarê qîma îbadetan xwend, tiştê ku min dixwend jî, ez dikarîbûm li pey xwe ders bidim. Lewra bêfamkirin ez di ser kelîmekê ra derbas nedibûm. Berya her tiştî min bi seydayê xwe da zanîn ku ez bêfamkirin û bêserî ketin derbaz nabim. Di vê tiştê ku ez bixwînim ji hinkî dî ra bibêjim. Lewra bi dîtina min amac ji xwendinê û hînkirinê ne hînbûn tenê ye, amac dinê hînkirin be. Em çend feqî civiyabûn li wî gundî, ber bi havînê hemû belav bûn, ez û Feqî Qasimê Meyrê (ji gundê Derwêş Hesenan bû) em bi tenê man. Hevaliya wî xweş bû. Zekaya wî gelek qut bû. Tayîna min mala Meryemê dida. Cilê min jî wê malê dişuşt. Axayê wî gundî navê wî Evdilkerîm Keya bû, reng feqî bû. Serê payiza 1944’an ez çûm gundê Tepecikê. Min li ba xocayê gund ciyê xwe çêkir. Navê wî Mela Mihemed bû. Însanekî sert bû. Cesur bû. Ji tu kesekî ra kêmani nedikişand. Salê wî jî li dora heftêyî bû. Feqîkî wî hebû, navê wî Sîrac bû. Ew ji min jî hurtir bû. Ew jî ne zekî bû. Ez 17 roj li wî gundî mam. Min çend ders ji Enwarê li wêderê jî xwend, ez hatim malê. Bavê min got, “min ciyê te li Mermerê da (nahiye) li ba Mela Evdilselam çêki-

riye, tu jî dev ji xwendina fiqhê berde, dest bi ilmê alet, sarf û nahwê bike.” Meha duduyan a payîzê hêj neqediya bû. Ez çûm gundê Mermerê (Firê). Min û Feqî Mihemedê Mistanî “Mehmet Altındağ” me dest bi xwendina serfa zimanê Erabî kir. Navê wê kitêbê “Bîna” ye. Me wê kitêbê qedand. Me dest bi kitêba duwê kir. Navê wê “Izzî” ye. Ew zivistan gelek nerm bû. Di gunde da hevrêzê nahiyî hebû. Cendirme hebûn. Lê çavê xwe ji xwendina medrasê ra digirtin. Cumhûriyet li Enqerayê hatibû îlan kirin. Lê qanûnê cumhûriyetê di Kurdistanê da nehatibû bi cî kirin. Bi tenê qanûnê eskerî û papur, pêç û qamçûr bê kêmanî, belkî zêdetir bi bargiranî nîrê zulmê li ser ûstuyê Kurdistanê dihanî. Di binê siya navê dîn da li gelekî gund û bajarê Kurdistanê ew ahenga kevin yanî ahenga medrasê bi qanûnê nû (Tewhîdê Tedrîsat) nehatibû terk kirin. Ew zivistana (1944-45) yek ji wan salê zêde sar û berf û baran û tîpî bû. Ez gede bûm. Biraziyekî seydayê min hebû. Salê wî nêzikê sihî bû. Ji apê xwe pişt digirt. Bi çavsorî li feqiyan serdestî dikir... Rojekî wî min dahf da ez bi dev û rû bi ser cerê da şuş bûm. Cer şikiya. Ez gelek êşam. Piştî ku min hêz da xwe, ez rabûm “gerake min ûsa negota” min di nava hevalan da jê ra got, “tû bi kertolê hicrê xwedî dibî, ma ez tayê te me tu vê zorbetiyê li min dikî!” Ev gotina min bi devê hinkî hevalan dighîje guhê seyda. Seydayê me jî gelek şevan şîva xwe ji malê dida hanîn. Wekî feqîkî bi me ra rûdinişt. Şîv dixwar. Êvarê em li ser şîvê ne. Seydayê min got: “Evdîrahman!” Min got: “Libê” “Te ji biraziyê min ra gotiye, tu bi kertolê hicrê xwedî dibî.. Min ciyê te xirab kir...” Min got: “Seyda, biraziyê te ji nîşka da dahf li min da û ez bi ser cêr da ketim. Cêr şikiya. Ez şil bûm, ez gelek êşam. Hin ciyê min şimitîn ji hêrsan ew gotin ji devê min derket, gerak min negotana...” Seydayê min got: “Ez dersa te nadim...”

Ez fikirîm. Zivistan gelek dijwar û sert e. Bi kerîya lawûr û cenawur ji şafirê çemê Ambarê dajon nava gundan; bê çek tu kesekî bi tenê nikara ji gundekî derkeve, seydayê min ciyê min xirab kiriye. Fam nake yan jî ji hêrsan bîr pê nabe ku ev gede here û cenawur wî bixwin... Gelo sûcê wî çi ye? Min jî dizanibûm ku ez dused mitro ji gund dûr herim, êdî tu kesekî nikara min ji devê lawuran derxîne... Gelo ez bi çi li vêderê biminim, heta ku parî rê vebibin. Tirsra wan cenawuran rabe, ez gelek fikirîm. Hinekî heval jî jibo ku ez di famkirina ders û xwendinê da ji wan pêştir im, ew dixwazin ez zû herim. Ji ber pozê wan derkevim. Ez viya jî dibîminim, piştî vê bêhvîtiyê, ev hate xeyala min ku, seydayê min eskerî nekiriye, di wî gundî da jî qarakola cendirman û nahîye mûdurî hene, min ji wan hevalî ku ew hergav dibêjin, “Seyda dibêje min ciyê wî xira kiriye bila ji gund derkeve.” Min jî ji wan hevalan ra got: “Hûn herin ji Seyda ra bibêjin ku bila ew jî çentekê xwe yê eskerîyê bavêje piştî xwe, ez û ew em bi hev ra herin bajêr”. Piştî vê gotinê deng ji wan û ji seyda biriya.

Bi vî hawayî ez li wê derê mam. Rê vebûn. Tirsra cenaweran nema, kendal jêrda ji berjêr şemirîn, çavî derbûn, dara kaniyan û kenarê newalan bi hilma avê zer

bûn. Min destûr ji seydayê xwe xwest: "Ez hêjî şerm dikim û ber xwe dikevim ku min ji hevalan ra got, "Bila Seydayê min jî çenta xwe hazir bike" Hem jî dema ku ez çûm, min ji wî destûr xwest. Lewra ku bîra min da bû jî dîsa jî min ji Seydayê xwe uzr nexwest û ev jî ji giraniya kîna min û zarokiya min bû, lewra divê ku Seydayê min di wê bêkeysîyê da pir li ser çûyina min nesekîniya. Ez hatim Elî Bardaxan (4 km. li başûrê Mermerê ye). Melayê wî gundî seydayê Mela Kamil bû. Min ciyê xwe li ba wî çê kir. Jibo ku dostaniya wî û kalê min hebûye, wî ji min ra digot: "Birazî, min bihistibû ku tu û seydayê xwe bi hev ketibûn. Ez dikaribûm biraziyê xwe ji wê derê bînim, lê min te nehanî jibo ku ez biraziyê xwe fam bikim, hela çiças di ber xwe dide." Min got: "Ez biraziyê te me, ez zû bi zû ûstuyê xwe danayînim..." Ez dozde ro li wî gundî mam, di nava medrasê da gerr hebû ez jî gero bûm. Seydayê Mela Kamil û jina xwe dihatin Diyarbekir. Min got: "Ez jî bi we ra tîm bajêr." Seyda û jina xwe her yek li hespekî suwar in.

Hevalekî dî ji heye ew jî tî Qadiyan (mala wan li wî gundî ye). Heval bi hefsarê hespê Seyda girt, hefsarê hespa jina wî jî min rahiştê. Em gihan ser cehda karwanan (ji gundî kilometrayekî ye). Min hefsarê hespê da destê jina Seyda û min got: "Tu xwe û hespa xwe îdara bike, ev rê dîr û dirêj e, çamûr û av û delav e..." seydayê min got: "Birazî, te çira hefsarê hespê da destê xanimê?" Min got, "seyda, ji wê derê heta bajêr (Diyarbekir), 5 saet dajo, ma destê xanimê neşikiyaye, bila ew bi hefsarê hespa xwe bigira..." Seydayê min got, "Tu pirr mizawir î, Ez di kendal û beyaran da dihatim. Hevalê min jibo ku hefsarê hespa Seyda ji destê xwe berne-da, ew di nava cahda Karwanan da heta guzekan di çamûrê da diçû xwarê...

(Seydayê Mela Evdirahman, xwejinênîgariya (otobiyografiya) xwe heta li virnivîsiye...)

## KURTEJIYANA SIYASÎ YA SEYDAYÊ EVDIREHMAN

Sal 1930 bû. Zulm û zordariyek bêhempa û nedîtî li ser axa welatê me berde-wam dikir. Stêrkên (istêrkên) gelek azadîxwazan qelişibûn, ewrên reş û tarî li ser welatê wan digeriyan. Rindî û xerabî, ronahî û tarîti rabarê hev bûn. Tarîtiyê dixwest serdestê ronahî be, wî vemirîne. Tarîti û xerabiyê navê xwe danîbê Ehrîmen. Qencî û rohiyê jî xwe bi navê Hûrmiz didan nasandinê. Ehrîmen û alîgirên wî her û her êriş dibir li ser Hûrmiz û alîgirên wî. Bi vê yekê dixwestin wan bi xwe ve girêdin. Lewra, Hûrmiz û alîgirên wî dixwestin pêlên ronahiyê li welatê xwe belav bikin û azadiyê bînin ser axa xwe, xwe ji nepakî, xerabî, nerindî û tarîtiyê xelas bikin. Alîkarên Hûrmiz yên wekî Elîşêr, Şêx Seid, ...û ed. Serî hildabûn, lêbelê tîkçûbû. Dijberî û tîkoşîna qencî û xerabiyê, beredewamî dixwest. Evcar pêlên ronahiya agir li ser çiyakî bi heybet û mezin diçûrîsiya û belav dibû. Belê ew çiyayê xêrxwaz, Agirî bû.

Di wê pêvajokê da gelek gund, qeze, cî û war hatibûn rijandin û kavilkirin. Alîgirên Ehrîmen, serdestî ji ê Hûrmiz girtibûn. Belê, tam di wê demê da li bakurê rojheleta Diyarbekirê, di qontara çiyê da qezekî piçûk hebû ku rûniştevanên wî alîkariya Hûrmiz dikirin û navê wî jî Licê bû. Belê, Seydayê me jî di sala 1934'an da li qeza Licê û di taxa Qer Hesên da ji dayik bûye.

Wê demê di Licê da tû avayiyekî Cumhûriyetê tûnebû. Bi gotina Tahsîn Ekinçî, berpirsyarê Cumhûriyetê di qonaxa Mehmed Begê da diman. Wekî gelek ciyan di Licê da jî, jibo perwerdekirina zarokan Hicre û medrese hebûn. Seyda Evidrehman jî di nav wan şertan da û cîkî wesa da mezin bû. Ew ji malekî xwenda tete. Bi gotina wî, ew ji malekî "Malmele" ye. Bi gotina Tahsîn Ekinçî, diya Seyda Evidrehman jî xwenda bû û di mal da dersê Qur'anê dida zarokan. Belê, Seydayê me di malek wesa da bingeha zanyariya xwe datîne û mîraza xwe ya pêşî digre. Piştî wî jî xwendina xwe berdewam dike, heta ku îcazeta meletiyê digre. Demekî pîrr kurt meletiyê dike û pişt ra bi dilê xwe dev ji vê karê berdide.

Di sala 1955'an da dema ku li gundan meletî dike, di nava gel de li gor şert û mecalên xwe û rewşa wê demê, li ser bingeha nasandina nasnameya neteweyî dixebite. Ji ber vê yekî jî bi egera ku "Propaganda Kurdçîtiyê" dike, tete gilîkirin û jî aliyê hêzên dewletê ve tete binçavkîrin. Di wê demê da bi rêya qaçaxçiyên bi hin Kurdên binxetê yê wêk Cîgerxwîn ra tîkilî girê dide, nameyan dişîne û werdigire.



Hepixana Diyarbekir ya Eserî - 1972  
Seydayê Evidrehman di rêzeya serpiyan milê çep yê serî da ye.



Hebixana Diyarbekir ya Eskerî - 1972

Seydayê Evdîrehman di rêzeya serpiyan milê çep yê serî da ye.

Di sala 1958'an da, vegera Mistefa Berzanî ji Yekitiya Sovyetan, li bakurê welêt jî tesîrek mezin dîke û bizavên neteweparêz û şoreşgerên Kurd hîn bêtir diherikîne û dilezîne. Di vê pêvajokê da, dewletên dagirker jî li ser neteweparêz û xwendekarên kurd zulm û zordariyek datînin; li bakur bûyera binçavkirina 1959'an (bûyera 49'an) û li binê xetê (Sûriyê) jî ji alî dewletê ve binçavkirina 200 kesan, jî ber vê yekê ye. Di wan deman da Seyda jî li Diyarbekirê bi cî dibê û bi kesên ku doza neteweparêziyê dikin ra têkiliyê xwe pêşta dibê û êdî bi awayek rêxistinî dest bi xebatê dîke. Ev xebata wan, di sala 1961'an da bi destpêkirina şoreşa Başurê Kurdistanê, werdigre û êdî wekî şaxek PDK-I'ê di bin kirasekî siyasî da dewam dîke. Wê demê Seyda ji aliyekî ve karê siyasî yê veşartî û ji aliyê dî ve jî di nava çalêkî û pirotestayên aşkera da cih werdigre.

Seydayê Evdîrehman "Di sala 1967'an da kete partiye (PDK-I)". Ew hîn bi parti û partîzaniyê germ nebûbû, bi tevî hin hevalên xwe bi operasyonêk têne binçavkirinî û girtin. Sedemê vê girtina wan ev bû: Di "Muş Otêlî" da li ser Şefîqê Haniyatê (Şefîk Issî) (Ku Şefîk di wê otêlê da katib bû) nizamname, program û mora Partiyê tete girtin. Girtina Seydayê Evdîrehman bi vê yekê ve girêdayî ye. Di mahkemê de parastina xwe, li ser bingeha parastina hebûn û mafên Kurdan amade dîke.

Di sala 1969'an da cezayê wî û hevalên wî xilas dibê û ji hepîsxaneyê dertên. Seydayê me disa jî têkoşîna xwe didomîne û di damezirandin û rêvebirina beşa Diyarbekir ya DDKO'yê cih werdigre.

Di sala 1971'an da esker dest datînin li ser rêvebiriyê û îdareya awarte îlan dîke. Ew û hevalên wî wêca ji ber doza DDKO'yê têne girtin û mahkum dibin. Di sala 1974'an da bi "Efoya giştî" têne berdan. Piştî vê demê, herçend ku heta mirina

xwe li ser nêrînên xwe yên siyasî dimîne jî, bi awakî bizavî (aktîvî) di nava siyasî-  
tê da cî nagire. Piştî 1974'an, giraniya xwe dide li ser babetên çandî û bêtir jî li ser  
etîmolojiya zimanê Kurdî lêkolîn dike. Bi tevî vê yekê di nav gel da propaganda  
kurdperwerî û neteweparêziyê dike.

## EM SEYDAYÊ EVDIREHMAN ÇAWA NAS DIKIN?

Belê, bi rastî jî ew merivekî zanyar bû. Bi tevî vê yekê, ew di babeta ziman û dî-  
roka Kurdî da jî pîspor bû. Ew pîr û zanyarê me bû û wan taybetan jî di xwe da  
dipa. Di nava civata Kurdan da însanên wekê wî gelek hindik in. Lewra çavkani-  
ya zanyariya wî, ji malbata wî dihat. Bav û kalên wî xwedî medresê bûn û her yek  
ji wan zanyarêkî bû. Seydayê me, ji vê rewşa hanê îstifade kir û hîn zêdetir pêste-  
çûyin ji faaliyeta xwe ra kire amac û vê yekê jî pêkanî.

Seydayê Evdirehman, ji serî ve di nava xebata WAR'ê de cîyê xwe girt û nêzî-  
kê salekî ye ku endamê lijna nivîsaran yê kovara WAR bû. Ew hîn nû li vê xebatê  
germ bûbû, ku bûyerekî (qezekî) bêtalîh emrê wî qût kir û me jî bê Seyda hişt. Em  
bi navê Kovara WAR, bêtir dixwazin nêrîna Seyda ya li ser însan û civatê diyar bi-  
kin. Li gor Seyda, bingeh û zemîna hemû tiştî însan e, hemû tişt berhemê faaliye-  
ta însan e, ji dervayê faaliyet û têkiliya însan tû berhemekî çandî tune. Ji ber vê ye-  
kê çand, berhemê faaliyet û têkiliya însana ye û bi wan pêşta diçe, dibe hêzekî  
maddî û însanan dişekilîne.

Kîjan însan? Pîrsa wî ji xwe re dikir. Însan bi serê xwe hebûnek ferdî ye gelo?  
Yan jî bi kanunên xwezayê sinorkirî ye û hebûnek xwezayî ye gelo?

Seydayê me van herdu bersivan jî rast nedidît. Li gor wî însan bi naveroka xwe  
ne ferdî û ne jî xwezayî ye. Ew berhemê têkiliya navbera însana ye, yanî bi nave-  
roka xwe hebûnekî komjînî ye. Ew komejînên ku li ser cografyayê belîkirî da di-  
jîn, di nava kûrayiya dîrokê da çanda xwe diafirînin. Bi vê manê, wî însanan he-  
bûnekî çandî didît.

Dema ku çanda civatan (komjîn) çêdibe, bi civatên dî ra jî têkiliya wan dibe û  
bi beramberî tesîra wan li ser hev dibe. Di nava zemanê da çêkirina çand û band-  
ûra li ser faaliyetên wan, amaca wan e. Di nava civatê da însan jibo ku amacê  
wan cihê cihê ne, lihev dikevin û li ser vê zemînê civat dişekile û bi civatên dî ra  
jî li ser vê bingehê têkilî girê dide. Belê, tê zanîn ku Seydayê me dîrok û faaliyeta  
însan, berhemê faaliyeta bi amac didît. bi vê yekê ve girêdayî, xelasiya neteweyên  
bindest jî, bi amaca wan ya xelasbûnê ve girê dida. Li gor Seyda, însan û civatên  
bêamac wekî laşekî bêserî ye.

## BERHEMÊN WÎ

Piştî vê yekê, em dixwazin li ser xebatên wî yên çandî jî çend gotina bêjin:

Xebatên wî yên wek kitêb *Ferhenga Kurmancî-Hewramî-Dimilî-Senendajî* (Ji aliyê wî û Seîd VERROJ ve hatiye amadekirin ku di her hejmara Kovara WAR'ê da tête weşandin), xebata wî ya *Etîmolojiya Zimanê Kurdî* di destê me da ye, em dê her hejmara WAR'ê da qisim qisim biweşînin. Ji xeynê vana, 26 Sureyê Qur'anê wergerandîye bi zimanê Kurdî û hin nivîsarên wî yên di hene liser edebiyata Kurdî. Eger ew bextreşî li ser Seydayê me da nehata, wî gelek tiş dabû ber xwe ku dê li ser wan binivîsanda.

Belê, Seydayê EVDIREHMAN, merivekî ezîz û hêja, kurdperwerkî bi bîr û bawer, zanyarekî gelemperî û bi taybetî jî zimanzanekî pispors û endamê lijna nivîsaran yê Kovara WAR'ê bû. Koçberiya wî ya ji nava me, jibo Gelê Kurd û Kovara WAR' windabûnek pîrr mezin û bêhempa ye. Ew dê bi nivîsar û berhemên xwe, her û her di nava me da bijî. ■

# Jibo Bîranîna Seydayê Mele Evdirehman

ŞÎRO

Şînek li dil keder ser da  
Hundabûnek mezin deng da  
Bi ax û nal sed nale da  
Kî bûn, çi bûn, gotin SEYDA

Zivistan bû bahoz û sar  
Dawî anî li dost û yar  
Me qet nedî rojek bihar  
Kî bûn, çi bûn, gotin SEYDA

Şîna li dil xwîn bû rewan  
Histirê çav nadin eman  
Mamoste nav EVDIREHMAN  
Kî bûn, çi bûn, gotin SEYDA

Nabî jibîr li dil me jîn  
Ger bi ken bim dil tê girîn  
Ferman ji Yezdan bû çunîn  
Kî bûn, çi bûn, gotin SEYDA

Cejna me hat matem bikar  
Şîna te girt gund û bajar  
Deşt û çiya kevir û dar  
Kî bûn, çi bûn, gotin SEYDA

Ziman zanest wek te çi kes  
Min qet nedî, nabînim kes  
Mem ê jar im mame li qefes  
Kî bûn, çi bûn, gotin SEYDA

Li AMED'ê te veşartin  
Histirê çav xwîn dihatin  
Dicle giryan tev Firat in  
Kî bûn, çi bûn, gotin SEYDA

8'ê Adarê 1998 AMED

# Helbesteka Asûd li Ser Ronahiya Mamoste Evdirehman

MIRIN mezin e...

Û em yê wê ne...

R. Marîa Rilke

Spîn  
Ro çû ava  
Daşikest çûqleka dilî  
Ji nivê ra

Ro çû ava  
Ez bûm lê ne ez bûm  
Ez di himbêza xewneka dijwar de bûm  
Li wir, li hûndir  
Li hindavî serê te  
Li tenişt bedena te yê tazî  
Girnijîna zelal a evîna min î, rûheyv  
Çawan jî berze dibû  
Li ber çavên min  
Êdî çend rondik ji wê  
Û çend ji min

Ro çû ava  
Sedsalek xwe ji bircên Amedê  
Avête jêr  
Kê guh dida xûşîniyê?

Belê, ro çû ava  
Min kûlîlkeka hemareng  
Ji dara azadiyê birrî  
Bihn ne da  
Seyda...

4'ê Adarê 1998, Diyarbekir

# Ferheng-Vajname'yê

(KURMANCÎ - HEWRAMÎ - DIMILÎ - SENENDEJÎ - IV)

ABDURRAHMAN UÇAMAN - SEÎD VERROJ

## M

| MAÇ               | KURMANCÎ | HEWRAMÎ | DIMILÎ  | SENENDEJÎ |
|-------------------|----------|---------|---------|-----------|
| MAÇ               | maç      | maç     | miçi    | maç       |
| ramusan           | -        | -       | lew     | buse      |
| MADEN             | filz     | filz    | maden   | filz      |
| MAF               | heq      | heq     | heq     | heq       |
| heq               | -        | -       | -       | rewa      |
| MAHÎN             | mayne    | mayîn   | mayîn   | mayîn     |
| MAHKEME           | mahkeme  | mahkeme | mahkeme | mahkeme   |
| dîwan             | -        | dîwan   | dîwan   | dîwan     |
| Mahû (maka beraz) | malose   | xoze    | xoze    | malose    |
| MAK               | jek      | makî    | makî    | jek       |
| zak               | -        | -       | -       | axoz      |
| MAKER             | mahere   | manker  | manker  | maker     |
| manker            | -        | -       | -       | -         |
| MAKÎNE            | makîne   | makîna  | makîna  | makîne    |
| MAL               | mal      | mal     | mal     | -         |
| serwet            | -        | serwet  | serwet  | serwet    |

**MALBAT**

| <b>KURMANCÎ</b>  | <b>HEWRAMÎ</b>      | <b>DIMILÎ</b>         | <b>SENENDAJÎ</b>   |
|------------------|---------------------|-----------------------|--------------------|
| <b>MALBAT</b>    | <b>qingeze</b>      | <b>bab/m</b>          | <b>qingeze</b>     |
| êl               | hoz                 | êl                    | hoz                |
| eşîret           | –                   | eşîret                | dudman             |
| qebile           | –                   | qebila                | –                  |
| ber              | –                   | babik                 | –                  |
| azbat            | –                   | –                     | –                  |
| babik            | –                   | –                     | –                  |
| <b>MALDARÎ</b>   | <b>binewan</b>      | <b>maldar</b>         | <b>binewan</b>     |
| xanedar          | xanedar             | xanedar               | xanedar            |
| <b>MALÊS</b>     | <b>qêmaxe</b>       | <b>malês</b>          | <b>qêmaxe</b>      |
| ardexewk         | –                   | –                     | –                  |
| <b>MALIŞTIN</b>  | <b>pakew kerdey</b> | <b>pank kerdiş</b>    | <b>pak kirdin</b>  |
| malîn            | ere malay           | estariştin            | malîn              |
| paqijkirin       | –                   | ritiş                 | –                  |
| <b>MALÎN</b>     | <b>malîn</b>        | <b>ritiş</b>          | <b>malîn</b>       |
| malandin         | malayre             | estariştin            | –                  |
| malîştin         | –                   | –                     | –                  |
| <b>MALXO</b>     | <b>xawen</b>        | <b>wayîrê keyî</b>    | <b>xane xweyî</b>  |
| Xwedîmal         | –                   | –                     | xawen mal          |
| <b>MAM</b>       | <b>mamo</b>         | <b>dat</b>            | <b>mamo</b>        |
| ap               | –                   | ded                   | –                  |
| <b>MAMAN</b>     | <b>mamane</b>       | <b>dêk</b>            | <b>maman</b>       |
| ebe              | –                   | eba                   | –                  |
| <b>MAMZA</b>     | <b>mamoza</b>       | <b>datîza</b>         | <b>mamoza</b>      |
| –                | –                   | –                     | amoza              |
| <b>MAR</b>       | <b>mare</b>         | <b>mare</b>           | <b>mare</b>        |
| mehr             | –                   | –                     | –                  |
| <b>MARÎ</b>      | <b>çêlî</b>         | <b>marî</b>           | <b>makew</b>       |
| mêkew            | –                   | –                     | –                  |
| <b>MAR KIRIN</b> | <b>Mare biryey</b>  | <b>mare birrnayîş</b> | <b>mare biryey</b> |
| –                | –                   | mare kerdiş           | mare kirdin        |

MASE

| KURMANCÎ            | HEWRAMÎ      | DIMILÎ        | SENENDAJÎ   |
|---------------------|--------------|---------------|-------------|
| —                   | —            | mare birryaya | jin awerden |
| —                   | —            | —             | îzdîwaç     |
| MARUTE (hewma masî) | hewm         | qefê çemî     | qolax       |
| MASE                | lim          | mase          | mase        |
| mêz                 | mêz          | —             | mêz         |
| xîz                 | —            | —             | —           |
| MASÎ                | masaw        | masî          | masî        |
| MAST                | mas          | mast          | mas         |
| MAŞE                | meşaq        | maşe          | meşaq       |
| maşik               | —            | —             | —           |
| MAT                 | mat          | mat           | mat         |
| kerr                | beht         | kerr          | beht        |
| —                   | —            | —             | bahên       |
| —                   | —            | —             | gêç         |
| MAT MAYIN           | mat          | mat mendiş    | maq         |
| zîqbûn              | zaq          | zîq biyayîş   | zaq         |
| —                   | demeq        | —             | demeq       |
| —                   | —            | —             | waq         |
| MAYÎ                | mene         | mende         | mene        |
| —                   | paşe         | mendeca       | pezîre      |
| —                   | menciya      | —             | mak         |
| —                   | —            | —             | ma          |
| —                   | —            | —             | cîmak       |
| MAWE                | mude         | molet         | mawe        |
| MAZÎ                | mazî         | mazî          | maze        |
| Mela                | mela         | mela          | mela        |
| —                   | mamusa       | —             | mamusa      |
| —                   | —            | —             | axuwun      |
| MELE                | meley        | asnaw         | mele        |
| sobe                | —            | —             | awtenî      |
| MELE KIRIN          | mele kerdeyî | asnaw kerdiş  | melekerden  |

MELED

| KURMANCÎ                              | HEWRAMÎ                    | DIMILÎ                           | SENENDAJÎ                  |
|---------------------------------------|----------------------------|----------------------------------|----------------------------|
| pêro              | –           | –               | koh          |
| PEYMAN            | peyman      | pêameyiş        | peyman       |
| pêman             | –           | pê omeyiş       | –            |
| PEYWENDÎ          | keyn û beyn | têkili          | keyn û beyn  |
| têkili            | –           | –               | –            |
| girêdan           | –           | pêra girêdaye   | –            |
| PÊÇ               | pâçazî      | pêç             | pêçaz        |
| badan             | pêçdayî     | piştiş          | badan        |
| pêçan             | lul         | tadayiş         | lul          |
| –                 | wa          | –               | taw          |
| –                 | waday       | –               | tawdan       |
| –                 | –           | –               | helpêçanîn   |
| –                 | –           | –               | qemç         |
| PÊDA              | şun be şun  | cêdima          | piştseryek   |
| berêkê da         | –           | têdima          | duwa be duwa |
| peve              | –           | têreyd          | –            |
| PÊGAN (îsabet)    | pêgan       | ca de           | pêgan        |
| –                 | –           | cay xwi girotiş | –            |
| PÊDANÎN (întizam) | saman       | serraşt kerdiş  | saman        |
| –                 | seqam       | –               | seqam        |
| PÊKHATÎN          | astî kirdey | pê ardiş        | astikirdin   |
| PÊK HATÎN         | sazyay      | biyayiş         | sazyan       |

| <b>PÊKVE</b>                                     | <b>HEWRAMÎ</b> | <b>DIMILÎ</b>    | <b>SENENDAJÎ</b> |
|--|----------------|------------------|------------------|
| <b>KURMANCÎ</b>                                  |                |                  |                  |
| <b>PÊKVE</b>                                     | ham qewli      | yew biyayîş      | destyekî         |
| yekîti   | ham desî       | –                | yekteki          |
| hevrayî  | –              | seycê biyayîş    | hewdesî          |
| <b>PÊL</b>                                       | şepol          | pêl              | şepol            |
| <b>PÊMAN</b>                                     | peygamn        | peymendiş        | peyman           |
| peyman (belga bazarê, –<br>lihev hatinê, aştîyê) | –              | pêameyiş         | –                |
| <b>PÊNCE</b>                                     | penca          | pancas           | penca            |
| <b>PÊR</b>                                       | perî           | perê             | pêreke           |
| <b>PÊSÎ</b>                                      | kolî           | –                | kolî             |
| kolî (cûzam)                                     | –              | –                | –                |
| <b>PÊŞ</b>                                       | were           | ver              | werdem           |
| ber  | werdem         | verê             | ber              |
| wane   | velê           | vernî            | cilew            |
| berge  | cilew          | –                | –                |
| <b>PÊŞGOTÎN</b>                                  | dîbace         | vatişê vernî     | sereta           |
| dîbace   | –              | –                | dîwace           |
| destpêk  | –              | dest bide kerdiş | –                |
| <b>PÊŞÎ GIRTÎN</b>                               | wergîr         | vernî girotiş    | bergîrî          |
| rê nedan   | werbes         | vernî bestîş     | berbin           |
| –  | –              | vernî birnayîş   | gel              |
| <b>PÊŞÎ (1)</b>                                  | peşule         | vizik            | tofane           |
| pêşu   | –              | –                | –                |
| kelmêş   | –              | –                | –                |

PERD

| KURMANCÎ                     | HEWRAMÎ   | DIMILÎ       | SENENDAJÎ  |
|------------------------------|-----------|--------------|------------|
| PÊŞÎN (2)                    | welîn     | verên        | berkin     |
| pêşî                         | walîn     | vernî        | berk       |
| berê                         | werewe    | verê         | lebera     |
| –                            | ewel      | ewil         | ewel       |
| –                            | –         | serî         | ser        |
| PÊŞÎN (dest bi dest) helekan |           | pêşîn        | helekan    |
| –                            | pelepel   | dest de      | –          |
| –                            | –         | dest bi dest | –          |
| PÊŞÎYA                       | pêşiyak   | nanê tenur   | pêşyak     |
| –                            | tenurî    | –            | –          |
| PÊŞKÎR                       | selem     | –            | sewzixir   |
| PÊŞMERGE                     | pêşmerge  | pêşmerge     | pêşmerge   |
| PÊŞNIMÊJ                     | wernemay  | mela         | berniwêj   |
| PÊŞQAZÎ (dema bêd) pêşwaz    |           | gamî aver    | berew bêrî |
| PÊŞWAR                       | pêşwar    | serek        | pêşwar     |
| serok                        | pêwaywe   | serok        | pêrayî     |
| –                            | werewpêrî | –            | perewpêrî  |
| –                            | –         | –            | pêrî       |
| PÊŞVE                        | pêşga     | rehetî       | pêşga      |
| hizur                        | –         | hizur        | –          |
| PÊÊT                         | pitew     | pêt          | pitew      |
| pît                          | çeç       | –            | çeç        |
| sext                         | req       | –            | req        |
| tund                         | –         | –            | qors       |
| –                            | –         | –            | sext       |

| PÊVEBÛN<br>KURMANCÎ | HEWRAMÎ   | DIMILÎ             | SENENDAJÎ |
|---------------------|-----------|--------------------|-----------|
| PÊVEBÛN             | çespîya   | pêra bîyayîş       | çespîya   |
| —                   | —         | pêra beste         | —         |
| PÊVEKÎR             | haluçyare | pakerdox           | daluçke   |
| —                   | aluçyare  | —                  | awîzan    |
| —                   | —         | —                  | bel       |
| —                   | —         | —                  | beleçek   |
| —                   | —         | —                  | elqawês   |
| PÊVEKÎRÎN           | lêknay    | pa kerdiş          | lêkanîn   |
| lê anîn             | —         | bide ardiş (erdiş) | —         |
| PÊVEND              | pêwend    | têkilî             | pêwend    |
| PÊVEDAN             | day pune  | pede dayîş         | pêvedan   |
| —                   | gesay     | —                  | —         |
| PÊXOŞ               | raxim     | waşttox            | xozkar    |
| xwezîkar            | —         | —                  | —         |
| PÊXÛR               | pêxwer    | pêwer              | pêxwer    |
| PÊXWAZ              | pawerwa   | warway             | papetî    |
| xwas                | paxirwa   | —                  | —         |

- 1) Bi tevayî ji bo însan tê xebitandin.
- 2) Bi tevayî ji bo însana tê xebitandin.
- 3) Zarokê nû zayî.
- 4) Çêlê teyran.
- 5) Zarokê ku şîrê jinekî di vexwe.
- 6-7) Çêleyê teyrê ku hêj baskê wê derneketiye.
- 8) Çêleyê marr.
- 9) Zarokê jin û mêrê pîr.
- 10) Zarokê ku nû bi lingan digere.
  - a) Çêlikê beraz.
  - b) Çêlikê meymun.

|              |                   |                 |               |
|--------------|-------------------|-----------------|---------------|
| <b>PİÇUK</b> | <b>zarole (1)</b> | <b>wirdêk</b>   | <b>menal</b>  |
| zarok        | zawle (2)         | tut             | bebe          |
| geda         | werwêrik (3)      | geda/m          | werwêrik (3)  |
| gede         | golale            | gede/n          | piçuk         |
| dişke        | wirdey            | şinik           | role          |
| –            | beç (4)           | leyîrê teyran   | beç (4)       |
| –            | lamij (5)         | –               | lamij (5)     |
| sirsuruke    | zerqote (6)       | –               | zerneqote (6) |
| –            | pasarî (7)        | –               | pasarî (7)    |
| dişkemarr    | tulemer (8)       | leyîrê marri    | tulemar (8)   |
| pîrzay       | pîreza (9)        | –               | pîreza (9)    |
| –            | parokle (10)      | gedeyo ki payku | paruke (10)   |
| –            | kirbeçe (11)      | leyîrê aroşî    | paşîle (11)   |
| nozîk/nûxur  | nolem (12)        | gedew verên     | bereza (12)   |
| –            | parkole (13)      | leyîrê heş      | parukle (13)  |
| –            | heşkole           | –               | –             |
| dişkeşêr     | şêrkole (15)      | leyîrê şêrî     | şerkole (15)  |
| şiwilxe      | pore (16)         | –               | pore (16)     |
| –            | bazele (17)       | –               | bazle (17)    |
| kegav        | goreke (18)       | –               | goyreke (18)  |
| –            | –                 | –               | pelx (a)      |
| –            | –                 | –               | qeşmer (b)    |

11) Çêlikê keroşkê (xirnik).

12) Zarokê pêşin za (nûkri)

13) Çêlikê hirçê.

14) Çêlikê hirçê.

15) Çêleyê şêr.

16) Şitla nû ya mêşa hingiv.

17) Ewan çêleyên ku guvrîk bûne.

li xweser dikarin bijîn.

18) Golika ku ji şîr ve bûye.

# Li Ser Salvegera 100 Saliya Rojnamegeriya Kurdî Çend Gotin

Yekemîn rojnameya kurdî *Kurdistan* di sala 1898'an da bi rêvebirîya malbata Bedirxaniyan li Qahîre'yê hate weşandin. Ji wê rojê heta evro sed sal derbas bû. Di vê pêvajoka dûr û dirêj da gelek tişt gûherî; bi tevî hemû asteng û neyîniyan gelek rojname û kowar hatin weşandin. Hinek ji wan, jiyana xwe ya weşanê dûr û dirêj berdewam kirin û hinek jî di demek kurt da mecbûr man ku jiyana xwe ya weşanê rawestînin. Evro jî beramberê weşangerî û rojnamegeriya kurdî gelek asteng û pirsgirêk hene. Me divê em li ser van asteng û pirsgirêkan hûr bibin û jibo çareserkirina wan rê û rêbaz nişan bikin.

Çapemenî ji bo hişyarbûna civat û milletekî wesiteyekî gelek girîng e. Çapemeniya kurdî jî di nava pêvajoka dîrokê da bi vê manê cihê xwe girtiye û evro jî vê rol û girîngiya xwe berdewam dike. Xwediyê Rojname *Kurdistan*'ê jî vê rewşa hanê di hejmara heştan ya rojnamê da weha tîne ziman: "*Ez dizanim ku Kurd di derheqa dîroka Kurdistanê da xwedî zanebûnek zêde nîn in. Ji bo vê yekê, ezê di her hejmarê da, di derheqa Kurd û Kurdistanê da nivîsaran binivîsim.*" Wek vana, em dikarin gelek vekokan bidin, lêbelê ez naxwazim dirêj bikim. Lewra bi tevayî hin tişt ji alî herksî ve têtê zanîn, ne hewce ye em wan ducar bikin.

Li gor dîtina me (*War*), jibo vê civînê tiştê herî girîng ew e, ku çalakiyên pîrozbahîya salvegera 100 saliya rojnamegeriya Kurdî, jibo me bingeh û firseta gengeşî kirirna pirsgirêkên çapemeniya kurdî pêk anîye. Ev pêngavek gelek girîng e, bi tevî kêmasiyên xwe. Li ser vê bingehê, gotina me ev e:

Jibo pîrozbahiyên salvegera 100 saliya rojnamegeriya Kurdî, çalakiyên ku hatin ravedan, bêtir di Bakurê Kurdistanê da li ser çapemeniya Kurdî rawestiyên. Lêbelê, divê em bi tevayî li ser çapemenî û rojnamegeriya kurdî hûr bibin û li her çar perçê jî rewşa wê li ber çavan raxînin. em dizanin ku li dervayê Bakurê Kurdistanê jî gelek rojname û kowarên giranbiha û hêja derketine. Her wekî Niştîman, Helale, Kurdistan, Rojî Kurdî, Rojî Nîwî (li Kurdistanê Rojhelat hatine weşandin), Hawar, Ronahî, Jiyan, Ziban, Pêşkewtin, Gulan, Peyman,.. (li başûrê Kurdistanê), Riya Taze û hwd. (Ji alî kurdên Sovyetê ve têtê derêxistin.)

Pirsgirêk û astengên li pêşberê çapemeniya Kurdî, bi yê Tirk, Arab û Faris ra muqayese kirin ne dirist e. Jibo faaliyeta çand û çapemeniya neteweyên serdest, alîkariya dewletê mumkûn e. Dewlet bi xwe, jibo hedefên xwe yê siyasî bi maddî û manewî alîkarî dide û ew bi xwe jî di nava vê faaliyetê da cî digre. Ji ber ku Kurd netewekî bindest e, ne bes e ku em bêjin li bin nîrê zordarî da ne, hemû faaliyetên wan yê çandî û çapemenî têne qedexa kirin û ew kesên ku di vê faaliyetê da cî bigrin bi her awayê têne ceza kirin.

Ev pêwîst û bargiraniyên objektîf, rewşa faaliyetên li ser çand û çapemeniya Kurdî ye. Bargirani û astengên pêşberê me, bi vê rewşa hanê ve sînorkirî nîn e. Bargiraniya me ya mezin, bi rewşa me ya subjektîf (pîşekar) ve girêdayî ye, yanî bi feraseta me ya çandî û polîtîk ve girêdayî ye.

Pirsgirêkek çapemeniya Kurdî heye ku herî girîng û birîna me ya reş e; ew jî ziman û zaravayên wî ne. Lewra ziman, şeklê hebûna netewî ye. Gelek rojname û kowar hene ku xwerû bi zaravayên deverî û cihê cihê dertêne. Em dizanin ku rîya pêşveçûna zimanê me bi lêkolîn, nêzandin û berhevdana zarava û devokan ra derbas dibe. Lêbelê çalekiyên me dijberê vê yekê ne. Eger em bi awakî kûr û fire û rîyek rats li ser zavayên zimanê Kurdî rawestin, dê xuya bibe ku zaravayên kurdî pîrr nêzîkê hev in. Ev kêmasiya me, ji tunebûna siyaseta me ya li ser ziman e. Divê li çar aliyê Kurdistanê siyaseta me ya li ser ziman wekhev be û di faaliyetên çandî û çapemenî da bête karanîn. Heta nûha me ev yeka hanê pêk neaniye.

Bi navê Kowara *War*, em dixwazin li ser vê pirsgirêka ziman û çapemeniya Kurdî, nêrîn û rêbaza xwe diyar bikin; Ji ber ku zimanê Kurdî nebûye zimanê dewlet û perwerde kirinê, wek zimenk zikmakî û jar maye. Evro jî gelek nivîskarên Kurd di faaliyetên çapemenî û weşanê da zimanê xwe yê zikmakî kartînin. Ferqîtiya navbera zaravayên Kurdî, bêtir li ser navên xwezayî, nebat, giya, dar û hwd. ne. Lêbelê, divê ji bo pêşvebirina ziman, çapemenî û weşanên Kurdî ji afirandina gotinên nû û navendî kirina faaliyetên li ser ziman, di nav têkiliyê da bin û bi hev ra bixebitin. Divê jibo zimanê Kurdî navlêkên nû bêne afirandin. Jibo her zaravaya zimanê Kurdî, çekirina lîteratora zanistî, teknolojîk û siyasî, her yek zaravaya zimanê Kurdî dike zimanek serbixwe. Evro li başûrê Kurdistanê da rewşa zaravaya soranî gihâştine vê qonaxê, ku dibêjin soranî zimanekî serbixwe ye. Bi tevî gotinên ku ji Arabî, Farişî û Azerî di vê zaravayê da bi cî bûne.

Divê çapemenî û weşanên kurdî, berhemên xwe bi zimanê Kurdî bidin. Em dizanin ku gelek asteng pêşberê vê yekê hene. Berhemên ku bi zimanê Arabî, Farişî û Tirkî hatine afirandin jî hene, bi tevî ku çavkaniya wan çanda Kurdî ye. Divê evan berhemên jî di nav çanda Kurdî de bêtin hesibandin. Gerek em li ser şekil na, li ser naverokê rawestin. Tersê vê yekê jî rast e. Çawa ku hin berhem bi Kurdî hatine nivîsîn, lêbelê ne berhemên çanda kurdî ne. Ew berhemên ku bi naveroka xwe li ser coxrafya Kurdan ji desthilatbûna Kurdan ra xizmet neke, nabe ku ji ber-

hemên çanda wana bête hisabkirin. Her çiqas em berhemên nivîskarên biyaniyan wergerînin zimanê Kurdî jî, ew nabin berhemên çanda Kurdî. Mîsal; em bêjin ku me berhemên V. Hugo, Gothe û hwd. wergeranidn bi zimanê Kurdî, dê feyda wan jibo dewlemendbûna çanda Kurdî hebe, lêbelê wan berheman nabin berhemên çanda Kurdî. Jibo vê yekê, li ser zimanê weşan û çapemeniya Kurdî jî divê em bi vê awayê bifikirin.

Pirsgirêkek herî girîng ya weşan û çapemeniya Kurdî jî ev e; têkiliya di navbera wan û xwendevanan pîrr qels e. Qutbûnek di navbera wan da heye, jihev pîrr dûr in. Lêbelê çavkaniya berhemên çanda kurdî, xelkê Kurd bi xwe ye. Ji ber vê yekê, divê em ji xelqê xwe hîn bibin, ji wî bigrin, dewlemend bikin û carde pêşkêşê wî bikin. Mîsal; divê em çîrok, kilam û hwd. berhemên çanda Kurdî di nava xelkê da berhev bikin û wan ji nû ve wek roman, çîrok, sînema û bi motif û mûzîkeka nû û bi awakî dewlemendtir pêşkêşê xelkê bikin. Di vê babetê da xebata M. Uzun û hwd. layiqê pesindanê ne.

Bi encamî, li alî çapemenî, nivîsîn û ziman da pîrsgirêk û astengê me ya pîrr girîng jî; di nivîsandinê da pêkanîna alfabeyên newekwe e. Bi dîtina me, divê li çar alî welêt alfabeja latînî bête ecibandin û karanîn. ■

## WAR

# Hacî Qadrî Koyî

MÎKAÏL CANPOLAT

Hacî Qadrî Koyî, helbetvanê şoreşger û welatparêz li gundê “Goreqerec” (1) ku dikeve başûrê rojava yê bajarê Koyî li başûrê Kurdistanê, ji dayik bûye. Di derheqa sala ji dayik bûn û mirina Hacî Qadrî Abdulrehman Saîd (2), Mihemed Emîn Zekî (3), Refîq Hilmî (4), hemû sala 1232’ê hîcrî (1816-1817 mîladî) jibo ji dayîkbûna Hacî Qadrî datînin. Elaaddîn Secadî (5), Gîw Mukriyanî (6), Mihemedê Mella Kerîm (7) jî sala 1815 ji bo dayîkbûna Hacî qebûl dikin. Mesud Mihemed (8) jî sala 1824 wekî berwara dayîkbûna Hacî datîne. Reşîd Findî (9) salên 1815-1816, Sadiq Borakayî jî wekî Mesud Mihemed sala 1824’an jibo dayîkbûna Hacî tîne zmên. Bi kurtî sala ji dayîkbûna Hacî, heta niha bûye mijarê gengeşiyê navbera dîrokvanên wêjeya Kurdî de. Li ser sala mirina Hacî Qadrî Koyî, heta sala 1972’ê li başûrê Kurdistanê bîr û rayên cewaz di navbera rewşenbîran de hebûn. Lê bi gel komkirin û çapkirina rojnama Kurdistan ji aliyê Dr. Kemal Fuad (10) ve ew gîr û girift jî hatin çareserkirin. Ji ber ku di hejmara sê ya rojnama Kurdistan ya sala 1898’an de hatibû xuyakirin ku Hacî Qadrî Koyî “sala di wefat kir” (11). Ango Hacî Qadrî di sala 1897’ande koça dawiyê kiriye. Bi saya rojnama Kurdistan sala koça dawiya Hacî û helbesta wî ya bi navê “*zemanê resmî caranî nemawe*” gêhîştîye heta roja me. Em dîsa bizîvirin li ser jiyana Hacî Qadrî. Navê bavê Hacî, Ehmed bû û navê diya wî jî Fatê bû. Her du jî gund de bûn. Jiyanên xwe li gundê xwe bihûrîbûn. Em ji vê yeka anê di saya helbestek Hacî pêdihesin:

*Bawkim Ehmed bû nawî bîrimdê  
Xelqî ladê bû daykî min Fatê* (12)

Wê dema bavê Hacî dimire hêj ew piçûk bû. Di gel dayika xwe ji gundê xwe dihêlin û tîn li bajêrê Koyî nişecî dibin. Dayika wî, wî dide ber xwendinê û dişîne ji bo mizgeftên Koyî ji bo perwerdebûnê. Ji bo xwendan derdikeve û xwandin û perwerdekirina Hacî diide ser milên xwe. Hacî di zaroktiya xwe de jî jîr û jêhatî

bû. Hertim amade bû ji dû zanistan bigere û biçê bajêr û welatên din ji bo xwendinê. Lewra jî jibo xwendinê cara yekemîn Hacı û hevalê wî Emdulah Celîzade <sup>(14)</sup> rêketin û çûn "Balek". Li wê derê mamostayê wan Mehmudê Ibn-û Adem <sup>(15)</sup> bû. Adem xwe jî xelkê Balek bû, wê demê di devera Soran de zanayên wekî wî yan tûne bûn yan jî gelek kêmbûn <sup>(16)</sup>. Navê Adem ji devera wî derçûbû heta gihiştibû welatên din yê der û dora Kurdistanê.

Di helbestek xwe de Hacı Qadrî basa çûyîna xwe û Ebdullah Celîzade ji bo balek dike ku diyar dibe Hacı înanekî hejar, destkurt û belengaz bû. Di helbesta xwe rewşa xwe bi awayekî zelal û diyar tîne berçavan.

*We bîrt dê zemanê çûyîne Balek  
Be pêxawsî ne qewsim bû ne kalek <sup>(17)</sup>*

Diyar dibe ku wê demê Hacı bê sol, bê kalik û pêxas diçe ji bo Balek. Hacı Qadrî di helbestekî din de jî tê li ser wê geşa xwe bi gel Ebdullah Celîzade jibo Balek, nîşan dide ku Ebdullah Celîzade siyar bû ew jî peya bi gel diçû. Lê bi awayekî hûnerî û ciwan wê rewşê tîne berçavan:

*To xoş debezî hespî bezînît pêye  
Min nageme to hespî bezînîm pêye <sup>(18)</sup>*

Hacı Qadrî ji mella Ebdullah re dibêje ku tu xweş diçî te hespekî zinkirî heye, ez nagehîjim te hespê min yê zinkirî piyên min in. Ev helbest ji rewşa aborî ya helbestvanê bi nav û deng Hacı Qadrî tîne holê û nîşan dide ku heta kîjan radê Hacı Qadrî jar û destkurt bû. Warîdata wî tune bû ji bo xwe hespekî bikire û bi gel hevalê xwe bi siwarî biçin Balek ji bo xwendinê.

Piştî 5 sal li Balek Hacı Qadrî dîsan rêdikeve ber bi Kurdistanê rojhelat diçe û li dû zanîn û xwepwerdebûnê digere, Hevalê wî jî ango Mella Abdullah vedigere jibo Koyî. Bi rastî jî Hacı Qadrî ne tenê hejar bû, kesekî wî jî tunebû. Wê dema em civata Kurdî ya wê demê tînin berçavan ku kur û keç di derguşê de dizewicandin. Mirovên jin nedianîn yê hejar bûn yan jî yê ku nedikarî next (qelin) bidin. Em îro nikarin vê rewşa taybetî ya Hacı seda sed usa şîrovebikin. Lê ev rastî ya civata me bû û heta niha jî gelek deveran her berdewame. Lê Hacı ji bo çî vegere? Kesê wî jî li Koyî nîne. Hacı bi xwe di helbestek xwe de vê rewşa xwe ya taybetî tîna zmên û dibêje:

*Her min im esta warisî Isa  
Bê jin û mal û bê kur û me wa*

Hacıyê bêkes diçe ji bo rojhelata Kurdistanê û nêzikî çar salan li bajêrên serdest, Mahabad û hinek bajarên din dimîne. Piştî qedandina xwendina xwe, Hacı

vedigere ji bo bajêrê xwe, Koyî.

Di derheqa nasnavê "Hacî" jî gelek nîqaş di navbera rewşenbîrên başûr de hatine kirin û hêj cih bi cih berdewam dike. Gelek rewşenbîrên wêjenas û dîroknas li xwe dipirsin, gelo Hacî Qadrî Koyî çûbû Hac, ji bo vê yeka hanê jî ev nav hatiyê lêkirin. Hacî xwe jî di helbestekî xwe de dide xuyakirin, ku neçûye Hacê:

*Menzilî meymen nemawe êsteke eyameke*

*Rahetî mumkîn niye neçûye Medîne ya Mekke (19)*

Li Koyî di navbera Hacî û şêxan de gîr û girift durist dibin û nakokî kûr dibin. Çekêk Hacî Qadrî hebû ew jî helbestên wî bûn. Bi gel helbestên xwe ve Hacî diji şêxên Koyî dest bi şer kiribû. Berxwedan û serî neçemandina Hacî, desthelata Şêx Nebî xistibû li nav tirsîyek mezin. Şêx Nebî û murîdên wî bi gel sofîyên Koyî halwestên gelek tuj û sext beramberî Hacî wergirtin û heta xwastin Hacî bikujin. Hacî, helbestên xwe yê wê demê ve bi dû dengê çînên bindest, diji axa, şêx û derebegan. Di wê civata derebgayetiye de Hacî Qadrî têdikoşîya diji çînên serdest û dixwast bingehê civata Kurdî ya wê serdemê biguherîne. Hacî Qadrî jî wekî mella û helbestvanekî bi nav û deng dikari bû bi çînên serdest û zordar re rêk biketa û dû berjewendiyên xwe yê kesayetiye bimeşîya. Lê Hacî Qadrî hemû jiyana xwe jibo azadkirina welêt û çînên bindestên Kurdistanê terxan kiribû. Qet çarek jî nexwest bi gel nokerên dagirkeran yê li Koyî rêk bikeve. Roj bi roj navbera wan pêtir xirab dibû û Hacî jî xwe her berdewam dikir. Bi wî awayî Hacî bûbû armanca êrîşên kevneperestên Koyî.

Em dizanin di wê serdemê de dewreki mezin yê şêxan di nav komên xelkê Kurdistanê de hebû. Şêxekî dikaribû gelek serokên eşîr û axa bi xwe ve girêbida yan jî bê desthelat bihiştta û kontrola xwe ya nîqaş li ser wan û mirovên wan saz bikira. Wê dema em dewra Melayê Batê di şikestina bizava Kurdî ya başûrê Kurdistanê de tînin berçavan, wesa wî dewra şêxan xuya dibe. Wekî em dizanin Iro jî hinek şêx kontrol li ser dehan hozan çêkirine. Kirine murîdê xwe. Serhildan ji aliyê rewşenbîran ve di wê serdemê de diji şêxan karekî asan nebû. Pêwîste di nav vî çarçovê de em mezintiya Hacî Qadrî û şoreşgertiya wî bi nixînin.

Hemû nivîsevanên kurd ku li ser Hacî Qadrî nivîsîne, basa koçkirina wî ji Koyî bo Istanbolê û nakokiyên di navbera wî û şêxê Mawîlî de dikin. Piraniya rewşenbîrên Kurd ku yê li ser jiyana hacî Qadrî nivîsîne, li ser wê bîr û bawer in ku sedema serekî ya derçûyina Hacî ji Koyî, şêx Nebî û murîd û sofîyên wî bûn. Hinek nivîsevanên Kurd jî hene (pirr degmenîn) <sup>(20)</sup> dibêjin Hacî bi dilê xwe Koyî hiştiye û çûye Istanbolê û carekê din venegeriyaye ji bo Koyî. Lê jibo vê yekê jî tu grovan nîşan nadin. Disa ew jî dûr û dirêj li ser nakokiyên navbera Hacî û desta şêxan û sofîyan radiwestin. Hacî xwe jî di helbestên xwe de diji şêxan rawestiyaye

û gelek bi tundi jî şêx û melê û softi rixne kiriye. Dîsa Hacî xwe jî di helbestek xwe de li ser sedemê çûyina xwe bo Istanbulê radiwete û dibêje:

*Le quşxanewe ta demî îçqela  
Le Bayîz axa e ta mihley qelat  
Hemû xîzmî xomim dezanim dêlen  
Lê bê hurmetîman bû Hacî helat* (21).

Wê dema em ji nêzik ve bala xwe didin vê malika Hacî em dibînîn ku Hacî gelekî bîriya Koyî kiriye û di helbesta xwe de navê çar taxên Koyî ango quşxane, îçqela, Bayîz axa û qelatê aniyê zman. Ji ber ku Hacî ev helbesta li Istanbulê nivîsiye û şandiyê ji bo heval û hogirên xwe yên Koyî. Li ser peyîva “bê hurmetiyê” jî li başûrê Kurdistanê di Navbera rewşenbîran de gelek niqaş hatine kirin. Lê hemû rewşenbîr li ser wê baweriyê ne ku kesî li Koyî “bê hurmetî” bo Hacî nekiribû û Hacî jî însanekî qedir giran bû, ji aliyê xelkê Koyî ve dihat hezkirin. Lê di vê çarî-nê de peyîva “Helat” jî bo mijara me gelek girîng e. Ji ber ku Hacî xwe dibêje ku ez reviyam, Mirovekî qedir giran, hezkerê gel, bilbilê Koyî eger bi devê xwe vê yekê qebul dike û dibêje “helatim”. Ev belge bîr û boçûnên duyemîn pûç dike û nîşan dide ku Hacî ji destên şêx û softi û murîdên Koyî reviya û çû paytextê dewleta Osmanî. Eger fişara şêx û murîdên wî nebûya, ji bo çî Hacî di 50 saliya xwe de heval û hogirên xwe bihêle û biçê Istanbulê?

Hacî Qadrî di helbestên xwe de jî li ser şêx Nebî radiweste û wî tawanbar û rixne dike:

*Site esir jneyetî bi mezhebî hîmarî  
Ibn-û Adem nemawe serî pan kat wek marî* (22)

Li gor hemû nivîskarên ku li ser Hacî nivîsîne yan jî diwana wî ji bo çapê amade kirine, dibêjin ev helbest ya Hacî ye. Bi taybetî jî xîsmekî Hacî bi navê Mella Ebdullah yanzde yan diwanzde sal piştî mirina Hacî li ser jiyana Hacî nivîsibû. Ew jî vê yeka hanê qebul dike û dibêje ku ev helbesta ya Hacî ye û li ser şêx Nebî vehandiye. Di derheqa ravekirina vê helbestê nivîsevanên Kurd xwedanê rayek hevbeş nînin. Beşek ji wan dibêjin ku şêxê Mawîlî 16 jin ji bo xwe anî bûn û pêk ve markiribû. Heta hinek ji wan dibêjin ku 16 jinan zêdetir jin anîbû (23). Beşek ji rewşenbîrên Kurd li ser wê bawerî ne ku şêx Mawîlî jinek ji bo xwe anîbû, lê li gor rê û rêçkên civatê qebul dikir, ev yeka hanê nekiribû. Ecama bîr û bawerîyan bi gel hevdu ne ku Hacî, di vê derê de li Şêx Mawîlî rixne kiriye û dîsan bi gel hevdu ku şêx Mawîlî mirovekî bê rewşt û fêlbaz bû. Ji bo vê yekê jî Hacî dibêje: “Eger Ibn-î Adem ma-

*bûya sûrî wî wekî ye mer pandikir”.*

Hacî her di helbestên xwe de êrîş dibir li ser şêxayetiye û hewil dida rêya zanîstê nişanî xelkê bide û durûyîtiya şêxan nişan bike:

*Siklî tekeye û xaneqahî şêxekan  
Waqîha rengîne, ema bû riyana  
lem hemû şêx û murîdaney iya  
ferdekî naçîte mizgewtî xuda (24)*

Li gor Hacî, şêx û murîdên wî xelkê dixapînin û bi zikr û duayên wan ve qet tişteke çareser nabe. Eger çareser bibûya mirtiv wekî qarun devlemend dibûn:

*Faydey ger bûyaye zikr û duw’a  
Debû qarûn gedayî ser rêga (25).*

Ev gotinên Hacî wekî bruskê li Mêjîyên şêx û sofîyan dike. Ji bo parastina berjewendiyên xwe û desthelatê xwe di nav civata Kurdî ya wê demê de hemûyan hev girtibûn û dixwastin Hacî holê rakin. Ev plana hêzên kevneperest dijî Hacî Qadrî serneket. Ji ber ku mella û sofîyên dostê Hacî rê nedan ev kuştina cih bi cih bibe. Mella Ebdullah Celîzade û Emîn axa hember (Hacî di helbestek xwe de pesnê wî dike) vê kiryara şêx û murîdên wî derdikevin. Paşê jî bi gel Hacî diaxivin û jê daxwaz dikin ku piçekê halwestê xwe beramberî teke û şêxan nerm bike û êrîşên xwe rawestîne û xwe agadar bike. Hacî daxwaza wan refus dike û naxwaze êrîşên xwe dijî “Ker Nebî” (26) û hevalên wî rawestîne û dibêje: “*Heta ku ruhê min di bedena min de be, waz jê naynim û ez ji vê derê jî namînim*” (27).

Piştî vê gotinê Hacî jî Koyî dihêle û diçe Hewlêrê û li wê derê bi gel helbestvan Keyfî (keyfî jî ji destê şêxên Koyî reviya bû) ku li ser jiyana Hacî nivîsîne, berwar rasteqîn ya çuyîna Hacî ji bo Istenbolê diyar ne kiriye. Li gor Mesud Mihemed Hacî di sala 1864’de ji Koyî derçûye û Gîw mukriyanî jî wesa bawer dike ku di navbera salên 1853 û 1854 an (29) de rêket ji bo Istenbolê. Ev derketina Hacî ji Koyî ya dawiyê bû. Hacî qet venegeriya ji bo bajêrê xwe. Ew jî wekî Nalî li welatê biyane ango li Istenbolê koça dawiyê kir û li goristana “Qerece Ehmed” hate veşartin (1897).

**Hacî Qadr û Peydabûna Hesta Netewî**

Hacî Qadrî Koyî di helbestên xwe de ne bi tenê dijî şêx û sofîyan derdiçû, belku wê zêdetir jî dijî dewletên dagirker derdiket û hewl dida ji bo hişyarkirina gelê Kurd. Wê dema ku em basa jiyana Hacî Qadrî dikin, pêwîste li ser berhemên Hacî, bi taybetî jî li ser helbestên netewî yê Hacî rawestin. Ji ber ku Hacî Qadrî jiyana xwe ji bo Kurd û Kurdistanê terxan kiribû. Min li jorê jî baskiribû ku Hacî

nezewicî bû û zarokên wî jî tunebûn. Bi rastî jî Hacı evîndarê welêt û bav û rêberê kurdan bû. Ew ji bo Kurdistanê jiya û xebata xwe jî heta roja mirinê ji bo azadî û serxwebûna Kurdistanê terxan kiribû. Hemû rewşenbîrên kurd ku li ser Hacı Qadr nivîsîne, her tim bala xwendevanan kişandine li ser helbestên wî yên netewî. Lê li ser peydabûna hesta netewî li cem Hacı Qadrî Koyî gelek gengeşe di navbera rewşenbîrên Kurd de bûne û hêj jî berdewam e. Ji bo agahdarbûn li ser rewşa wê demê ya civata kurdî û rada bilindhûna hesta netewî, rewşenbîran gelek girîngî dane û didin vê mijarê. Hemî rewşenbîrên ku li ser Hacı lêkolîn kirine yan jî dîwana Hacı ji bo çapê amade kirine. Li ser peywendiyên Hacı bi gel mala Bedirxanan, Mem û Zîna Ehmedê xanî û çûyîna wî bo Istenbole radîwestin. Pîranya van rewşenbîran peydabûna hesta netewî li cem Hacı Qadrî di nav van peywendiyên de digerin û basa kargerîya wan li ser Hacı Qadrî dikin. Jibo vê yekê hana jî pêwîste em hinekê li ser van xalên li jorê rawestin. Beriya ku em li ser vê yekê rawestin pêwîste em bizanin ku rewşenbîrên Kurd jî li ser vê mijarê ango li ser peydabûna hesta netewî li ba Hacı Qadrî Koyî xwedanê rayek hevbeş nînin. Bi giştî rewşenbîr di nav xwe de bûne du beş: Beşek ji wan wesa difikire, ku Hacı piştî çûyîna xwe ji bo Stenbolê dest bi nivîsandina helbestên netewî kiriye; beşe din jî li ser wê rayeye, ku wê dema Hacı li Koyî bû helbestên netewî vehandibû û li Stenbolê jî her berdewam kiriye.

Hacı Qadrî Koyî evê dema bi gel hevalê xwe Keyfî (ew jî helbestvane) diçin ji bo Stenbolê, Keyfî destpê dîke huquq dixwîne. Hacı jî ji bo zorakên Bedirxaniyan mamostayetiye dîke. Pêwîste em bizanin ku Hacı Qadrî di pêvajoyek dîrokî de jiyabû. Di sed sala 19'an de hemû mîrmişînen Kurdan ji aliyê dewleta Osmanî ve yeko yek hatin ruxandin. Hacı jî wekî şahîdekî dîrokî ev karesatên ku li ser Kurdan de peyde bibûn yan didît yan jî dibihîst. Di encam de kargerîyek gelek mezin li ser vî zanayê Kurdperwer û welatparêz dikir. Wê dema Hacı çûbû ji bo paytextê dewleta Osmanî mîrmişîna Botan jî hatibû ruxandin. Weku tê zanîn serhîldana mezin ya Mîr Bedirxan di sala 1846 de şikestin xwar. Ya Yezdan Şêr jî ji 1853 heta 1864'û 1865'an de çûbû ji bo paytextê dewleta Osmanî. Wesa xûya dibe ku binemala Bedirxaniyan li Stenbolê desteser û di bin çavderiya dewleta Osmanî de bûn.

Li gor Elaaddîn Sicadî sedema serekî ya guherîna naveroka helbestên Hacı ji helbestên klasîk ve bo helbestên netewî "vexwarina ava bîr û baweriyên" (30) Bedirxaniyan bû. Gîw Mukriyanî jî vê guherîna ku di helbestên wî de peyda bûye bi "hesta pak" ya binemala Bedirxaniyan ve girê dide. Mîr Celadet Bedirxan jî basa Hacı dîke ku dibêje Ez dikarim bêjim ez Hacı nasdikim, ji ber ku sala ku çûye rehetmetê ez hêj nû ketibûm ser lîngan". (31) Û em dikarin dehan belge û nîşan binin ku peywendiyên Hacı bi gel vê mala bi nav û deng ve heye. Dîsan em dikarin dehan nivîserên rewşenbîrên Kurd wekî nimûne binin ku mala bedirxaniyan tesîr li

ser Hacî kiriye di niştimanî bûna wî û helbestên wî de. Lê ez hezdkim di helbestên Hacî de hinek mînanan derxînim û nîşan bidim li ser tesîra vê binemala welatparêz li ser Hacî Qadrî Qoyî:

*Bedîrxanî li ser la çê le mew pas  
Le her lawe detanharîn wekî aş* (32)

Di vê helbestê de xûya dibe ku hêj Bedirxaniyan li ciyê baweriyê ne û Hacî dibêje “ger Bedirxaniyan qada xebat û şoreşê biçin, dujmin we wekî aşî dihêrin”. Helbestvanekî wekî Hacî di wê wextê de xwedanê helwestekî wesa bû û dîsa em peyamê ji bo Hacî bihêlim:

*Emîrek mawe paşaye  
Gotî Kê ye? Gotim şêr e  
Gotî lêre? gotim lêre heta Taran û Hîndîstan  
Be xey şêre wekî nawî li serda durmin endaze  
Temayan her hew mawe tewawî xakî Kurdistan  
Heçî cêgay umêd mame û ewey dil xoş deka ewro  
kesî dî lew beder nabête xemxurî gelî Kurdan* (33).

Reşîd Findî jî li ser vê helbesta Hacî Qadrî radiweste û dibêje ev helbest li ser Ezdîn Şêr hatiye vehandin. Tiştêk jî bo me xuyaye ku wê dema serhildana Mîr Bedirxan, Ezdîn Şêr serleşkerê mîrê Botan bû. Di dema şer de peywendî bi gel Osmanîyan çêkir û dijî şoreşê derçûbû. Piştî ruxandina şoreşa Mîr Bedirxan dewleta Osmanî soz û peymanên ku dabûn Ezdîn Şêr, cih bi cih ne kirin û Ezdînşêr jî serhilda dijî dagirkerên Osmanî. Şêrê Ezdîn Şêr jî 1853 heta 1864'an dewam kir û ew jî hate fetisandin di nava xwîna de. Di vê helbestê de jî xuya dibe ku wê dema Hacî dibêje: “Emîrêk maye, paşa ye” “bi xwe şêr e wekî navê xwe”, di vê yekê de qesta wî Ezdîn Şêr e. (34).

Wê dema em nêzik ve bala xwe didin dîwana Hacî û lêkolînên li ser hatine kirin bi hêsanî tê dîtîn ku Bedirxaniyan kargerîyek gelek mezin li ser wî kiribû. Piştî şikestina şoreşên Bedirxaniyan Hacî bi gel kul û kesera dilê xwe, bi xemû hêsiyan ve ev helbesta hanê bi awayekî gelek ciwan û hûnerî nivîsiye:

*Cîhan bûyite Cizîre behrî gîryem  
Babê bohtan eto Zîn emîn Mem* (36).

Di vê helbestê de peyîva “Cizîre” tê du wata. Yekem wekî di zmanê Erebi de bi mana dîrgeh di nav deryaya gîryanê de; wata duyem jî Cizîrabetan e. Peyîva Bohtan jî di du mana de hatiye bi karînan; yek jî wata Botan cih û warê Zîn e, ya duyemîn jî di

mana direjw de hatiye bi karînan. Hacî ne tenê dibêje hêsrê çavên min bûye derya , ew her berdewam dike û pesnê mîrên Botan û Baban dide û wan wekî Seyîd û şêxên netewa kurd nişan dide:

*Hakim û Mîrekanî Kurdistan  
Her li Botane we heta Baban  
Yek be yek hafizî şeriyet bûn  
Seyîd û şêxî qewim û millet bûn*

Bi kurtî em dikarin gelek nimûna bibînin di nav helbestên Hacî de û nişan bidin ku Hacî di bin tesîra mîrê Botan de maye û wan ji kargerîyek gelek mezin li ser hesta netewî ya Hacî de kiriye. Di vê helbestê de xuya dibe ku wê dema Hacî ev helbesta dinivîsî, mîrnîşînên kurdan hatibûn ruxandin. Ji bo vê yekê jî Hacî ji bo mîrên Kurdan dibêje “Hafizî seriyet bûn” yan jî “Seyîd û şêxî qewim û Millet bûn” Diyar dibe ku dema rabûrduya vê karê hatiye karînan wekî “bûn”.

Piranya rewşenbîrên Kurd ku di derheqa Hacî Qadrî Koyî de nivîsîne yan jî lêkolîn kirine, hertim bi awayekî yan jî awayekî din basa E. Xanî û kartêkirina wî li ser peyda bûn û geşkirina hesta netewî li cem Hacî kirine. Ji bo mînak em dikarin bêjin Gîw Mukriyanî wê dema basa peydabûna hesta netewî li nik Hacî dike “xwendina Mem û Zîn” a Xanî wekî sedemekê nişan dide. Sadiq Bihaddîn Amêdî jî li ser peywendiyên Hacî û Xanî radiweste û dibêje: “Hacî li ser rêç û şopa xanî çûy” (38). Dîsan Kerîm Şareza jî li ser vê peywendiyê radiweste û basa “dest dirêjkirina Hacî ji bo yekemîn helbestên netewî yên Ehmedê Xanî” (40). Ango ya E. Xanî li ser Hacî Qadrî Koyî kirine. Lê pêwîste em gotinên Mîr Celadet Bedirxan li ser “Mem û Zîn” û berhemên din yên Ehmedê xanî destbixin û bixwînin. Ji bo vê yekê jî gotinên Mîr Celadet Bedirxan serokaniyek hêja û binirxe. Celadet Bedirxan wesa dibêje: “Hacî Qadrî Koyî, xaniyê duane, ew jî wekî xanî bi derdê milletê xwe şewitî, şîir û qesîdeyên wî tevde li ser millet û welat in.”

... Ez îro şîreka Hacî ne çapbûyî belav bikim, her wekî me gotî Hacî perestkarê Xanî bû, Hacî li ser (Mem û Zîn) a babê min û destnivîsa şîira jêrîn nivîsandiye (Zemane resmî caran nemawe)... (41) Di gotinên Mîr Celadetî de jî xuya dibe ku Hacî li ba Bedirxaniyan bû û li ser bergê destnivîs ya Mem û Zîn'ê ev helbesta navbirî nivîsiye. Ji şîrovekirin û ravekirinên hemû ev rewşenbîrên Kurd jî derdikeve ku tovên helbesta netewî yên ji aliyê Ehmedê Xanî ve hatibûn çandin bi gel Hacî Qadrê Koyî û helbestên wî ve du bare şin bûn.

Serokaniya herî girîng ji bo peywendiyên Hacî û Xanî, helbestên Hacî bi xwe ne. Bi saya helbestên wî em dikarin rada kartêkirina Xanî li ser Hacî bibînin. Ji bo vê yekê jî pêwîste em payemê bidin Hacî û bibînin ew çî li ser E. xanî û berhemên wê difikire:

*Zemane resmî caranî nemawe*  
*Çiraxî nazim û munşî kujawe*  
*Li dewrî ême roman û cerîde*  
*Eger çî meqsede zanîn bawe*  
*Eman qedrî bizanîn em kitêbe*  
*Le dinya êstekî hemtay nemawe*  
*Le eyamî heyatî Şêxî Xanî*  
*Le ser nusxey xetî ew nusrawe*  
*Le lay erbabî oy bo qedir û qîmet*  
*Xezîney fewhere û kîsey dirawe*  
*Le memûhî duwel Soran û Botan*  
*Le sayey em kitêbe nasrawe*  
*Le Kurdan xeyrî Hacî û Şêxî Xanî*  
*Esasî nezimî Kurdî danenawe* <sup>(42)</sup>

Di vê helbestê de Hacî gilî û gazindên xwe ji zemanî dike û dibêje; adet û resmên zemên winda bûne, daxwaz ji xwendevanan dike ku nirxa vê pirtûkê bizanin. Ji ber ku di dinê de pirtûkekî wekî wê niha nemaye. Dîsan li gor Hacî, mîrgehên Botan û Baban ji saya bîr û bawerên di vê pirtûkê de hatine xuyakirin, tên naskirin. Ji nêzik ve wê dema em bala xwe didin vê helbestê wekî Reşîd Findî jî dibêje: “gotinên Mîr Celadet rast in” <sup>(43)</sup> ku “Hacî ev helbesta li ser bergê destnivîsa *Mem û Zîn* ‘ê nivîsiye. Ji ber ku Hacî dibêje: “*qedrê vê pirtûkê bizanîn*”. Ev tê wê manê ku pirtûk di destê Hacî da ye, Pêwîste bê zanîn ku Hacî jî qebl dike ku bingeha helbesta netewî *E. Xanî* avêtiye. Lê gelek nivîsevan rexne ji Qadrî girtine ku navê xwe berî *E. Xanî* nivîsiye. <sup>(44)</sup>

Dîsan Hacî Qadrî di helbestên xwe de basê *Mem û Zîn* a *E. Xanî* û diwana *Melayê Cizîrî* dike û dibêje ev herdu pirtûk gelek bi nav û deng in. Tercumeya wan gihîştine heta Fransayê û hewil dide ku heval û dostên wî jî wan bixwînin:

*Mem û Zîn û diwanî Şêxî Cizîrî*  
*Gelê çakin be sehlî bînîne gir*  
*Em duwane emêste tercemeyan*  
*Zore hetta le nêw Frengistan* <sup>(45)</sup>

Pêşgotina *Mem û Zîn* a *E. Xanî* gelek bala Hacî dikêşîne û Hacî jî li ser rewşa Kurdan û de basa pirtûka navbîrî, helbestên tiji hesta netewî dinivîsîne. Ji bo Hacî “*Mem û Zîn pirtûka netewa kurd e*” <sup>(49)</sup> û Ehmedê Xanî jî şahbaz e, nizm nafi-re û ew hertim di nav “fezayê bilind” de difire:

*Ehmedî Xanî sahibî Mem û Zîn*  
*Şahbazî Feyazî eylîn* (46)

Piştî van çend gotinên kurt, di derheqa peywendiyên Hacı bi gel E.Xanî ez dixwazim bêm li ser helwesê, Hacı beramberê bajêrvaniyê, bûyerên nav netewî û helbestên wî yên netewî. Lê beriya ku li ser vî aliyê Hacı rawestim, ez dixwazim bi kurtî li ser hatina Hacı ji bo Stenbolê bisekinim. Wekî me li jorê jî bahskir, wê dema ku Hacı hat ji bo paytextê dewleta Osmanî wî ne tenê berhemên E.Xanî xwand û peywendî bi gel binemala welatparêz ya Bedirxanan sazkir. Wekî tê zanîn ku paytextê dewleta Osmanî navenda peywendiyên siyasî û çandî jî bû. Bi gel çûyina Hacı bo Stenbolê, asoyê wî jî fireh bû û karibû bi saya peywendiyên xwe ji nêzik ve bala xwe bide bûyerên navnetewî û pêşketinên çandî, pişesazî û siyasî yên ku li Ewropa rûdidan, sudwegire. Dîsan Hacı li Stenbolê karibû peywendiyên xwe bi nûnerên bizavên rizgarîxwaz yên dijî dewleta Osmanî duristke û hevberkirinê di navber wan û Kurdan de bike. Bi wî awayî jî karibû bi başî rewşa kurdan û Kurdistanê têbigihîje.

Wekî me li jorê jî bahs kiribû ku Hacı Qadrî Koyî jiyana xwe ji bo welatê xwe terxan kiribû. Hem xebata wî ji bo hişyarkirina gelê kurd bû. Di helbestên xwe de Hacı hertim wekî rêberê kiribû bi zav kiriye û li ser hemû mijaran helbest vehandiye ji bo pêşxistina civata kurdî. Hacı Qadrî Koyî di serdema xwe de nekaribû bîr û baweriyaya xwe bi rêya pirtuk, namilke, rojname û belavokan belav bike. Ji ber ku wê demê dagirkerên Kurdistanê dujminê hacetên hişyariyê bûn. Weşanên hêzên rêkeberiyê hertim qedexebûn. Loma jî eger em dixwazin bîr û baweriyaya Hacı bizanin pêwîste di nav helbestên Hacı de wê yekê bigerin. Ji berku Hacı bi gel hemû gir û giriftên civata Kurdî ya wê çaxê ve mijûl bû. Hacı bi gel hemû hêza xwe ve xebat dikir. Ji bo serxwebûn û yekîtiya Kurdistanê. Hêvî ya wî ya pîroz sazkirina dewletekî yekbûyî ya kurdan bû. Ji bo vê yekê jî wê dema Mesud Mihemed dibêje: “Yekîtiya Kurd û Kurdistanê û pêkhatina dewletek Kurdî di nav çarçova Kurdistanek mezin de ne her hêviya pîroz ya Hacı ye” û bes, belkî mezintirîn, pîroztirîn, ronaktirîn, paktirîn, çêtirîn û asmantirîn armanc û hêvî xew û xeyala Hacı bû vê rastiye Hacı tîne li ber çavan. Helbestên Hacı dev bi dev, dever bi dever di nav xelkê Kurdistanê de belav dibûn. Wekî avek bêdeng dibû ruber ber bi sezkirina goleke ku dewr û dora wê bîr û baweriyên netewî bi saya av û tava Hacı şîn dibûn. Hacı wê dema destêpkir bi Kurdî, li ser Kurd û Kurdistanê binivîse, fikra xwe jî li ser vê yekê bi awayekî zelal dida xuya kirin:

*Mehmûme boye Hacı mehdet deka bi Kurdî*  
*Ta kesî nelê bi Kurdî nekirawe medhî barî* (47)

Hacı Qadrî giringiyek gelek mezin dida zmanê Kurdî û bi kar anîna wê û we-  
kî şagirteki dilsoz û xemxwerê E. Xanî hewil dida ku hemû kurd bi zmanê Kurdî  
bixwînin û binivîsin. Ji bo wî kêmasiya zmanê Kurdî tunebû. Ji bo vê yekê jî ge-  
lek rexnên tund ew zanayên kurd ku bi zmanên biyane ve dinivîsin, digirt. Ji bo  
wan “zanayên” Kurd dibêje ku biganene ji tercuma zmanê xwe, esrara kitêbê xel-  
kê dizanin, yekser ulemanê gir û hûr van ne xwendine du herfê Kurdî. Wê dema  
em ji nêzîk ve bala xwe didin helbesta Hacı wesa tê xuyakirin ku, tê bêjî ji bo du-  
mahîka sedsala 19’an ne nivîsiye ji bo îro ango dumahîka sedsala bîstan nivîsiye.  
Ji ber ku îro gelek Kurd yê ku “zana” û “ulema ne” dehan zmanên bigane (biyanî)  
dizanin. Lê wek Hacı jî dibêje du herfên kurdî nizanin. Dîsan Hacı ji bo wan di-  
bêje, ustadê xetin ji wan hersê zmanan ango pisporê zmanê Erebi, Farsî û Tirkî  
ne. Wê dema em bala xwe didin dîroka wêjeya Tirkî, Erebi û Farsî em dibînin di  
van welatan de gelek Kurd hene yan mîrê helbestê yan jî yekemîn romannivîs in.  
Lê du herfê Kurdî nizanin.

Dîsan Hacı ev kevnepereştan ne dihiştin yan jî ne dixwastin ji bilî zmanê Ere-  
bî, kitir bihata bi karanîn bi navê musulmanatiyê. Wê dema rêya nivisandin bi  
zmanê Kurdî digirtin, rexne jî dikir. Ew mirov û dewletên wesa hêj hene û hal-  
westê xwe her berdewam dikin. Piştî van hemû rixnan û gazindên xwe Hacı dibê-  
je ji bilî Kurdan milletên “bê pirtûk û nivîsin li ser erdê nemane”. Wesa jî serîncâ  
Kurdan dikişîne li ser rewşa aloz ya Kurdan. Em peyamê bidin û binêrin Hacı çi  
dibêje:

*Her Kurde le beynî kullî millet  
Bê behreye le xwêndin kitabet  
Bêganeye le tercemey zmanî  
Esrarî kitebî xelkî dizanî.  
Yekser ulema dirîşt û ûrdî  
Ney xwênduwe du herfî Kurdî  
Ustadî xetin le em sê zmane  
Wek dê le zmanî xoy bêgane  
Sahîb kitêb û peyame herkes  
ême nebê bûne qewnî Çerkes  
Xo mumînîn ne rusin  
Bo çi kufre zman man binûsîn  
Milletî bê kitêb û nûsîn  
Xeyrî Kurdan niye le rûyî zemîn<sup>(48)</sup>*

Hacı li ser peywendiyên zman û dîrokê radiweste û nişan dide ku eger dîroka  
Kurdan bi kurdî bihata nivisandin, mîr û padşahên Kurdan heta heteyî dijiyan. Ji

ber ku îro jî wê dema em bala xwe didin lêkolînên li ser dîroka kurdan, gelek tişt nexuyane û pêwîstiya lêkolînên kûr dixwaze. Yek ji sedemên van aloziyan nenivîsandina dîroka kevn ya Kurdistanê û negihîştina belgên nivîskî heta roja me ye. Li ser vê mijarê Hacî wesa dibêje:

*Kitêb û defter û kaxez*

*Ger bi Kurdî binûsraye zemanî*

*Mella û zana û pîr û padşaman*

*Heta mehşer dema haw û nîşanî* <sup>(49)</sup>

Hacî Qadrî koyî di helbestekî xwe de jî zmanê Kurdî û yê Farisî hevber dîke û dibêje zmanê Kurdî çi cewaziya wê bi gel zmanê Farsi heye? Ji bo çi Farisî raste û Kurdî kêmiya wê heye? Hacî ji xwe di pirse eyba Kurdî çiyê? Her peyivên wê heqin û eyba wê jî nîne. Bala însanan dikişîne li ser metirsiya têkçûyîn û winda bûyîna zmanê kurdî. Paşê jî helbesta xwe bi gel vê yekê dumahîk tîne ku zmanê Kurdî yê Farsi kevtir e û dîsan dibêje: “Di pêti bûnê de bila kêm jî be çi qiyamete mîna Ermenî jî nabe” bi vî awayî nîşan dide ku pêwîst e Kurd bi zmanê xwe binivîsin û bixwînin. Eger kêmasî hebin jî pêwîste jê netirsîn û di hemû zmanên din de jî kêmasî hene. Em dora gotinê jî bo Hacî bihêlin ka çawa ew bi xwe vê yekê tîne zmên:

*Kurdî axir çiyê eyibî*

*Her kelamî heqe niye ayibî*

*Lefzî Kurdî, belaw nebû, girdbû*

*Wa le mabeynî ême da têtû*

*Le fesahet bila muherrabê*

*Çi qiyamet be Ermenî jî nabe*

*Ya le gel Farisî çi ferqiy heye*

*Bo çi ew raste em kemiye*

*Ba wicudî eger bikey dîqet*

*Tê degey kam le kamiye sîrget*

*Çunkî ê me qedîmtirin le wan*

*Be tawarixî cumleyî edînan* <sup>(50)</sup>

Dîsan di vê helbesta jorê de Hacî wesa dide xuyakirin ku Farisan peyivên Kurdî dizîne û zmanî Kurdî yê wan kevtir e. Pêwîste vê yekê jî bêjin ku di sala 1968 an de li Iranê kongra rojhelatnasan kombûn, tê da hate xuyakirin ku rêgeza Kurd ya Farsan kevtire. <sup>(51)</sup>

Gelek helbestên Hacî hene di derheqa zmanê Kurdî de em nikarin di vê gotarê de basa hemûyan jî bikin. Lê em vê beşê jî bi helbestekî Hacî ve dumahîk binin:

*Eger Kurdek qisey babî nezani  
Muheqqeq daki hîze habî zani* (52)

Di vê helbesta jorê de Hacî dide xuyakirin ku eger Kurdek qisên bavê xwe ango zmanê bavê xwe nizan be, muheqqeq dayîka wî qehpe ye û bavê wî jî vê yekê dizane. Yan jî vê yekê bizanin. Ji ber ku “da bizani” tê dumana wekî min li jorê da-ye xuyakirin.

Hacî Qadrî Koyî di helbestên xwe de li ser netewa Kurd dût û dirêj radiweste û pesnê kurdan dide, ji bo bilindkirina hesta wan ya netewî û bilindkirina bawerî ya wan bi xwe. Wê demê em vî helwestê Hacî bi gel hinek siyasetmedarên Kurd ku hertim çêran li Kurdan dikin, hevberî hev dikin, dûrbînî û rastiya helwestê Hacî jî xuya dibe.

*Xwe dezanin sulaley Ekrad  
Lê rewe bigire ta degate qubat  
Hemû zana û hûnerwer û mîr in  
Zîrek û jîr û ehlî tedbîrin  
Dan û beşînyan lela bawe  
Xwênî meydanyan lela awe  
Le secahet hemû wekû Rustetem  
Le sexawet hemû wekû Hatem.* (53)

Hacî di vê helbestê de pesnê Kurdan dike li vê derê heta qubadê hemû sulala kurdan hesab dike. Kem û zana, hûnermend, mîr, zîrek û jîr nişan dide xwe bexşandin li cem Kurdan adete, xwîna xwe di meydanan de wekî avê dirjînin ji aza-yetiye, wek Rustem ji mêrantiyê wekî Hatem, Kurdan nişan dide.

Hacî Qadrî Koyî di helbestekî xwe de jî yek ji şivan û gavanên kurdan besî sed hezaran leşkerên dijmin dibîne. Canfedaya wan wekî Hatemê te, qurbaniya wan wekî Alî Berdek nişan dide.

*Le gawan û ciwanî Kurdekan yek  
Bese bo leşkerê sed kere dulek  
Bi fîday şuwanan Hatemî tey  
Bi qurbanî sepantan Alî Berdek  
Mirişki ewê seyndî sehêne  
Le kin enga firûce hacî lek lek  
Guwanî mîgelî êwe le şer da  
Wekû qessabe dujminî mîgelîseg* (54)

Hacî Qadrî wesa nişan dide ku gelê Kurd kevntirîn gelê Kurdistanê ye. Gelek xelk jî ji kurdan peyda bûne û li vê cîhanê de belav bûne. Bingeha vê teoriya Hacî li ser keşta Nuh hatiye danîn. Hacî dibêje: Wê roja ku bi emrê xudayê xoştevî ew xelk tey bûn nonan, kesek nema ji du cinsên candaran ji bilî yên ku hatin nav gemiya Nuhî. Hacî her berdeyam dike û dibêje: Ew roja ku gihiştîyê wextê nişan kirî, sekinî li ser çiyayê Cudî, her sê kurrên wî ew cih û wêrên mîna gulşema ji xwe re kirin mesken. Niha ev Cizîra ne xoştevî yekem avadaniya dinyayê ye, kurrên wan yên rasteqîn jî kurdin li warê bav û kalên xwe ne, xelkê rûniştevanên welatan tevaya wan ji van belavbûn, dîn û mezahîb û peyaman ew kirine grup û qebile. Bi vî awayî Hacî dixwaze nişan bide ku Kurd kevntirin xelkê deverê ye û xwedanê di-rokek kevnare. Ka em binêrin Hacî çawa vê yekê di helbesta xwe de tîne zmên:

*Ew roje be ehrî heybî mennan  
Ew aleme paki bûwe nonan  
Taqêki nema le cînseynî di roh  
Xeyrî ewey hate keştiy Nuh  
Ew roje gehîşte wextî Mehûd  
Westawe le ser çiyayekey cûd  
Hersê Kurri kirdyane mesken  
Ew cêy û mekanê mîslî gulşen  
êsta ke Cezîre bê muhaba  
Mehmûreyî ewele le dunya  
Ewladî sehîbyan be burhan  
Kurdin le şwênî ceddî xeyan  
Sukkanî biladî rubhe meskûn  
Ser paki lemane munsehîb bûn  
Hê tefrege bûn munih û hen deng  
Ayîn û mezahîbs û resailî  
We kirdaye firge û qebayilî (55)*

Ev bîr û bo çûyina Hacî di namên pîroz yên Ezîdîyan de jî têtê xuyakirin ku yekem car li ser dinyayê Kurdistan peydabûye li pêş 12 hezar sal ji cara yekemîn “wehî” jî aliye Xwedê ve bo Meleke Tawus bi zmanê Kurdî hatiye xwarê

Hacî hewil dida ji bo yekîtiya welatê Kurdan û daxwaz dikir bibin xwedanê perwerde nivîsîn, kinc û berg, zman, risim û dîn. Şewrên wî ji bo yekgirtina axa Kurdistan wesa dibêje:

*Le Botan ta Baban û Serhedî rey  
Le ew latir weha noş bêta ser dey  
Bihîne yek le tehlîm le nûsîn  
Cil û berg û zman û resîm û ayîn (56).*

## PERAWEZ

1-Goreqerec: Gundekî wêran kiriye. Di derheqa vî gundî Ebdulsetar Tahîr Şerîf di pirtûka xwe ya bi navê “Hacî Qadr, şairî şoreşger û pêşkewtinxwaz û demokratîy netewê Kurd” de çapa Bexda 1977, di rûpelên 43-47’an de gelek agadari dide.

- 2- Ebdulrehman Saîd, komele şîrî Hacî Qadrî Koyî, çapxana dar el-Selam, Bexda 1925
- 3- Mihemed Emin Zekî, Mîşahîr El-Kurd, Bexda 1952
- 4- Refîq Hilmî, şîr û edebiyatî Kurdî, r. 99, Bexda, çapxaneyî tefeyuz 1941 (bergî yekem)
- 5- Eladdîn Secadî, Mêjûy Edebî Kurdî, r. 308, çapî yekem, Bexda 1952, çapxaney Maruf
- 6- Gîw Mukriyanî, Dîwanî Hacî Qadrî Koyî, r. .3, çapî sêyemîn, Hewlêr 19699, çapxaney Hewlêr.

7- Mihemedê Mella Kerîm, Hacî Qadrî Koyî şairî qonaxekî nûye le jiyani netewey Kurd, Bexda çapxana 1969

- 8- Mesud Mihemed, Hacî Qadrî Koyî, beşî yekem, Bexda 1972, r. 100
- 9- Reşîd Findî, Xanî û Hacî (vekolîneka edebiye) Duhok, 1996, 7 38
- 10- Kemal Fuad, Rojnama Kurdistan, Yekemîn rojnama Kurdî, qahîre sala 1898, Bexda 1972
- 11- Jêdera berê.
- 12- Kerîm Şareza, Serdar Mîran, Dîwanî Hacî Qadrî Koyî, Hewlêr 1986. r 9
- 13- Reşîd Findî, pirtûka navbirî, r. 39
- 14- Muderesî, Binemaley zanyaran, çapxaney şefeq, Bexda 1984, r 557
- 15- Reşîd Findî, pirtûka navbirî r 39
- 16- Jêdera berê r 39
- 17- Kerîm Şareza, pirtûka navbirî r: 246
- 18- Jêdera Berê, r 271
- 19- Jêdera berê, r 271
- 20- Mesud Mihemed, Hacî Qadrî Koyî, berê sêyem, r 195
- 21- Reşîd Findî, pirtûka navbirî, r 46
- 22- Reşîd Findî, pirtûka navbirî, r 48
- 23- Jêdera berê, r 48
- 24- Jêdera berê, r 50
- 25- Husên Reşwanî, kovara Karwan, jimara 7, sala 1983, r 30
- 26- Reşîd Findî, pirtûka navbirî, r: 50
- 27- Jêdera berê, r 50
- 28- Mesud Mihemed, pirtûka navbirî
- 29- Gîw Mukriyanî, pirtûka navbirî
- 30- Eladdîn Secadî, pirtûka navbirî, r 355
- 31- Reşîd Findî, pirtûka navbirî, r 69
- 32- Gîw Mukriyanî, pirtûka navbirî, r 7
- 33- Kerîm Şareza, pirtûka navbirî, r 92
- 34- Reşîd Findî, pirtûka navbirî, r 69
- 35- Kerîm Şareza, pirtûka navbirî, r 73
- 36- Mesud Mihemed, Hacî Qadrî Koyî, bergî sêyem, Bexda 1976, r 110
- 37- Gîw Mukriyanî, pirtûka navbirî, r 7
- 38- Sadiq Bihaddîn Amêdî, Hozanvanêd Kurd, r 315-316
- 39- Reşîd Findî, pirtûka navbirî, r 103

- 40- Eladdîn Secadî, pirtûka navbirî, r 214-238
- 41- S. B. Amêdî, Hozanvanêd Kurd, r 319-320
- 42- Kerîm Şareza, pirtûka navbirî, 106-107
- 43- Reşîd Findî, pirtûka navbirî, r 74
- 44- Reşîd Findî, pirtûka navbirî, r 75
- 45- Kerîm Şareza, pirtûka navbirî, r 209
- 46- Jêdera berê, r 221
- 47- Husên Reşwanî kovara navbirî, r 26
- 48- Hûsên Reşwanî, kovara navbirî, r 29
- 49- Hûsên Reşwanî, kovara navbirî, r 29
- 50- Husên Reşwanî, kovara navbirî, r 29
- 51- Husên Reşwanî, kovara navbirî r, 29
- 52- Mihemedî Mella Kerîm, dîwanî Haci Qadrî Koyî, Bexda, 1989, r 202
- 53- Mihemedî Mella Kerîm, pirtûka navbirî, r 281
- 54- Husên Reşwanî, kovara navbirî, r 28
- 55- Husên Reşwanî, kovara navbirî, r 28
- 56- Mihemedê mella Kerîm, pirtûka navbirî, r 314

# Meala Cuzû 'Emma

ABDURRAHMAN UÇAMAN

Sebebê destdirêjkirina min alî wergerandina Qur'ana Kerîm bi zimanê Kurdî (zaravayê Kurmancî): Min dît ku ev kitêba muqeddes bi zêdetir ji sed zimanî hatiye wergerandin. Hem jî min dît ku xelkê Kurd hemen hemen ji tevekî misulmanan li pêştirîn di girêdana bi wê kitêbê va. Êdî min li ba xwe biryar da, ku divê ev kitab bête wergerandin bi zimanê Kurdî jî û ji min pêve jî bûhûra min li tu kesekî nebhûrî.

(78) Sûreya Nebe'i (xeber). Mekki ye, 40 ayet e

*Bi kurtî amaca vê sûreyê: Ev sûre ji insanen ra dibêje ku çira hûn li ser hebûna xwe ya bêdawî bihev nakin? Û ew daxwaza we hemiyar e, jiwe ewanê ku dibêjin "mirin çûyineka bêhatin e" gelo ew nabînin ku erd bi giraniya wan çiyayan ve her roj di nûqta ciyê xwe yê parîn de ye? Wek bêşigê diçe û tê ciyê xwe yê berê, insan jî nêr û mêyê wî ji axê hatiye çekirin, bi mirinê diçe nava wê, ewê dîsa jî were, insan radikeve (mirina piçûk) dîsa radibe. Şev û roj, stêrk û ro, ba û baran, dar û giya û bostan, diçin û dîsa tene ciyê xwe. Evana tû dibîni, bêhejmar in. Wanê ku tû nizanî û nabîni... Ewê ku ew van îşan lihev datîne ew dê insan jî paştî bîne, hesab pêra bi-bîne, heryekî bi ciyê ku pêdikeve da bişeyîne.*

(Bi navê Xûdayê Qancîkar û Qencîdar)

1-2-3. Însan pîrsa çi ji hev dikin?  
Pîrsa wê xebera mezin dikin, ew xebera  
ku ew li ser wê bi hev nakin

4-5. Na na,  
ew dê di pêş da  
bizanibin, dîsa ji  
na, na ew dê di  
pêş da bizanin.

6-7. Qey me  
erdê ranexistiye?  
Me van çiyayan  
jî neçikandiye?

8-9-10-11.  
Me, we çêkiriye,  
nêr û mê, me xe-  
wê daye we jibo  
hêsbûna bedene,  
me şev jî ge-  
randiye perdeya  
veşaranê, me roj  
jî gerandiye ze-  
manê heleza ji-  
yanê.

12-13. Me li jorê we jî ava kiriye heft  
(qatê) metîn, hem jî me ((têda) çêkiriye  
çirakî xwedî agirê pîrr bi tîn.

14-15-16. Me di jor da şiyandiye  
aveka pîrr ji wan hewrên hevguwaştî, ji-  
bo ku em bi wê derxînin ji axê qut û  
put, hem jî hinek bexçeyê ku darê wan  
li hev dilefin tû çiyekî namîne rût.

17-18. Bêşubhe hatiye belkîrin ew  
roja veqetandinê ku heqqê tû kesekî li  
yekî da nehêle, roja ku bûhûrî têtê pif-  
kirin pêra hûn tèn pêl bi pêle.

19-20. Asîman  
jî jihev têtin vekî-  
rin wek deriyan,  
çiya jî ji çiyê xwe  
têtin hilweşandin,  
dibin wekî leyla-  
nan.


21-22-23. Bê-  
şik dojeh çiyê lê-  
nihêrîna (resed-  
xane) jibo wan  
kesên ji rê derketî  
ra hêlin e, heryek  
ji wan bi zemanê  
dirêj têda dimîne.

24-25-26. Ew  
tû hênîkayîkî û  
vexwarînekî têda  
nabînin, bê ava  
kelandî û kêma

werivandî, ew vî cezayî li gora kirinên  
xwe dibînin.

27-28. Ewan ji pîrskirina tû hesabî  
tûcar bawer nedikirin.

29-30. Tevlî ku me her tiştî bi nivî-  
sandin dihejmartin, dê bixûn, em jî  
peyder pey janêşê li we zêde bikin.





14-15-16-17-18-19. Ma ji te ra nehatiye ew serhatiya Mûsa? Dema ku Xûdayê wî gazî wî kir, li wê newala rûmet bilinda nava tûba (Xwedayê wî jêra got): “Tu here bi alî Fir’awan da, lewra ew rast rast ji serî derketiye. Bi xweşi jêra bibêje: ‘Gelo di te da meyla xwe paqijkirina ji nepakiyan tûne ye?’ Jibo ku tû ji wî bitirsî jî, ez ravayê te bidim rê, ku ew rêya naskirina Xûdanê te ye.”

20-21-22-23-24. Mûsa wê ayeta mezin ji ravay wî da, wî ayetê jî înkâr kir û li ber Xûdê jî serî hilda, paşê pişta xwe da wan û geriya, xelqê li xwe civand û qîriya û got ku: “Ma ji herkesî mezintir ne ez im Xûdanê we hemiyan.”

25-26. Xwedê jibo vî hawayî wî ye pašîn û wê gotina wî ya cara pêşîn (ku wî ji dora xwe ra gotibû: “Min ji xwe pêve tû Xwedayekî ji we ra nizaniya”) rahêla wî bi rahêlanekî ku ew jibo herkesî ra derd e. Lewra di wê işê ku bi serê wî da hat, derseka mezin heye jibo herkesê ku ew xwedantirs e.

27. (Bi dîtina we) gelo çêkirina wê tiştekî pîrr mezin e yan jî wî asîmanê ku Xwedê wî ava kiriye?

28-29. Qatiyê wî bilind kiriye û ahen-

ga wî saz kiriye, şeva wî tari kiriye û ronahiya wî jî eşkera kiriye.

30-31-32-33. Di piştî sazkirinê da jî wî erdê daxistiye, ji nava wî ava wî û giyayê wî jî derxistiye û çiyayan jî çikandiye, ev jibo jiyîna we û terrşê we ye.

34-35-36. Dema ku ew hengama mezin were, wê rojê însan li bîranîna kirinên xwe dadigere, dojah jî ji wî kesê ku dibîne ra jî têtê gerandin eşkere.

37-38-39. Jibo vî herçî ew kesê ku ji serî derketiye û jiyîna vî dinyayê jibo xwe li pêş girtiye, jiber vî hawayê wî doje bi xwe ciyê wî ye.

40-41. Lê herçî ew kesê ku ji derketina hûzura Xûdanê xwe tirse û nefa xwe ji nepakiyan paye, jibo vî bihişt bi xwe ciyê wî ye.

42-43-44. Ew ji te pirsra roja bandê dîkin dibêjin: “Danîna wê kînga ye? Haya te ji hatina wê heye?” Zanîna danîna wê her bi alî Xwedanê te da ye.

45. Bi tenê tû; haydar dikî wî kesê ku di wî da tirsra ji wê rojê ra heye.

46. Ewan însanên ku vî pirsê dîkin, ji wan tirê jiyana wana, dinyayê ya daneka êvarê bûye ya jî dana sibeya wê danê bûye.

أَنْزَلَ الْكُتُبَ

٥٨٣

هَلَّا نَبِيَّكَ سَعِدْتُ مُوسَى ۝ إِذْ نَادَاهُ رَبُّهُ بِاللَّيْلِ الْمَقْدِرِ لَمَلُوۤا  
إِذْ هَبَّ إِلَىٰ فِرْعَوْنَ دَرَاهُ مَطْفِي ۝ فَقَالَ هَلَّا لَكَ الْآنَ نَزَّكَ ۝ وَأَهْدَيْتَنَا إِلَىٰ  
رَبِّكَ فَخَشِيَ ۝ فَأَرَاهُ الْإِذَّ الْكَبِيرَ ۝ فَكَذَّبَ وَعَصَىٰ ۝ نَسَىٰ  
أَدْرَسِي ۝ فَخَسِرْنَا دُمَىٰ ۝ فَقَالَ إِنَّا رَبُّكَ الْأَعْلَىٰ ۝ فَأَحْسَدَهُ  
اللَّهُ نَسَا الْآخِرَةَ وَالْأُولَىٰ ۝ إِنَّ فِي ذَٰلِكَ لَعِبْرَةً لِّمَنْ يَخْشَىٰ ۝  
ءَأَنْتُمْ أَشْدُّ حُلُفًا أَمِ السَّمَاءُ بَيْنَهُمَا ۝ رَفَعْتُمْ سَمَا۟ فَسَوَّيْنَاهَا ۝ وَأَغْلَقْنَا  
لَيْلَهَا وَأَخْرَجْنَا صُبْحَهَا ۝ وَالْأَرْضَ بَعْدَ ذَٰلِكَ سَوَّيْنَاهَا ۝ أَخْرَجْنَا مِنْهَا  
مَاءَهَا وَمَرْعِيَهَا ۝ وَالْجِبَالَ أَرْسَبْنَا ۝ مَتَاعًا لَّكُمْ وَلَآئِن كُنْتُمْ  
۝ فَاذْجَابَ بِآلِطَاتِهِ الْمُكْتَبِي ۝ يَوْمَ تَنذُرْنَا لَآئِن كُنْتُمْ  
۝ وَبَرَزْنَا بِجَهَنَّمَ لِمَنْ يَرَىٰ ۝ قَالَتْ مَنْ طَفِيَ ۝ وَأَشْرَحْنَا لِحَيَاةِ  
الدُّنْيَا ۝ فَإِنَّ الْجَهَنَّمَ هِيَ النَّارُ ۝ وَأَمَّا مَنْ خَافَ مَقَامَ  
رَبِّهِ ۝ وَهَمَّىٰ النَّفْسَ عَنِ الْهَوَىٰ ۝ فَإِنَّ الْجَنَّةَ هِيَ الْمَأْوَىٰ ۝  
يَسْتَلُونَكَ عَنِ السَّاعَةِ أَيَّانَ تُنزِلُهَا ۝ قِيمَ آتَتْ نُزُولُهَا إِلَىٰ  
رَبِّكَ مُنْتَهِيهَا ۝ إِنَّمَا أَنْتَ مُنذِرٌ مَّنْ يُخَفِّئُهَا ۝  
كَمَا نَهَىٰ يَوْمَ تَرَوْنَهَا لَوَيْبُنَا الْأَعْيُنَ ۝ أَوْ صَحَّيْهَا ۝

(80) *Sûreya Abese. Mekki ye, 42 ayet e.*

Bi kurtî amaca vè sûreyê: “Ev sûre bi deh ayetê pêşîn vî bi me dide zanîn; jibo tû kesekî ra ne dûrûst e, “eger pêxember be jî” ku ew însanekî kê m bibîne. Ew însan ha dibîne ha nabîne Xûdê her dibîne û li rûyê meriv jî dixîne û bi hêviya çêbûn û belkiyan, rûmet nayête dayin jibo hinkiyar. Bi şêş ayetên ku li pey wan dehan têtin; danasiya (tarîfa)

Qur'anê ne, şanzde ayetên ku li pey wan têtin; danasiya însan û nankoriya wî jêra dibêjin; însan jibo çi hatiye? Ew kûda diçe? Ew jibo xwarin û vexwarin û zewqê tenê nehatiye. Piştî ku bi sî û du ayetan jî însanan ra yek bi yek hate gotin: “Ew jî kû hatiye û jibo çi hatiye? Bi deh ayetan jî jêra hate gotin ku ew kûda diçe? Çi dibîne?

(Bi navê Xûdayê Qancikar û Qencidar)

1-2. (Muhemed) Rûyê xwe tîrş kir û piştî xwe da wî, jibo ku ewê kor hatibû ba wî.

3-4. Ma tû çi zanî? Dibe ku ew hatibe xwe paqij bike yan jî guhdariya te bike û gotinên te têda kar dike.

5-6-7. Ama ew kesê ku ew xwe muhtac nabîne jibo guhdana wan tiştê ku tû dibêji, tevli ku ne sûcê te ye, piştî ku ev der nekeve ji rîya vajî.

8-9-10. Ama ew kesê ku bi lez hate ba

te, li rastiye dipirse. Hem jî ew Xûdantirs e, dîsa jî tû gûh nadî wî ka ew çi dipirse.

11-12. Na, na ey (Muhammed) ew tiştê ku ji te ra hatiye şiyandin ew şîreteka rêbir e, kî bixwaze ew pê digire.

13-14-15-16. (Ew tişt) di hinkî rûpelên hêja da ne, ewan rûpelana bilind in, paqij in, di destê hinkî nivîsaran da ne, pîrr bi rûmet in, dûrûst in.

17. Mirin lêkeve însan çi nankor e.

18-19-19-20-21-22. Ew vî nafi-kire ku Xwedê wî ji çi çêkiriye? Ji aveka sade wî çêkiriye, paşê hin bi hin wî pêşta xistiye, paşê riyê başî û xerabiyê jêra hêsa kiriye, paşê wî dimirine û di gorê da diveşirîne, dawiyê jî dema ku bixwaze wî ji wê derê dertîne.


23. Na, na tû însanekî pêk nehatiyê hemî tiştê ku Xwedê emir kiriye jêra.

24. Hela bila însan carekî li xûre-kên xwe binêre.

25-26-27-28-29-30-31-32. Me avê barandiyê bi

barandineka biçî, paşê jî me erdê jihev kiriye jibo zildana tovê nava wî, pêra me têda şîn kir teneyên qut, hem tîrî hem jî ew tiştê ku dibe put, hem zeytûn û Xûrmedar, hem jî wan bexçeyên wek satar, hem fêkî û çêrege, jibo jiyana we û terşê we.

33. Êdî dema ku ew qira bilind likar-keve.



34-35-36. Di wî rojê da meriv dire-  
ve ji birayê xwe, hem ji diya xwe û ji ba-  
vê xwe, ji hevalên xwe û zarokên xwe.

çav dibîne ewan tiştê ku evro bi sonda jî  
bawer nake; wekî dojah, bihişt, kitab,  
arş, melek, şeytan...

(Bi navê Xûdayê Qancîkar û Qencî-  
dar)

37. Ji ber hesabê kirinê xwe, di wê  
rojê da herkes dibe bilyê canê xwe.

1-2-.....14. Dema ku ro lihev  
bête pêçandin, dema ku istêrik jî hilwe-  
şin, dema ku çiya jî ji ciyê xwe bêtin

38-39. Di wê  
rojê da hinkî sîma  
diçirisin, bi kenîn  
in, pirr geş in.

meşandin, dema

ku evan deveyê

avisê bi deh me-

han jî bêxwedî bê-

tin hiştin, dema ku

lawir jî bêtin ci-

vandin, dema ku

hevav (pirav-der-

ya-bahir) jî bêtin

kelandin, dema ku

her nefsa tek jî têtê

çiftkirin, dema ku

ji wê keçika bi saxî

veşartî jî têtê pirs-

kirin, "gelo ew bi çi


sûci hatiye kuş-

tin?" Dema ku def-

terê xêr û şeran jî

têtin vekirin, dema

40-41-42. Di  
wê rojê da hinkî  
sîma jî hene ku  
muxê li ser wan  
niye, tariyê bi ser  
wan da girtiye, ha  
ewana ne wan ka-  
firên ji rê derketi-  
ne.



(81) *Sûreya  
Tekwirê. Mekki  
ye, 29 ayet e.*

*Bi kurtî amaca  
vê sûreyê: Ev sûre  
dide zanîn ku dê di alema royê da ihtila-  
lekî mezin çêbibe, evan tiştên maddî ku  
ahenga wan dipelîşe, wê demê insan bi*

zikkirin; ha wê demê herkes ji kirinê  
pak û nepak çi daye hev, ew hîn dibe.

\* Tefsîr û tercemeyê ku min xwendiyê hemî di dibêje "La" di wê derê da di serê Sureya beled da kelime-  
ke zêde ye. Ez nabêjim ku ew nizanibûne, ema ez dibêjim, gelo wan bir bi wî haway nebirine yan ji lê hay  
nebûne ku çawa sond ji bawerî û girêdanê ye, di serê xeberê giring da (mühim, edatê nefyê û îsbatê, bi sond  
ra yan jî bê sond têtin gotin; Kurmançî: Na; ez hatime, na; wellahî ez hatime. Nehatime... Belê ez hatime,  
belê, wellahî ez nehatime, nehatime... Bi Tirkî: Yok; ben gelmemişim, vallahi... evet... im



(83) *Sûreya Muteffifin. Mekki ye 36*  
*ayet e*

Bi kurtî amaca vè sûreyê: Ev sure ji du pîvanan xeber dide, yek ji wan: Ew li vè dinyayê ew pîvana ku têda dizî tète kirin. Ewa diduyan: Pîvana di roja bandê (qiyametê) da ku dereca van dizan û dereca însanê dirûst divê lihev bêne pîvan.

Jibo ku însanê diz, tirsî ji însan dide pêşiya tirsî ji Xwedê, ew dikeve dereca însanê bêbawerî. Lewra ew bi dizîya pel û potekî hindik xwe bêpar dike ji wan qenciye hêjayê ku li însanê durîst dê bêne kirin.

(Bi navê Xûdayê Qancîkar û Qencîdar)

1-2-3. Wey jibo wan kesê ku di pîvanê da di binîve dikin, ewan ew kes in; dema ku ew tişt ji însanan dikirrin ew bi wana piç bi piç hisabê pîvanê dikin, lê dema ku ew tişt difiroşin, wan bi pîvan yan jî bi kêşan ew di binîve dikin.

4-5-6. Çira ew zan nakin ku dê ew bêne şiyandin jibo (hisabê) rojeka mezin, ew roja ku însan radibin, jibo ku hisabê xwe bi Xwedanê aleman bidin.

7-8-9. Na, na rastî ev e, ku deftera herçî însanê bêrê di nava siccinê da ye. Ma tû dizanî ku siccin çî ye? Ew kitabeka nivîsandiye.

10-11. Wey li wan kesên ew înkâr dikin, înkara roja bandê dikin.

12-13-14. Jixwe tû kesekî înkara hebûna wê rojê nake, bê wan kesên ku ew ji rêya aqil derketine, di gunehan da gevizandine. Dema ku ayetên me ji wan ra têtin xwendin; ew dibêjin: Evana çîrokên wan însanên bûhûrî ne. Na, na lêbelê

ewan kedên wan yên di pis (ew dizîya wan) bi ser qelbên wan da tarî hanîne.


15-16-17. Na, na bêşik ew di wê rojê da ji Xûdanê xwe gelek şermîn in, bêşik; paşê jî wana di dojoyê werkirin e, paşê ji wan ra tète gotin: Ha ev e, ewê ku ew digotin: ew derew e, tişteki weha nîn e.

18-19-20-21. Na, na bêşik herçî wan kesê ku ew ji nepakiyan bêrî ne, defterê wan li (illiyînê) danandî ne, ma tû dizanî ku il-

liyyîn çî ye? Ew kitabeka mohrkirî ye, melayiketê bi rûmet lê dikin çavniheriyê.

22-23-24. Bêşubhe; ewan kesên ku ji nepakiyan bêrî ne, ew dikevin dewranê. Li ser textên xemilandî dikin seyranê. Tu di sîmayê wan da dibinî geşiya dewranê.

25-26. Ji şeraba kaseyê dev seyandî ew vedixwun sseyandina wê bi riskê ye, bila di vè rê da bibeze ewan kesê ku pêşîngêhî



27-28. Ji tesnîmê ye ew tiştê ku (jibo zêdekirina lezzetê) li nava wê (şerabê) hatiye xistin, yanî ji wê kaniya ku meylaketê birûmetê jê vedixûn.

29-30-31. Ev rast e ku wan kesê çewterê, tevzê biken li mu'minan direşandin. Dema ku ew di ber wan da dibûhûrîn jî, çav li hev dişikandin.

32-33. Gava ku çav bi mûminan dixistin jî digotin ha evana ew in; wan yê ku xwe wenda dikin, tevî ku ew nehatine şiyandin; jibo ku li mu'minan xwedîtî bikin.

34-35. Jibo wan hawayê wan, îro jî mu'min bi wan dikenin. Li ser textê xemilandî li wan dinihêrin.

36. Gelo wan kafiran cezayê wan kirinên xwe girtin?

(84) Sureya İnşîqaq. Mekkî ye, 25 ayet e

*Bi kurtî amaca vê suryê: Ev sure dibêje "Ey însan! tû vî bizanibe, ew Xwedanê ku wî vî erd û asîmanî çêkiriye, ew wan jihev jî dixîne, tû çi dikî ew te dibîne, wî te çêkiriye, ew te dimirîne û dîsa jî tîne, ev xebatê te hemî nivîsandî ne. Ew*

*deftera te li gora nivîsandiye nava wê bi te digihîne... Hebûna te ya vê dinyayê perçekî ji hebûna te ya bêdawiye.*

(Bi navê Xûdayê Qancîkar û Qencîdar)

1-2-3-4-5. Dema ku asîman bibe şeq û pêkhanîna emrê xwedanê wî lê bibe heq, dema ku erd jî bènûşuf û hevraz bibe, hem jî ew; wan tiştê ku di nava wê da ne bavêje der û vala bibe û pêkhanîna emrê Xwedanê wê lê bibe heq.

6. Ey herçî tû însan î! Ev rast e, tû pîrr bi zorkêşî her (jibo hisab) bi alî Xwedanê xwe da dimeşî, paşî tû pê digijî.

7-8-9. Êdî ew kesê ku deftera wî ji alî rastê wî da pê bête dayin, di pişt wî da hisabekî sivik pêra bête diyîn û ew dê dagere bi ser ala xwe da di şîmakî bikenin.

10-11-12. Û herçî ew kesê ku

deftera wî ji alî piştê wî da jêra bête dayîn, di piştî wê da ew dê hawar li helakê daxîne, (Jibo ku ew felatê di helatê da dibîne, piştî ku helak jî bi destê wî nakeve) ew di dojhê tete werkirin.

13. Lewra ew berê (di dinyayê da) zewqa xwe ji alê xwe bi tenê girtiye (wî hisabê wê rojê nekiriye).



14-15. İnsan zan fikir ku (di piştî mirinê) tucar dager jibo wî nîne. Belê (Jibo hesab wê dagere) lewra ew çî dike Xûdanê wî, wî dibîne.

16-17-18-19. Dîsa jî na (Ev dagera we, ne wekî hatina we ya pêşîn e) lê ez sond dixûm bi şefeqa sor, hem bi şevê û bi wan tiştê ku şev wan dihêwûrîne ji der û dor, bi hîvê jî dema ku ew dibe kilor; hûn dê bibînin yek si, yek ji wan pêlê sor.

20-21. Êdî çî bi wan hatiye ku ew bawer nakin? Dema ku Qur'an tete xwendin jî ew secde nabin?

22-23. Jixwe di bêjin ew direw e, wanê ku înkâr dîkin, Xwedê çêtir dizane bi wî tiştê ku di dilê xwe da vedîşêrin.

24-25. Êdî tû jî mizgîna jarêşa dijwar bide wan. Ema herçî wan kesê ku wan bi xwe bawerî daye hanîn û karê wan qencîkarî bûye, nîmetê bêdawî heye jibo wan.

(85) *Sûreya Burcan. Mekkî ye, 22 ayet e.*

*Bi kurtî amaca vê sûreyê: Ewê ku wî aşîman bi aheng lihev daniye, wî her tiştî bi hatina roja wî ve girêdaye. Wî di nava rojekê da jî gelek tiştê weha bi we rava daye, tû çewteriyekî bêceza namîne, ne li dînyayê ne jî di roja bandê. Herçî qencîkar*

*jî dê bêne xemilandin bi gelek xelatên di mezin. Jibo ku Xwedê wê dipê, kûfr û înkâr bi rastiyê nikarin, ev bes e ku şahid, meşhud, şûhud, şehîd di sê rêz û nîvan da bûne rêz?*

(*Bi navê Xwedayê Qencîkar û Qencîdar*)


1-2-3. Sond bi aşîmanê ku ciyê bûrca ye, hem bi wê roja ku Xweda bi hatina wê soz daye, hem jî bi her dîttox û bi her tiştê ew ditiye.

4-5-6-7. (Ku) hatine kuştin alê kureqanal, ew agirê ku şewata wê jî tim li bal, dema ku ew rûniştibûn li ser kenar, temaşa zilma ku li mûmînan dikirin bi avêtina vana nava ar.

8-9. Ewan wê zilmê li wan dikirin, bi tenê jibo ku ew bawerî didin hanîn bi Xwedanê serdest û çeyîkar, ewê ku xwedîtîya aşîmanan û erdê her a wî ye û Xwedê bi her hawayê wan li her tiştîyê haydar e.

10. Ewanê ku ew mûminê mêr û jin ji rê derxistin, paşê jî tobe nekirin, bêşik jibo wan heye janêşa bi şewitandinê.

11. Wan kesê ku bawerî bi xwe dane hanîn û karê wan qencîkarî bûye, bêşik jibo wan heye hinkî bihiştê ku di binê wan da çem diherikin, ev e bidestxistina mezin.



12-13-14-15-16. Bêşûbhe rahelana Xwedanê te pirr metîn e, lewra her ew yê ku ji tûneyê çêdike (tûne dike) û tîne, her ew e yê ku gunehan vedîşêre pirr bi evîn e, xûdanê wî hûkmiye ku di mezinatiyê da yê dawîn e, herçî tiştê ku ew bixwaze pêk tîne

17-18. Gelo bi serhatiya leşger ji te ra hatiye gotin? Ku ew Fir'awn û Semud in.

19-20. Na, jixwe wan kesê ku ew bûne kafir, heryek ji wan di qeyda înkare da cî girtiye, Xwedê jî bi her hawayî dor ji wan sendiye.

21-22. Na, ew (tiştê ku ew înkare dikin) Qûr'aneka xwedan mezinatî ye, di ciyekî hêja yê xwe da veşartiye.

(86) Sûreya Ttariq. Mekki ye, 17 ayet e.

Bi kurtî amaca vê sureyê: Ev sure ji însanan ra dibêje; ew istêra sibehê ku avêtina wê, mizgîna nêzikbûna xebatê ye, di beriya destpêkirina karê rojê, divê insan vî bifikire; gelo ew ji çi çêbûye? Ewê

ku wî çêkiriye, ewî, wî vala nehiştiye, çêbûn û xebat û razan û mirin û rabûna wî jî, wekî wan tiştê li asîman û çandiyê di erdê da ne, diçin dîsa tîn. Qûr'an jî jibo aşti û lihevdanîne ye, wan kesê ku ew tersê Qûr'anê diçin ew bi Xwedê ra naçin se-

ri.

(Bi navê Xûdayê Qencîkar û Qencîdar)

1-2-3-4. Sond bi asîman û bi ttariq, ma tû zanî çiyê ew ttariq? Ew istêrekî ye ku ttiriyê qul dike, bêşûbhe, bi her nefsekî ra heye yekî ku ew her tiştê wî hildike.

5-6-7. Jibo vî bi insan li xwe bifikire gelo ew ji çi hatiye çêkirin? Ew ji avekî ku difure hatiye çêkirin. Ku ew derdikewe

ji navbeyna piştâ (mêr) û singê (jinê).

8-9-10. Ewê ku wî ji wê avê çêkiriye ew dikane vî bizivêre, jibo wê ku herçî tiştê veşartî dibin eşkere, êdî ne di wî da hêzekî heye ne jî kesekî ku ji wî ra bibe alîkar.

11-12-13-14. Sond bi asîmanê ku Xwedê dagere, sond bi erdê ku Xwedê hilçire, ku ew (Qur'an) gotina veqetandina rastiyê ji çewtiyê ye, ew ne tiştêkî

yarî ye.

15-16-17. Ev raste ku ew (mûnkir) li pey lêpeka (hîle) mezin dibezin ez jî li pêşiya lêpa wan datînim lêpeka mezin, êdî tû jî pirr nede ser wan mûnkiran, bide wan mûhleteka kin. ■



## Vatey verênan; vatey ceribnayey û şîretê kal û pîrandê ma

SEÎD VERROJ

**B**i vatedê ay kurdnas û ziwanzanyoxanê ki/ke Kurd û Kurdistanî sero xebitye-nê, danê diyar kerdiş ke çand (kultur) û folkloro kurdan gelekî dewlemend î. Çimkî Kurdî binkî Rojhilata Navîn î. Wayîrê yew tarîxdê kevnar û dur û derg î. Kurdayî awanbiyayişê û şahrezayêda Mezapotamya de wayîrê yew ca û roldê giran î. Lê çi heyf ke ewro bindest mendî, bi heme haway talan benê. Kultur û folklorê yê bi fek yanî bi kilam û çîrokane ameyo heta ewro resayo. Nêameyo nustiş yan jî zaf tayn ameyo nustiş. Yew heta zilm û zordestiya zorkeran, heta bîna zî teralî û kemaneya ma, vera nustiş û pêserkerdişdê folklorê ma biyo bend (asteng). Kultur û folkloro Kurdan ewro zî ganî û şên a, eger ma biwazê û bişênê derê wayîr vejî, hema zî wext esto ma zaf erey nekewtî. Vanê zerra şîwanî biwazo, kelîra tormast virazeno.

Vatey verênan, taîrxî miyan de, yew wexto derg de ceribnayışêda yew millet ra zayenê û peyda benê. Eynî zeman de zîrekê, xwisinasnayışê, resayışê û şehrezayîya yew millet zî nişan kenê (nawnenê). Zaf ray bi kafiye, ge ge zî raşte raşt vajyenê. Vatey verênandê ma, şêlikî miyan de yew zemaon derg de, ceribnayışêda kal û pîrbavandê ma ra zayî, ay roj ra heta ewro amey ma resay. Qorî vetey verênan estî ki , bi muqayese heywanan û bûyerandê tabîatî sero yenê vatiş. Kirra der, vatey verênan yew birrê edebiyata ma yî.

Vatey verênan yê kurdî û yê milletandê dorûnor û cîrananadê jênan nîzdî yewbin î. Zaf vatey verênan estî ki, kê nêzanê ayidê kam millet î. Çimkî ay mille-tê ki cîranê (hemberyanê) yewbin bî, tşkiliya yê biya, dayiş û girotiş beyntardê yê de biyo, zaf ray bi her hawa têmeşyan kewtî.

Kirra der ez wazena vaja ki bi kamik zarava (lehça) ziwandê kurdî beno wa bibo, qandê pawitişdê berê folklor û edebiyatê xwi, hewceyo ma hemin zaravandê ziwandê xwi sero bixebitî û kulturê xwi vinîbiyayiş ra bixelisnê. Bi ena xebata anasarên amaca ma; nîzdî kerdişey û pêgirotişeya zarvandê Kurdî û yewbiyayişeya ziwandê Kurdî ya. Ma bi ena xebata xwi, vatey verênan yê dimilî bi gora fikir û diyayişdê xwi mane kerdî.

\* **Adirê qoncan girr o:** Ay qismê dara ke binê erdî de manena, tira vajyeno qonc. Qismê dar û êzima ke binê erdî de bimana pewjiyena, eno sebeb ra qonci rew adir gênê û kila yên vêşî ya. Bi eno qiyas, mêrdimê ke kar û heyatî miyan de pewjî, vera doz û dawana hîna cerabnayey bibê, nêceribnayan ra hîna vêşî xwi ve-ro danê û hîna kemî çewtey kenê.

\* **Aqil esto aqilî sera:** Hiş û famê pêrin mêrdiman seycê niyo; tayn mêrdimî kemaqil î, tayn normal î û qorîna zî hîna vêşî bi aqil î.

\* **Aqilo sivik, baro giran:** Însanê ke aqilsivik bibê kar û gûrana, doz û dawana ra zî bi eno hawa ewniyenê. Eno sebeb ra giraney û xorîneya meselan (bûyeran) fam nêkenê, zaf ray çewtey û xelety kenê û berê mozan xwiro akenê.

\* **Adirdê girrî vera kes nêremeno:** Adiro girr, taniya jê vêşîya yanî hîna vêşî kê germ keno û faydê jê hîna zaf o. Bi eno qiyas, çi û cayo ke faydê jê zaf bo, kes tira nêremeno û her kes wazeno xwi nîzdî jê bikero.

\* **Ariş geyreno çimedê aryî ra şono war:** Tayn çi estî ke yew tek rayîr û çarê yên esto, bêxêca ay, rayir derê nêveyniyeno, kê mecbur manenê ke ay hawa bikê. Ariş zî dewldê aryî miyan de çiqas serabin beno û çiqas tadyeno wa tadyo, rayirê jeyo peynî çimey aryî o.

\* **Aroş vano:** mi kişenê bes niyo, pê pencdê mi zî mi sol kenê:

\* **Alluya ki/ke kê hêdî tukê, erîş ro bena:** Gama ke mêrdim gangiran û dest-giran bo, kar û xebata jê her zeman nêmcet manena. Çi kar û xebata ke wextê xwi de bibo, fayde û qîmetê ja hîna vêşî beno. Çiyo ke bêzerr û gangiraney reyd bibo, nêmcet maneno û bi xwi reyd beno ke zerar zî biyaro.

\* **Aşm (hîv) locin ra vêrat, hêdî roşin nêdana miyandê keyî:** Gerek heme çi wextê xwi di bibo, wext ke vêrat qedir û qîmetê jê nêmaneno. Coka vanê; weqît naqît o, karê wextî paşay textî.

\* **Aşikî va: Cit mi nîna!:** Welatê ma de aşikî ziyan nêramenê, lêbelê wextê ciwênan beno, ciwalê xwi gênê şonê geşt geyrenê. Wayirê ciwênî agêreno vano: qey şima zî xwi rê cit nêramenê, şima parse geyrenê? Aşik agêreno tira vano: Cit mi nîna!

Raştader zî aşikê welatê ma, bêerd û bêhêgay, şêlik û debara xwi bi sazbandey û hûnermendey viyarnenê. Erd û hêgay kê çinî bê, kê senî cit ramenê.

\* **Aşik kelibya, dawil dirneno:** Raşt a, wexto ke kela aşikî wardo û pîzedo safî ra dawil bikuyo, mumkun ke dewil biteqyo. Feqet eno vate wexto ke qiyas bibo, mana jê ena ya: Çiyo ke bê rayûtevdir bibo û sînoranê xwi viyarno, beno ke zirar tira peyda bibo yan zî bibo semedê zirarî.

\* **Asinê kerdî kerdî ra nêbo, kerdî nêbiryena:** Bn. Karmê dar, dar ra nêbo, dar pûç nêbena. Bêtalîheya pîl aya ke zirar û xirabey, nas û nizdiyandê kêra kê reso. Ma eno der û zirar zaf diyo û ma ewro zî kaşkenê û veynenê.

\* **Ay ke sebiryeno, debiryeno/Sebir esto, selamet o:** Enî wirdî vatey vera yewbin î. Vernî gore, sebir pîzedejnayîşê ano, ê didin gore zî sebir rindey û weşey ano.

\* Ay ke teraqa jê çinî bo, îmanê jê zî çinyo. Teraq, berhemê têkiliya civakî yo. Eger mêrdim ena têkiliya mehrûm bo, we bi xo çinî beno.

\* Ay (we) ke rayîran sero rakuweno, hewnanê xiraban zî veyneno: Mêrdim ke dekewt yew kar û gûre yan zî doz û dawan miyan, mumkûno ke karê jê zî û zîrarê jê zî bibo. Vernî de gerek kar zî, zîrar zî xwi çiman vera bigîro.

\* Ayo ke dêzikan virazo, qulpan zî panano: Ay ke yew kar û gûre biko, hok û moka, ray û tevdîrê jê zî zano.

\* Ayre (arye) şî, mend şeqşeqo: Însan yew iş yan zî ticaret biko, işê jê biherimyo yan zî îflas biko û tira çido bêqîmet mano, vanê ayre şiyoy, şeqşeqo mendo. Arye, yew sistem yan zî paloka ya, şeqşeqo zî eno sistem de yew perçeyo wîrdî û bêqîmet o. Yanî şiyayîşê aryî, şeqşeqoy reyde veracê nêbeno.

\* Awda vinderta ra bitersê, herikyaya (şiyaya) ra nê: Însano ke bêveng bo; qisey nêkero, derdo xemê xwi, hêvî û fikrê xwi nêvajo, kê nişênê jê/ja bisinasnê. kesê ke qisekerdox bibê, qisanê xwi nêlimnê, vate û fikrê xwi her wext biyarê ziwan, kê ay kesan hîna rehet sinasnenê û têkiliya kê zî abigore bena. Ay wext têkilî de ters û şik nêbeno.

\* Azanê şerîfî meverde ca, ziriya herî megoştar: Xeberdayîş û qisanê rindan û raştan meverde ca, qisanê veng, çewtan û bêfaydeyan megoştar.

\* Bellû kûlinçî ra kuwena, agêrena vana: 'Qiya ja çend hereya': Ay çiyoy ke kê bi xwi zî yew perçê jê bibê, jêra peyda bibê û jê nêecibnê (begem nêko) û înkâr bikerê. Yanî ay keso ke esil û fesil û kokê xwi înkâr bikero.

\* Belxer o, ber bi ber o:

\* Berê mozan xwirê meake: Derheqte kê de çiyoy ke yewî vîr û bajarî de nêbo û kê bi xwi jê biyarê însana vîrî, kê bi destê xwi kera bidê gozeka xwiro.

\* Berê (keberê) xwi pêt bike, cîranê (hemberyanê) xwi dizde meke: Verê ke kê yew iş bikê, gerek kê ray û tevdîrê xwi rind bigîrê. Wexto kê ray û tevdîrê xwi rind nêgîrê, mumkûno ke sewbîna însanî zî tira zîrar veynê.

\* Bergîrê to gem nêtebîşo, meydan de kay meke: Mêrdim wexto ke yew kar û gûre keno gerek bi xwi bawer bo. Eger kê bi xwi bawer nêbê û paştîya kê sist bo, kê nişînê ay kar û gûrî berê serî. Mumkûno kê tede bişikê zî. Eno semed ra, wexto ke kê yew kar û iş bikê, gerek kê baş bifikrî û hesabê xwi bikê, kê bi desmure nêdekuyê miyan û bi destbê xwi, xwi nêşiknê.

\* Berxo ke beran bo, koz de belî yo: Çiyoy ke rind, baş û bi esil bo, sere ra xwi nawneno. Derê pesindayîş û wesifdayîş lazim nêkeno.

\* Bextê may, textê keyna yo: Cimatê Kurdan de keynarê cihêz kerdiş adet o. Keyna bêcihêz dayîş, ayib û kemaneyda pîl hesibyena. Keyna ke bêcihêz bo, vera şarî xwi şermezar û risiya veynena. Eger feqîrey nêbo, cihêz kerdiş destê marda keynek do. May keynek çiqas vêşî cihêz keynada xwirê biko, qedr û qîmetê ja şarî miyan de hîna vêşî beno. Ca û textê ja hîan berz beno.

\* **Bewnî xwi çeng, biçîn şarî neng:** Kê kemanê û çewteya xwi û dornorê xwi nêveynê, timo kemanê û çewteya şarî vajê û neheqî bede bikê, çîdo raşt niyo. verê heme çî gerek kê xwi çimana viyarnê.

\* **Bêhemt bibo sek kê yardê marda xwira vanê bawo:** Tayn çî benê ke, kê bi zerrba xwi nêkenê, feqet kê mecbûr manenê bikê. Kê bêhemt kenê.

\* **Bê vêr saxkerdiş, aw meginî:** Wexto ke kê yew kar û xebat bikê, verê heme çî kê gerek serûvera hesabê xwi bikê. Eger kê hesabê xwi nêkê, mumkûno kê tira zaf zirar veynê.

\* **Bira xêrê biray biwazo, ceniya jê nêgêno:**

\* **Bifikrî bewnî, şarî dim meewnî:** Verê ke yew îş bibo, kê rind bifikrî û raşt bewnî, peyniya jê çî bena wa bibo kê axa xwi bi şarî nêanê, poşman nêbenê.

\* **Biz bi ling ba xwi leqyena, mêşna bi ling ba xwi leqyena:** Her kes hinda qewetê xwi şêno çî biko û vera ay berpirsyar o. Kê çî bikê xwirê kenê, hewl zî ê kê ya, xirab zî ê kê ya.

\* **Biz dizdikî kel wena, eşkera ziyena:** Tayn çî estî ke nêlimyenê, limitikî bibê zî yew wext ra dim eşkera benê. Biz bi dizdikî kel boro zî yew wext ra dim ziyena, kelwerdişê ja eşkera beno.

\* **Bi erebî, çinî bî mitribî:** Wexto ke kê biyaye de bî, gerek kê qedir û qîmetê jê bizanê. Mûmkuno ke ay biyaye kê desta şoro yan zî vinî bo, ay wext zî kê hezey mitriban parse bikê çîdo rind niyo. Raşt û rinda jê aya ke; vernî de kê hesabê heme çî bikê.

\* **Biro ke tira aw bişimê, kê kerra nêdefinenê:** Çiyo ke faydê jê kê û însanan pêrin rê bibo, gerek kê qedir û qîmetê jê bizanê. Çimkî bîr malê şarî yo, xetimya-yişê jê zirar dano her kesî.

\* **Boça her a, ne kîrr bena ne zî derg bena:** Rewş û şertê ke nêbedilê, timo sey cê bibê.

\* **Bonê zuray adir girot; yewî bide bawer nêkerd:** Mêrdimo ke vate û kirinê jê yewbin nêgîrê, bawerî nêdano kê. Bikewo çî tengê û çî xirabê jê serî sera yena wa bêro, yew bide bawer nêkeno. Ray vengane jê bi zurayî vejya yo.

\* **Camêrdî camêrdan sera benê:** Ay kesê ke ver bi yew amac, vate û kirinê jên yewbin bigîrê, mêrdimê camêrd î. Ê ke hana nî, camêrdîna carmêrdan înkare nê, sera vazdanê.

\* **Camêrd mireno name maneno, ga mireno çerme maneno:** Însan ke mireno tira pey berhemê (ber) jê maneno. Hewl xirab bi berhem û kirinandê xwi yeno însanan vîrî. Wexto ke ga zî mireno, tira pey çermê (postê) jê maneno. Kê çî wext hewcey ay çermî bibê û kêrê lazim bibo, ga yeno kê vîrî.

\* **Cay xençerî weş beno, cay qîsan weş nêbeno:** kes şêno birîna gandê xwi, xwi vîrî biko yan zî efo biko, feqet şexsiyetê mêrdimî birîndar bibo sek, ay birîn rewew weş nêbena û kê vîrî nêşona.

\* **Cenî zî estî, cenîkekî zî estî, keleş cenî zî estî û şêrecenî zî estî:** Cenîkekî, ay ceniyê ke ne kêfê xwi, ne zî qahrê xwi nişênê yewî reyde par bikerê. Dinya eno bêj însanan, menfetê jênê şexsî yo. Kira der eno bêj însanî nanê xwi miyandê şeqandê xwi de wenê. Cenî, ay kesê ke hem kêf û qehrê xwi dornorê xwi reyde par kenê û kêf û qehrdê deronordê xwirê zî benê pardar. Keberê eninan her kesîrê akerdeyo. Keleşcenî zî menfetê derûdordê xwi hinda ê xwi veyenê û xwi zî miyandê enî de veynenê. Şêrecenî, ay ceniyê ke menfetê cimati menfetê xwi sera gênê.

\* **Ceniya koşkarî timo warwa ya:** Yew mêrdimo ki/ke xwirê, keydê xwirê, mêrdiman yan zî mileta xwirê nêbo, teberîrê bibo û qabê teberîrê bixebityo.

\* **Çilaya yewî êrey ra siba panaya nêmanena:** İnsan çiqas xurt û bi qewet beno wa bibo, gerek heq û huqûq xwi vîrî nêko. Timo tim firsat destê kê de nêbeno, gerek kê(paynekî) jê zî bifikrî.

\* **Ciwên ki ame vay ver, her kes malêba xwi todano:** Qorî insanî estî qandê ramitiş, hedirnayîş û viraştişîrê çinî feqet, wexto ki fêkî amey meydan verê heme kesî vazdanê, wazenê tira yew par bigîrê. Her kes wazeno silam bido sifredê hazîrî.

\* **Cîrano (hemberyan) xirab kê wayîrê hacda hewl keno:** Cîran hewcay cîranî yo. Çimkî keberê jênan veracê, zaf nîzdî yewbinê. Qabê enîrê gerek paştî bidê yewbin. Cîranî mahtajê yewbin î. Eger cîranê kê xirab bibo sek, paşgêrî, dayîş û girotiş zaf kemî beno, eno hawa zî kê mecbur keno ke, kê xwi abigore bihedirnê.

\* **Çew (kes) dodê xwirê nêvano tirş:** Kemanî û şaşitiya her kesî bena. Ay keso ki/ke kemanî û şaşitiya xwi qebûl nêkero, dirist niyo û bi şexsiyetê xwi zî nêresayo. Wexto ki kê rexne biyayîşeyrê akerde nêbê û tehamûl nêkerê, kê nişênê kemanî û çewtiya xwi telafî bikê û aver şîrê.

\* **Çew (kes) herdê xwirê nêvano kûrî:** Bew. Kes dodê xwirê nêvano tirş.

\* **Çend kê çulîk gî ra bikê, hend boy tira vejyena:** Çiqas kê yew çîyo nêbiyaye û pîs tiyodê, hend tira nerindî û xirabî peyda bena. Ay keso ke serhevdeyê biko, beno tiyodox û sebebê xirabî.

\* **Çimo pawite timo vete yo:** Eno vate têkilîda însana sero vajyeno. Ay keso ki kê bide eleqederî, kê rindey û başeya jê wazenê, qandê enîrê jê pawenê û mudaxeley îradedê jê kenê, beno ki eno mûdaxaley ma yew tesîro ters jê sero bikero.

\* **Çîyo heram heramey de şono:** Çîyo ki kê bi zexeley û tirawitişey reyde xwi dest finê, beno ki bi tirawitişey û zexeleyda yewnay reyde kê jê vinî bikê.

\* **Darba ki kê bi destbê xwi bidê xwiro, darî ja çînyo:** Eger kê xwi bi xwi wayirey doz û dawan û pîrgîrêkandê xwi nêkê, mûtleqa yewna mûdaxele bide keno. Wexto ki îradedê kêre teber yew mûdaxele bibo sek, kê bi destbê xwi xwi birîn (dirvetin) kenê. Ay birîn zî rewî rew nêtewena.

\* **Dara ki fêkî nêgêna binde meroşê:** Dara bêfêkî heze heywanda estewr a. Heywana estewr, heze mêrdimêdê bêber û bêfayde ya. Eno vate diyar keno ki, ay

mêrdimê ki bêber bibê, tû faydê yê çinyo û aynan reyde hembazê zî mekênê.

\* **Darda gotherî ra max nêvirazyena:** Eger kê qandê amacda xwirê hacetanê xeletan vijênê sek, kê nişênê amaca xwi berê serî.

\* **Dar qilyena, ma weynê gil kam heta şono:** Yew kar û îşo ki biyayişeya jê çiman vera bibo, feqet kê nêzanibê rewş ver bi kûra şona.

\* **Darb darbra nêşermayena:** Wexto ki kê darb da yewîro, gerek kê hesabê darb werdişî zî bikê. Yanî kê hewlê yan zî xirabî bi yewî bikê, abigore gerek kê hesabê xwi zî bikê.

\* **Darî waştîşî, dayîş o:** Eger yew înas muhtac bo û kê biqesidyo, kê dest bêro sek, gerek kê paştî bidê.

\* **Dest destî sera esto:** Mêrdim gerek pirinkberz nêbo. beno ki bi tayn wesfandê xwi kê qorî mêrdimana vêşêr bibê, feqet mûmkûno ki qorîna zî kêra vêşêr bibê. ■

# HELWSET

Kovara Kulturî û Lîteraturî

Helwest + Kovara Cîhana Çandî û Edebî ye.

Helwest + Analîza Berhemên Edebî ye.

Helwest + Kovara Nûçe û Çalakiyên Kulturî ye.

Helwest + Kovara Kulturî û Lîteraturî ye.

**Bixwîne! Bide Xwendin!  
Bibe Abone!**

Navnîşana xwestinê/Adres:

Tensta Alle 43 - 2 tr. 163 64 Spanga / Sweden

# Pêrî Yayınları

## 1- Yeni ve yakın çağda KÜRT SİYASET TARİHİ

|   |            |
|---|------------|
| SSCB. Ermenistan Bilimler Akademisi. Kürt Kom                                       | 2.250. 000 |
| 2- 1880 Şeyh Ubeydullah Nehri Kürt Ayaklanması / Prof. Dr. Celilê Celil             | 1.000.000  |
| 3- Dersim - Civarık/- İKİ UÇLU YAŞAM Dr. Şıvan ve Elçi olayının içyüzü / H. AKAR    | 1.300.000  |
| 4- Kürtlerin Örf ve Adetleri / Mella Mahmudê Beyazıdı                               | 600.000    |
| 5- Tarihî tarihi, Kürtlerde tarih tarihinde kadın / Dr. Kemal Mazhar Ahmed          | 1.200.000  |
| 6- Özlem (Garod) / Hraçya Koçar   | 700.000    |
| 7- Batı -Ermenistan (Kürt İlişkileri) ve jenosid / M. Kalman                        | 1.350.000  |
| 8- Belge, Tanık ve yasıyanlarıyla Ağrı Direnişi / M.Kalman                          | 1.350.000  |
| 9- Belge ve Tanıklarıyla DERSİM DİRENİŞLERİ / M. Kalman                             | 2.500.000  |
| 10- Dersim Yazıları/Sait Çiya (Tij Yay.)  | 1.500.000  |
| 11- ANILAR -Mahmud Berzenci / Refik Hilmi   | 1.200.000  |
| 12- İki Dünya Savaşı Arasında Irak'ta Kürt Sorunu / Prof. Dr. Şakirê Xıdoyê Mihoyan | 750.000    |
| 13- Her Dil Bir Halktır / Hasan YILDIZ  | 800.000    |
| 14- XX. Yüzyıl Başlarında Kürt Siyaseti ve MODERNİZM / Hasan Yıldız                 | 1.200.000  |
| 15- Kürt gözüyle Yılmaz Güney / Mahmut Baksi.                                       | 700.000    |
| 16- Özlemin Gül Süreti / Hafız Akdemir  | 700.000    |
| 17- Kürdün" makus talihi" GAP / Osman Aytar   | 400.000    |
| 18- Hamidiye Alaylarından Köy koruculuğuna / Osman Aytar                            | 1.200.000  |
| 19- Baban Botan Soran / Dr. Kaws Kaftan   | 300.000    |
| 20- 1925 Kürt Ayaklanması / Prof. Hasretyan, Dr. K.Mazhar Ahmed                     | 350.000    |
| 21- Kamışlı Katliamı / Mahmut Baksi   | 500.000    |
| 22- Rewşa Edebiyata Kurdi / amedekar L. Polat                                       | 400.000    |
| 23- Kurdistana Bi Fiftî- Fiftî / Osman Aytar  | 500.000    |
| 24- Despêka Rêzimana Kurdi / Haydar Diljen  | 600.000    |
| 25- Zıwanê Ma ALFABA / Haydar Diljen  | 650.000    |
| 26- Birîna Bêar. / İlhami Sertkaya  | 300.000    |
| 27- Salar û Midya / Cegerxwin   | 400.000    |
| 28- Bayê Azadiyê / Lokman Polat   | 500.000    |
| 29- Destanên Kurdi / Prof. Dr. Celilê Celil   | 900.000    |
| 30- Zıman û Roman / Mehmed Uzun   | 750.000    |
| 31- Aşkın Kısa Tarihi / Ali Biçer   | 600.000    |
| 32- İnanç Aşk ve Düş / Ali Biçer  | 600.000    |
| 33- Yarın Dügün Olacak Lori.Lori / Edip Çelik.                                      | 700.000    |
| 34- Küçük Aynalar / Şerko Bêkes   | 400.000    |
| 35- Hasretine Göm Beni / Mehmet Mamaş   | 300.000    |
| 36- Med Halkı Çocukları / Ruban Baran   | 200.000    |

Toplu ve seri alımlarda indirim yapılır.  
Guraba Hüseyin ağa mah. Dağarcık sok.  
Sultan Mehmet han. No: 32/26 Fatih/ İstanbul  
Tel-Fax: 0. 212. 621 32 21



- MÊM Ü ZİN VE EDEBİYATIMIZDAKİ YERİ  
Remazan ALAN
- KOÇAİN'DE İKİ KİŞİLİK  
Sakalî Nurettin Paşa ve Ebubekir Hazım Bey  
İsmail GÖLDAĞ
- Yavuz Sultan Selim'in Diyarbakır'ı Fethi ve Egemenlik Ahtası Ahtası  
Ali EMİRİ ÇOK, Abdurrahman UÇAMAR
- KÜRT DİLİNİN DÜNYA DİLLERİ ARASINDAKİ YERİ  
A. AH
- ÇEND QISEY FERHENG - VAJNAME'DE  
Kurmancî - Hewramî - Dimilî û Senendajî Sero  
Abdurrahman UÇAMAR - Seld VERROJ
- Bealmbuher Yan Ji Kormişkanî:  
Piroz Kîrîna Natîna Buharê  
N. TUNJ
- FOLKLORA KURDÎ  
seld VERROJ

HEJMAR - SAYI 1

HAVÎN - YAZ 1987


- WAR, warê lêgerîn û lêkolînê li ser çanda kurdî ye.
- WAR, nav û dengê bêwaran e
- WAR, bila bibe warê me hemiyan



- KÜRT HALK ŞARKILARI İÇİN KÜÇÜK BİR POETİKA  
Remazan ALAN
- KOÇAİNİ HALK HAREKETİYLE İLOİLİ MECLİS TARTIŞMALARI  
İsmail GÖLDAĞ
- 400 YAŞINDAKİ ŞEREFNAME VE ŞEREFKÂH'E BİDLİŞİ  
Ahmet ÖNAL
- GULEK Jİ BAXÊ İRENÊ BOTAN: Melayê CIZIRI  
Felat DİLGEŞ
- FERHENG - VAJNAME  
Kurmancî - Hewramî - Dimilî û Senendajî  
Abdurrahman UÇAMAR - Seld VERROJ
- DÎ NAVA KILAMÊN KURDÎ DA HÎN RÛPELÊN DİROKA MÊ: GELİVÊ ZILAN  
Seld VERROJ
- BUDA - YÛSÛF Û ZEMBILFROŞ  
Remazan ALAN
- TARDXA KURD Û KURDISTANÊ  
Osman SEBRİ

HEJMAR - SAYI 2

HAVÎZ - SONBAHAR 1987



- Halkların kökenini dil belirler  
TDR
- Yeni yılın mitselliği ve Kürtler  
Piroz KİRİNA
- Zend - Avesta  
Fahriye JAVANMESTER - Tolpaqî-Negazi TDR
- Dengbêjlerin piri  
Mehmet GÜZLÜ
- Destana Kawa û Azhi Dehaq  
Agvînê
- Nav û Nîşanên Kurdên Êzîdî û Şêx Adî  
Osman SEBRİ - Piroz KİRİNA
- Zilamek û Zimane  
Hewramî
- Hinek Bir û Babelên Nû Derheqa Kelepore Bajaranîya Kurdî De  
Abdurrahman UÇAMAR - Seld VERROJ
- Jlyan û Berhemên Feqîyê TEYRAN  
Piroz KİRİNA - Seld VERROJ
- Serwerê Teyran  
Remazan ALAN
- Ferheng - Vajname (Kurmancî - Hewramî - Dimilî - Senendajî)  
Abdurrahman UÇAMAR - Seld VERROJ
- Seydayê Xanî û Mem û Zîn  
Abdurrahman UÇAMAR

HEJMAR - SAYI 3

HAVÎN - KIŞ 1988

Xwendevanên bi rûmet!  
Hûn dikarin hemû hejmarên WARê  
ji navnîşana me bixwazin



**SEYDAYÊ EVDİREHMAN UÇAMAN**  
**1934 - 1998**